Cigerxwîn

# KÎME EZ

DÎWANA.. III

..1973

Cigerxwîn

# KÎME EZ

## DÎWANA.. III

SALA - 1973

# PÊŞGOTIN

Çi gava ku mirovek,têkoşer û şoreşgerên kurd bîne ber çavên xwe,bê guman,navê Biwêj(Şair) ê mezin Cigerxwîn di nav wande wê bê êjmartin.Ji ber ku,mamûstayê hêja ne tenê li perçeyên Kurdistanê û di nav milletê kurd de tê nasîn Belam :Li temama cihana pêşverû,û sosyalist de jî xwedî nav û denge.

Digel vêjî; Wek xortekî kurd,dixwazim hinek nasîya xwe,li ser xebatker û navdarê niştimani de di vê pêşgotina hade,ji xwendevanên hêja re bi kurtî pêşkêş bikim.

Cigerxwîn:Navê wî,Şêxmûs kurê Hesen,ji gundê Hesarê,ji Kurdistana Tirkîyêye,emrê wî her wekû, wî di dîwana xwe ya yekem de gotîye:"Di sala 1903 de ez hatime dinyayê,bi navê Sultan Şexmûs ez çêbûme ji dayê" yanî emrê biwêjê me neha dibê 70 sal.Cigerxwîn piştî ko bîrbir bû,dest bi xwendina Olperestî kir û ji bo temam kirina xwendinê li çar qozîyê Kurdistanê gerîya û di vê gera hade,halê milletê xwe yê sîyasî,civakî û aborî didît,pê agahdar dibû. Ev jîna kurd têde,jîyanek bindestî û paşve mayî bû, jiber ku emperyalistan wê demêwelatê Kurdistanê perçe,perçe kirbûn,paşverûyên Tirk,Ecem û Ereb jî zordestî û sitemkarî li kurd dikirin.Ji ber vê yekê;Cigerxwîn di sala 1923 de,piştî emrê wîbî bîst,rewşa kurd û Kurdistan têde,tesîrek pir

mezin lê kir,di ber xwendina xwere xebata niştimanî û milletperwerî jî meşand,bi dengek bilind û bê tirs û bê pirs,li ristên xwe gazî milletê kurd kir,ji bo hişyar bibin,bindestî û sitemkarîya dijmin ser xwe rakin.Lê Cigerxwîn bi rist û xebata xwe,xwest rengekî gelêr(şa'bî)bi dê tevgera kurd,û bivî awayî ban temamên qorên (tebeqên)milet kir,da ko bi hevre bi yek destî rabin û welatê xwe rizgar bikin.Ev nerîna han jî xweş xuyaye di dîwana wîya yekem de.Lê piştî ku Cigerxwîn ket nav xebatê,jê ve xwiya bû ku burcuwazîyên kurd,ewjî weke burcuwazîyen milletên dîne.Îtir berê xwe da rêça sosyalistîyê û bi xurtî û dijwarî şerê burcuwazên kurd kir, û rast û rast ban karker û cotkarên kurd kir û ji wan xwest ku dest bidin pirolîtarên cihanê û şerê dijminê mezin bikin ku ewjî emperyalîzm û pâşverû ne çi Tirk û Ecem,çi Ereb û çi Kurd, û dît ku ew rîya han bi tenê Kurdistanê aza dike.Her wisajî ev nêrîna xwe di dîwana duwem de bi cih kir ko di sala 1954 de hatîye çap kirin.

Diber van raman û armancên xweyê bilind û çakde Cigerxwîn çendî belengazî,zulm û êş borandîye,lê tevî wî haweyî jî,bê serçimandin û birçîbûn,zindan û çola,dev ji rêya xwe ya rast û dirist berneda û her û her ser meşîya,bi vê renge xebata xwe Cigerxwîn rolek pir mezin di şi-

yarî û serxwe bûna qora,gelêrên kurdî de lîst, prolîteryayê welat li qada wan da hesandin.

Di vê dîwanê de jî,Biwêjê me,dîsa,şopa têkoşîn û şoreşgerî girtîye,nêrînek li ristên dîwanê,dide xuyakirin ko seyda di ramanên xwe yên niştimanî û civakî de gavên fireh ber bi pêşve avêtine,û ji ristên wî yên evînî,meruf tê dighe ko seyda hîna ew Cigerxwînê dil tenik û evîndare,û hêvîdarin ko ev dîwan arîker bê ji bo ramanên pêşverû re li nêv milletê kurd de.

HEMÎD DERWÊŞ

15/2/1973

## KÎME EZ ?

Kîme ez ?
Kurdê kurdistan
Tev Şoreş û volqan
Tev dînamêtim
Agir û pêtim
Sorim wek etûn
Agir giha qepsûn
Gava biteqim
Dinya dihejî
Ev pêt û agir
Dijmin dikujî
Kîme ez ?

Ezim rojhilat
Tev birc û kelat
Tev bajar û gund
Tev zinar û lat
Ji destê dijmin :
Dijminê xwînxwar
Xurt û koledar
Ji rom , ji fireng
Di rojên pir teng
Bi kuştin û ceng
Parast , parast
Parast min ev rojhilat
Kîme ez ?

Rojhilatê nêzîk
Rojhilatê navî
Ev bajar û gund
Ev bej û avî
Ket bin destê min
Pî da ser dijmin
Min bi ceng û şer
Zanîn û hiner
Pişta wî şikand
Serî lê gerand
Ez bûm padîşah
Xurt û serbilind
Ketin destê min ta sînorê Hind
Kîme ez ?

Kîme ez ?
Kurdê serfiraz
Dijminê dijmin
Dostê Haştîxwaz
Ez xweş mirovim
Ne hirç û hovim
Lê çibkim bê şer
Dijmin naçî der
Bav û kalê min
Dijîn tev serbest
Naxwazim bijîm
Ta ebed bindest
Kîme ez ?

Divê ez derxim
Dijminê xwînxwar
Şahê efyûnkêş
Jontirkê dijwar
Serbest bijîm ez
Wek hevçaxê xwe
Dilxweş bixum ez
Rez û baxê xwe
Çekan hilgirim derkevim meydan
Rêçek nû çêkim ji boyî insan
Kîme ez ?

Ezim ê şikand leşkerê (Rêşar)
Min bi xwîna xwe parastî ev war
Disînga dijmin ez bûme kelem
Xwe dan ber siya min Turk û Ecem
Li ser serê min
Sinbil û kulah
Serê hespê min
Digirt Padîşah
Ezim ew gernas
Ew Selahidîn
Bi pirs ji dimyat
Bi pirs ji Hetîn
Kîme ez ?

Ezim Erdeşîr
Ew Noşîrewan
Kesrayê mezin

Bê tac û eywan
Dostê kevnare
Ko bûne dijmin
Ser di tewandin
Ber agirê min
Ezim ew qelaş xurt û pehlewan
Xerac min distand ji Hind û Yewnan
Kîme ez ?

Ezim ev gernas ezim ev mêrxas
Belê ezim Kurd
Îro ez mame
Bindest û zigurd
Ew tac û eywan
Tev çûn û rizîn
Dijmin nav û deng
Tev ji min dizîn
Xistin laşê min mîkrobên teres
Ta bûm perîşan bê nav û nekes
Kîme ez ?

Ezim ew kurdê ser hişk û hesin
Îro jî dijmin ji min ditirsîn
Bîna barûdê
Kete pozê min
Dixwazim hawîr
Biteqim ji bin
Dîsa wek mêra
Bikevin çiya

Naxwazim bimrim
Dixwazim bigrim
  Kurdistana xwe
  Axa Mîdîya
       Kîme ez ?

Kawey hesinker bav û kalê min
Perçiqand serê Zehakê dijmin
    Ji gerdena kurd
    Wî şikand zencîr
      Serê me parast
      Ji birîn û Şûr
Roja hat kuştin xwînmijê dilsoz
Goya dibêjin :- Ew roje nûroz
    Zivistan diçî
    Ew rojên ne xweş
      Parêz dibî kurd
      Ji dêwê zergeş
Wesan dibêjî Zerdeştê rêzan
Ehreman dişkê Hirmiz tê meydan
                      Kîme ez ?

Ezim ê çêkir ev cejn û nûroz
Divê bistênim
  Wilo nemênim
  Bigrim tol û doz
Fermandar bim ez
Li ser kurdistan
    Bo min bimênin

Ev bax û bustan
Ev şax û ev deşt
Rez û şînahî
Bigrim destê xwe
Dil xoş û şahî
Zana û xwenda
Dezgevanên xurt
Vî warî bigrin
Bikin ronahî
Kîme ez ?

Ezim ew Kardox Xaldêwê kevnar
Ezim ew Mîtan,Nayrî,û Sobar
Ezim ew Lolo
Kardok û Kudî
Ezim Mad û Goş
Horî û Gudî
Ezim Kurmanc û Kelhor,Lor û Gor
Ezim,ez Kurdim,li jêr û jor
Çend hezar salin
Kurdistana min
Perçe perçe ma
Bindestê dijmin
Kîme ez ?

Îro ji Lor û Kelhor û Kurmanc
Ji dest xwe berdan ew text û ew tac
Bûne Olperest
Bi Tizbî û xişt

Ta dijmin şikand
Li me ser û pişt
Me dan bin lingan dewlet û hebûn
Bûn dijminê hev perçe, perçe bûn
Ta ko Kurdistan
Ta ko Kurdistan
Jar û perîşan
Kete bin destan
Kîme ez ?

Ezim ev milet ezim ejdeha
Ji xewa dîlî şiyar bûm niha
Dixwazim wek mêr
Dixwazim wek şêr
Serê xwe hildim
Çi ser bilindim
Bi cihan carek
Ez bidim zanîn
Rêçika Markis
Rêçika Lenîn
Kurê Guhderz û Ferhad û Rustem
Kurê Salar û Şêrgoh û deysem
Bejin bilindim
Wek Dêw bilindim
Ez dest dirêjim
Serbest dibêjim
Dixwazim bi lez
Gavan bavêjim
Kîme ez ?

Ne xwînxwarim ez haştî xwazim ez
Serdarê meye gernas û nebez
Em şer naxwazin
Divên wekhevî
Em paşve naçin
Dijmin direvî
Ji bo mirovan em tev dost û yar
Bijî Kurdistan bimrî koledar
Kîme ez ?

## BÊTE HÊÇIM WELAT

Welat, çikas bilind bibî
Ew qạs ejî bilind dibim
Her çend pak û rind dibî
Ew çende pak û rind dibim

Serbest bijîn bajar û gund
Kurd têde runin serbilind
Wek Feylesûfê Çîn û Hind
Bi rûmet û mezin dibim

Kengî tu payadar bijî
Ala li her der rahejî
Belav bibî pesnê te jî
Navdar û pir pesend dibim

Bilind bibin pir xwendegah
Cotar û karker bibne Şah
Îdî di dil namênî ah
Ronî didim wek find dibim

Dîsa çîya tev şîn bibin
Xort û keçik tev dîn bibin
Hin wek Mem û hin Zîn bibin
Çîrok di nava gund dibim

Heta ko gundî rakevin
Wêb dehkera min dakevin
Zû xew bi çavan nakevin

Taxûrê Hind û Sind dibim
Îro tu bin destê neyar
Bê leşker û ferman û dar
Qul, qul dirazim rengê mar
Hawar bi rengê kuno dibim

Şêrim kurê Mîtanîya
Cihê minin şax û çîya
Doza me axa Mîdîya
Nêzîke wek Axund dibim

Divê ko em şîyar bibin
Bo Şoreşê li kar bibin
Haval û dost û yar bibin
Wê çaxê wek Ferzend dibim

Hilmek ji wan baxên di şîn
Pir xweş dikî derd û birîn
Îdî Ciger nabî bi xwîn
Guvend li dor Elwend dibim

## BANGA SIBÊ

Mela banga sibê didî,dibê:ji xew rabin bese
Ev bû hezar sal kolene,ta key di xew da bin bese
Li ser we tim zor û setem,pingav û gol û ça û çem
Li ser we bûn sar û seqem,lê win şiyar nabin bese
Malê me tim dixwî neyar
Tim têne me qamçî û dar
Bindest û birçî û hejar
        Carek qe ranabin,bese
Bindestê dijmin tim nexweş
Li ser çiyan diz û keleş
Qirdê me kor,bextê me reş
        Em tev bi hevra bin,bese
Welat xweşe,tev xêr û bêr
Petrol û hasin,zîv û zêr
Bindestê dijmin,jor û jêr
        Ta kengî kola bin,bese
Heta nebin xwenda û jîr
Bê rêber û bê destegîr
Bê dewlet û gêş û wezîr
        Bindestê Turka bin,bese
Ev dijminê zana û xurt
Xwîxwar û devlok,har û sirt
Her dem bi fort û pesn û zirt
        Li ser me axa bin,bese
Tev ên me ne ev bax û dar
Deşt û çiya,lat û zinar
Lê derketîne rengê mar

Lê ew dî baxa bin,bese
Ev xan û eywan û sera
Dijmin bixun mal û pera
Xweş têde rûnin ew,çira
Em tim li çola bin,bese
Em tim ji derve dûrîdest
Bê nan û tazî,jar û mest
Wer bêne kuştin,dest bi dest
Bin boks û dara bin,bese
Dijmin kete xanên bilind
Girtin ji ber me şar û gund
Lê em dinalin rengê kund
Yan rengê zaxa bin,bese
Daxwaz çiye ji serxwebûn?
Da em bixun mal û hebûn
Pê xweş bikin derdê derûn
Lê xurt û hêja bin,bese

## BEXTREŞIYA KURD

Ho ho !!!
Hey bêbext!
Çavên we birjin
Bese win şaşin
Rêçika we da ser
Tev rêl û kelem
Şaxur û kaşin
Hawîr di gerin
Xwe didin kujtin
Ji bo kêye ev ?
Dijminê milet
Dijminê welêt
Kolê Emmaşin
Ji bo welêt em xwe didin kujtin
Gernas û mêrxas
Em ne rencberê dijminê Kurdin
Mêr û qellaşin
Pêşmerge başin yan dijminê Kurd ?
De bêje rû reş
Heta dijminê Kurd jî dizanî
Pêşmerge başin
Ma qey çavên
Korin nabênin
Dijmin dibê çi ?
Bo çi ew ceyşin
Ma win nizanin
Bo çi win caşin ?

Dijmin zana ye
Ev hezar salin
Kurd didî kujtin
Ew tim li pêşin
Lê em nezanin
Herdem li paşin
Her çiqas bazdin
Naçare rojek
Tên gewriya êş
Wek ceh û garis
Lê win dizanin
Tenê em aşin
Tifû sed tifû
Li çerxa felek
Win jî kirin Kurd
Em kurên milet
Rencberê welêt
Bê mal û maşin
Em serê dijmin
Dikin tenê win
Xwe dikin qurban
Dijmin di kujin
Tenê di nav de
Win jî manaşin
Em Kurd tev yekin
.Mirov û pismam
Xwe medin kujtin

Win jî wekî me
Kurdin pismamin
Dostin oldaşin

Hoho !!! hey bêbext !
Bes bibin mertal
Ji bona dijmin

Carek meyze kin
Ev kujtî kîne ?
Çi term û laşin ?

Ji sedî not jê
Kurd û birane
Bes xwe bidin pêş

Win tev nezanin
Bê hiş bê mijî
Çewalin xaşin

Ev Şoriş aşe
Aşê milete
Ê miletê Kurd

Tenê win aşê
Dijmin di gêrin
Hoveqeraşin

## BERE BIHAR BI XÊR BÊ

Bihare ba bi xêr bê li ser çavê me nûroz
Ba kurd ji hevre bêjin:bira cejna te pîroz

Kincên ciwan wergirin li Kurdistan keç û kur
Zerî biçin semayê çi amoz û çi xaloz

Mizgîn ji bo me bêtin doza me va giha me
Em aşîtî di xwazin kengî bighê me ew doz

Perî û xort û reşkal li her derî bibêjin
Bijî serdarê zana ev rêberê me Behroz

Canfidayên ciwanmêr em deynin ser milên xwe
Îdî em şer naxwazin gulebaran û bahoz

Em dixwazin bihar bê bi ken li her der û cî
Hembêz bikin keç û xort hemî pismam û amoz

Bi serbestî bilîzin maçan bi hev bi gorin
Bere ji min bi xeydin ev neqşebend û kerboz

Xwedê li jor dizanî em ji bona çi dane
Çima girtî û dîl bin weke berxa di nav koz.

## ÇARDEHÊ TEMÛZ

Ey cejna şadî ey cejna şadî,
Cejna serbestî,gerdenazadî
    Li ser çavan bé çardehé temûz
    Dîsa bixér hat cejna we pîroz
Milet wergirtin bergén dilxoşî
Ala kesk û sor welat dapoşî
    Li herder şadî,milet devliken
    Hatin çirandin,ew zencîr û ben
Destén xwe dan hev tev kurd û ereb
Li ber koledar winda bû neqeb
    Îdî naxwazin dîlî,bindestî
    Da bimrî zorker,bijî serbestî
Ji bo me danîn ev rejîm û hîm
    Bijî payedar-Kak Ebdilkerîm.

## DI QEYD Û BENDAN RANAZIN

Em Kurdin, kurdên navdar ser bilind û efrazin
Xewa me nayê li newalê kûr diqeyd û bendan ranazin
Em kurên selahidîn, Erdeşîr, Keykawis û xesro
Çiman ji dijmin re tev dergevan û cilwazin
Pir şerme ko Reşqirak me bixun û em nêçîrvan
Kê diye ko nêçîra Qirakê Qertel û Qerbazin ?
Şêrin bi zencîr girêdayî bin destê dijmin mane bes
Serbestî bi zor dixwazin, bindestî tu car naxwazin
Azadî û serbestî û berxwedarî li cihan tev
Pêşketîne, ev ji me re her û her daxwazin
Em dostê her miletî, û dijminê kolîdarin bes
Pêkhatî ne ji bo şer, lê çibkim, bê çek û nasazin
Gernasê dêrsim û agrî û barzan û sordaşin em
Bermayê:- Mad, û Sobar û hemxakê Qewqazin
Qaremanê miletê kurd tev karker û cotarin
Dijminê koledar û dost û hevalên azadîxwazin
Lê ko weşa nedin xwe û nebin yek seras kurd
Zencîr nayê şikandin tu car, ne bigilî û ne bigazin
Xwe veweşêne ey qareman kurd wek şêr û gernas
Guh bidêre azadîxwaz li herderê bi qîr û awazin
Dijmin dijmin, çi dûr çi nêzîk ey miletê kurd
Li herderî meyzake, wek hevin, pîvaz, pîvazin

## DIVÊ RÊ DE SIYAMENDIM

Bese dilber heta kengî li Şam û geh li Derbend bim
Di benda zulfê me heta kengî di nêv bend bim

Evîna te kirim seyda û seyda tim bi nalîne
Gelo dilber dixwazî ko di vê rê de Siyamend bim

Dilê min xweş dikî nazik li min birhên xwe dişkênî
Di xwazî derkevim şaxan wek û Ihsan û Ferzend bim

Divêm serbest bijîm dîsa li Zagrosê xwe wek caran
Bere ez Lor û Gor û Zaza û Kurmanc û Hemawend bim

Xwedî zêr û xwedî mal û xwedî petrol û têr gundim
Çi şerme ko dibin destê neyaran de bi xerbend bim

Ji pingava siî heta delavê hurmizê ê min
Çima wer jar û pabend û perîşan û perakend bim

Ji min şêrîn di xwazî ko wekî Ferha dê aza bim
Bi kolim kohê Qendîlî ji Xesro re hinermend bim

Ji lêva şerbeta sêva bi min da û di xwazî ez
Di benda zulf û biskên reş û wan lêvên şekerxend bim

Bese seyda te mey da lê gelek şerme li meydanê
Sema û heyhey û çerxe tenê girtî û pabend bim

DIREVIM

Hevalê hêja megrî çiya cihê şêra ne
Dîwarên rûmetê ji serê xurte mêra ne
Bilindî ava bûye bi xurtî,kotek,zor
Berjêr meçe,bindestî ye,fermû,em herin jor
Eywana serbestî,gelek bilind û gelek bala ye
Cihê serê min û te tenê têde niha vala ye
Xencera min zingar girtiye ji qerêja bindestî
Ne bi xwînê bî kesek carek naghê serbestî
Li newalên di kûr razî xewnên xerab di bênî
Cilika gidîya bidî serê xwe,xemnak dimênî
Zinhar,nebî ji doza xwe vebî ta her û her saxî
Ma ne şerme,em sax û gernas û dijmin bixun vî baxî ?

## EV JI ME TÊ HEW

Me tim dilorand, te ser xiste xew
Şîyar bûye lê nabêjî me :-tew
Hezar wek Xanî, Hacî û Bêkes
Dilxweş nebûn em ne ez û ne ew

Li ser hev dîlî, perîşanî, êş
Bindest û girtî,bin dar, û bin bêş
Çavên me ziwa, li ser te digrîn
Lê ta îro jî gavek nadî pêş

Ketin riya me pir newal û erx
Çend care dijmin ji me rakir kerx
Herkes bû dijmin, heta gera çerx
Gazinde çibkin, ev ji me tê, hew

Em çendan rêber pir hosta û jîr
Me serguherî hev kirne ev bîr
Çend sal li ser hev ev hawar û qîr
Medxwest bibî şêr, lê tu bûyî kew

Hezar salin em gerdenxwar û mest
Tim çav şikestî, reben dîl û mest
Dijmin bo xwe xwest,mejî jêre xwest
Bo dijmin nîvişk, tenê bo me dew

Mexabin ê te ev çîya û şax
Ev bajar û gund, pez û rez û bax
Birîndarî lê tu qet nabê ax
Birçî û tazî tenê nabê new

Bê kêrî lewra bê dost û hevdem
Hezar salin ko dibazî her dem
Zor û lêdan û kuştin û setem
Ey kurê Nayrî, bermayê Pehlew

Dixwazî bibî xwedî nav û deng ?
Bi rûmet, serbest, bijî tu xweş reng
Ji destê dijmin xwe derxî bi ceng
Bijî bi paye, rûmet û hew-hew

Te dane dijmin ev qûnax û xan
Dest hilnayênî, ji lew perîşan
Bin destê dijmin birçî û bê nan
Çi bêjim, sîh sal dibêm bi lew, lew

Zana, bîrewer,hozan û gernas
Cengawer û xurt, qareman, mêrxas
Zaza û Bext û Lor, Aşît û Bilbas
Li sînga tevan rakişandin kew

Rêça kalên me çend sal dane ser
Taristane bê rêzan û rêber
Di şevreşê de roj qet nayê der
Xwendina te roj, xebate pertew

Te rê berdaye vaye rê wer,wer
Gewher perestî, welat tev gewher
Here şerê şêr, gêr bûye li ser
Azadî bi xwînê ye, te divê wer,te divê mew ?

Welat yareke pir xweş û dîdar
Li ser dinalin hezar evîndar
Li rast û li çep kuştî, birîndar
Malwêrane ê dosta wî bedew

## EM KURDÊ ÇIYANE

Em kurdê çiyane ne ko em xelkê Merîxin
Em şerger û mêrin, neko faşîstê Munîxin
Gernas û çelengin, xwedî tarîx û bidengin
Nêv cergê neyaran, bixwe em xencer û mîxin
Wek bestem ne dibê bêne şikandin
Lê nayêne xwarin, neweki moz û petîxin
Bindestê neyarin, tenê pir dijmin û bê çek
Çavnērê dêmê ne, bixwe wek zencîr û sîxin
Nerm nabî bi levê, dilê vî dijminê xwînxwar
Korfersen û napak, bixwe bê mix û mexîxin
Em çêliyê rustem û kurê Deysem û Şêrko
Nayêne veşartin, wekî rim em di selixîn
Rabin, wekî mêran, bikevin lat û şikêran
Sed poşî li vî xin, û hezar poşî li wî xin
Destên xwe bidin hev, û bibin hevdemê azad
Gurzê me serê dijminê xwînxwar bi pelêxin

# EM AZADÎ XWAZIN

Kurd û Ereb bira ne em tev azadî xwazin
Milet divê serbestî,li her derî di bazin
Em dixwazin ,serbestî,bere bimrî zordestî
Tev karker û cotar em dijminê zordar
Bi dest top û tifingin ji cengê re li karin
Weke şêr û pilingin,tev dijminê neyarin
Bi taktîk û bi rêzan emê herin Kurdistan
Serê dijmin bişkênin,ji Kurdistan derênin .

## EM EVIN

Çavên me sûnd xwarine ranazin
Bi nalîn û axîn,dil bikul û devsazin
Aştîxwaz,azadîperes,dil xurtin
Li herder digerin,bi fir û perwazin

Serbestî armance,bi mêranî xwe danê
Ji sehpa natirsin,xweş diçin zindanê
Tev karker û cotar,bi tektîk û rist
Welatparêzin,xwe berdane meydanê

Rapêçayî,tevgernasin wek fît
Qelaş û mêrxasin,pirt û Egît
Bindestî bikêrnayê,divên serbestî
Bi tektîk û zanane,hemî jîr û şît

Hatina welatê xwe nadin koledar
Rencberê miletin,ne rencberê maldar
Bindestî hew bikêr tê doza meye serbestî
Vê ristê naxwazin,îdî nabin em,bindar

Berjor dibezin hew vedgerin serberjêr
Şevên tar û reş bûne geş wek sitêr
Hilma serbestî kete pozê me,dijmin şikest
Paşve direvin,em pey dikevin wek piling û şêr

Roja me derket,îdî winda nakin carek rê
Rêça me raste,dernakevin carek jê
Girêdayî bi hev re sal û dem û çax û beng
Dema we va çû,dema me îdî vaye tê û tê

## HERE ? HERE

Here, here, here, here.....
Lawo here, keko here,bavo here
Pismam here, domam here em biwere
Here.....
Dijmin kete Kurdistanê
Kesek nîne li meydanê
Ev dem dema ber dîlanê
        Rabe here roja şere
Here.....
Bi destên me top û tiveng
Here rabe bûye dereng
Weke şêr û weke pileng
        Herin dijmin em biwere
Here.....
Divê welat bê sitandin
Eger bimrin dewlimendin
Serfirazin serbilindin
        Dema dijmin derxin dere
Here.....
Şerme bo te kurê Rustem
Wer bimênin mat û sersem
Ji Ehwazê, heta Dêrsim
        Bigrin ji xwere,bigrin xwere
Here.....
Dijmin bizor ketye welât
Xwîna milet mij û mêt
Êrîş bikin wek ar û pêt

Geh dibere, geh disere
Here.....
Roja cengê tev jin û mêr
Pêşve herin piling û şêr
Welêt bigrin ji dest neyêr
Çûyîn heye, bê vegere
Here, here, here, here
Lawo here, keko here ez bi tere.....

# XWE KAR BIKIN JI BO ŞER

Bi ser çiyan ketim ez karê mine bez û rev
Cî nîne têde rûnim, ne biroj û ne bi şev
Cihê bav û kalê min bi xwînamin bûye sor
Dijmin îro têde ye, dibêjî min tu derkev
Bûye sîh sal dinalim, birîndar û perîşan
Hê ji nûve birînê, qemûşk girt û giha hev
Berî bibim birîndar,xwedî dost û mirov bûm
Lê îro mame tenha, ez bê ziman û bê dev
Zivistane nikarim, bi dijmin re bikim şer
Pûk û berfê dagirtin,gelî,derbend, û bandev
Vaye bihar bixêr tê,xwe kar bikin ji bo şer
Êrîş bikin neyaran weke mêran hemî-tev

## KURDISTAN

Kurdistanê Kurdistan
Bexçê gula, derdê dila
Îro maye bin destan
    Kurdistana bilindî
    Hemî bajar û gundî
    Heçî kesê tebxwazî divê canêxwebderdî
Kurdistanê Kurdistan
Bexçê gula derdê dila
Îro maye bin destan
Kurdistana pir xoşî
Xweş Dicle û Nêrdoşî
Namûs di serê wî nîne
Ê te arzan bifroşî
    Kurdistanê Kurdistan
Bexçê gula
Derdê dila
Îro maye bin destan
Kurdistana hilmiştî
Ji zêr û gewher miştî
Em li ber der dergevan
Dijmin têde rûniştî
    Kurdistanê kurdistan
Bexçê gula
Derdê dila
Îro maye bin destan
Miştî ji petrol û zêr
Dijmin dixun xêr û bêr

Rûniştî textê Kohreş
Li ser taca Erdeşêr
    Kurdistanê Kurdistan
Bexçê gula
Derdê dila
Îro maye bin destan
Kurdistana pir zengîn
Şax û baxên te rengîn
Ne ez tenê, lê tev Kurd
Ji derdên te,Ciger-xwîn
    Kurdistanê Kurdistan
Bexçê gula
Derdê dila
Îro maye bin destan

## XORTNO RABIN HERIN CENG

Xortno rabin herin ceng
Li herder û cî û şop
        Bi dest me top û tiving
        Hawîr bikin qope, qop
Weke mêran bidin deng
Bigrin:-kel û şax û kop
        Weke şêr û wek pileng
        Xortno rabin herin ceng
Roja cengê em şêrin lawên Guhderz û Rustem
Kurdê navdar û mêrin, Kurên Salar û Deysem
Serê dijmin bihêrin, emê çêkin çax û dem
        Weke şêr û wek piling
        Xortno rabin herin ceng
Em gernas û serbilind kurê Kurd û Mîdîya
Hînî cengê bûne rind,em şervanê ser çîya
Em dê bigrin şar û gund, birc û lat û gelîya
        Weke şêr û wek pileng
        Xortno rabin herin ceng
Îro cenga welate,weke şêran de rabin
Azadî û felate, hemî dost û bira bin
Şoreş û kêferate,bi tektîk û bi ra bin
        Weke şêr û wek pileng
        Xortno rabin herin ceng
Divê em tev bibin yek weke şêran herin şer
Bi lîlênin çavbelek,dijmin bişkê bidin ser
Xemlandî bin em bi çek,pêşve herin li herder

Weke Şêr û wek pileng
Xortno rabin herin ceng
Roja cengê vaye tê em tev jêre li karin
Dijmin derxin ji welêt, ger em bimrin li karin
Lê bibarin ar û pêt, dem nêzîke dikarin
Weke şêr û wek pileng
Xortno rabin herin ceng
Leşker bikin sed hezar, divê nebî rawestan
Welat bigrin em bi dar, Ala me bête hildan
Bimrî, bişkî koledar, bijî Kurd û Kurdistan
Weke şêr û wek pileng
Xortno rabin herin ceng

# NAXWAZIN BINDESTÎ

Kurdin serbilindin,naxwazin bindestî
Em azadîxwazin,divên tim serbestî
Îdî em hestan
Nîne rawestan
Xencer bi destan
Divên Kurdistan
Kurdistana me ye,lê Bindestê dijmin
Bi roz û rêzanî,divê ko em derxin
Êrîşe êrîş
Ey gelê Kurdan
Divê em bigrin
Bizor Kurdistan
Gelek xoş û rinde pake serbilinde
Tev bajar û gunde, gelek Dewlemende
Dijmin pê da ser
Divên herin şer
Bizor derxin der
Bigrin Kurdistan
Kurd şêre lê dijmin zencîr li mil pêçan
Gernas û mêrxase,lê teng bûye meydan
Zencîr ba bişkên
Derkevin meydan
Bigrin em tola
Kurd û Kurdistan

## MILET JI DIJMIN MEZTIRE

Em bi ser dijmin de wek pêt û birûskan birijin
Ger çi em dê bêne kuştin,wî digel xwe bikujin
Rê û derbendan li ber bigrin wekî hewr û mijin
  Em kurên kurd ser bilindin pêşve êrîş ey bira
  Zanîbe, bawer bike,milet ji dijmin meztira
Wer bikin,lê bibne leşker,dar û ber, lat û devî
Çare nîne,serşikestî,rev dest wî nakevî
Miletê kurd dê ji pare mêr û jin tev pey kevî
  Em kurên Kurd.....
Sûnd û peyman bî li ser me, em ji vê rê nagerin
Canfida ne,em di vê rê,nayê bîra me mirin
Ala rengî wek pilingan pêşve rakin,hilgirin
  Em kurên Kurd.....
Em di sînga wî de carek xenceran kalan bikin
Wî çilom talan kirin,em jî wî wer talan bikin
Ser şikestî,perçe,perçe,em li wî halan bikin
  Em kurên Kurd.....
Em bi ser de hilweşênin,kozik û sênc û çeper
Şerpeze,rê nîne paşve bazbidî,em bidne ser
Serbilind vegrin,li herder,Ala rengî kesk û zer
  Em kurên Kurd.....
Em welat bigrin bi carek dar di destê me kevî
Dewlemend û serbilind bin,zû li darxin wekhevî
Her kesek serbest bijî,dilxweş di nav de rakevin
  Em kurên Kurd.....

## RÎ DIBÎ BOST ? DIJMIN NABÎ DOST

Dibî ko rî bibî bost
Dijmin tu car nabî dost
Sed salî ser bidî post
        Tim dilreş û bêbave ew
Her çende pişt nerme neyar
Gava te bigrî rengê mar
Carek li ser ser bête xwar
        Jehra reş û zehrave ew
Diran jihev, bi devkenî
Şêr bêjî berxê:-Ez benî
Xap û fenê pîs û genî
        Lê berx çizanî rave ew
Ê kê bî ev xweşreng welat
Ev gund û bajar û kelat
Ev Dicle û Zab û Ferat
        Qase tijî dirhave ew
Kurdê kurê Lor û Meda
Bigrî ji vir ta serheda
Tev mane bindest û geda
        Wek parsekê bênave ew
Ev çerx û dolabên dinê
Vê ger û çûn û hatinê
Bala xwe win çê nadinê
        Geh şêvreş û geh tave ew

## WELATÊ MIN

Welatê min bihişte kanîya zêr
Belê şêr têde birçîne,gurin têr
Kurên Guhderz û Rustem lê perîşan
Di bin destê neyaran têne ber kêr
Nezanî û nexwendin,em birin paş
Ji dexsa yek ji wan carek nebû şêr
Ji dijmin re bi carek dost û bindest
Ji hev re pehlewan û şerker û mêr
Dibênin xelk di ser hewran ve çûne
Niha jî hê newêrin bêne bajêr
Hemî milet bi berjor ve di bazin
Tenê Kurdan bi korî dane serjêr
Bi destê dijminan Tang û Firokin
Di destê wan de xişt û tevrik û bêr
Hemî dinya ji cengê re li karin
Tenê beyhûde mane em xwedî xêr
Eva rî bûye bost û Turk nebûn dost
Ji bîr naçîn,ne gorn û ne serê mêr
Belê tarîxê va roja me anî
Bi hev re ser bilind rabin bidin dêr
Binêrin xwendevan çawan bilindin
Li alîkî me Mizgeft û yekî Dêr

## LEŞKERIM

Leşkerim Şerkerim
Hawîr di gerim
Başok û bazim
Hawîr di bazim
Di bin desta de
naxwazim razim
Leşkerim azadî xwazim
Di xwazim bijîm ez wek mirova
Na xwazim bijîm wek hirç û hova
Wekî miletan wekî dewletan
Xwedî nijadim xwedî zimanim
Bi ax û qadim bernadim bernadim
Qada xwe bernadim
Leşkerim wek bazim
Azadî xwazim
Leşkerê kurdim gernas û merdim
Naxwazim carek qada xwe berdim
Bi top û tifing ketim ser çiya
Nav gul û giya dar û devîya
Êrîşan dibim neyar û dijmin
Ji bo doza xwe xwe didim kuştin
Leşkerim wek bazim
Azadî xwazim
Bermayê Madim kurê Ferhadim
Ne kolê Tirk û Firs û Bexdadim
Kurê Mîtanim xwedî binyadim
Kurdistana xwe carek bernadim

Kardoxim kurdim ekradim
Leşkerim bazim azadî xwezim
Sorim wek agir agirê pir gur
Tev têne kuştin jin û hûr û gir
Ji bo ko nemrim ez dibim leşker
Bi qîr û halan şêr û dilawer
Bi bîr û bawer dil xweş diçim şer
Leşkerim bazim azadî xwazim
Naxwazim bijîm bin darê neyar
Dijminê xwîn xwar hirç û hov û har
Rengê gurê har bi jehr û dijwar
Hov û bê mijî tê min di kujî
Hestî şikestin xwîna me rijî
Leşkerim bazim azadî xwazim
Kurê Zegrosim mêr û şervanim
Xwedî serdar û part û rêzanim
Birûsk û hewr û qîr û tavanim
Şewat û kuştin ceng û talanim
Ez şer naxwazim doza xwe dixwazim
Leşkerim bazim azadî xwazim
Milet bibî yek dest bavêjin çek
Bibim ser dijmin êrîşên mezin
Em wan bi dizin wek pez û bizin
Wan rê nezana bixin zindana
Leşkerim bazim
Azadî xwazim

## MELA RABE

Xwenda û zanayê welêt
        Ta key di xewda bî,mela ?
Hawîr dixan û ar û pêt
        Ma raste tim wabî,mela ?
Milet seranser maye jar
Kola û bindestê neyar
Herdem dikî qîr û hawar
        Carek şiyar nabî,mela
Tu rêberê Kurdên reben
Ma nabênî zincîr û ben ?
Dimrin li çolan bê kefen
        Dîsa tu ranabî,mela
Ji dest me çûn. ferman û dar
Ka xwendegah û xwendewar ?
Birçî û tazî rengê mar
        Tim çav li destabî,mela
Gava ku dezgeh hîn bibî
Qey gawir û bê dîn dibî ?
Yan rengê Rûs û Çîn dibî ?
        Hişyar û zanabî,mela
Dijmin bi xwendin bûne mêr
Hawîr xwe parast rengê şêr
Peyda kirin wî mal û zêr
        Lew zor li wî nabin,mela
Zû hîn bibe top û tiving
Li ser çiyan bi qîr û deng
Bi dijmin re bike tu ceng

Hê nû tu seyda bî,mela
Xwe çenke bajarên mezin
Win kar bikin,hezar û hin
Bawer bike carek ji min
Tê jîr û hosta bî,mela
Binêr Kelemper,ba dibî
Çuklî ji ber li ba dibî
Lê dar bi jor ve radibî
Divêt ku zana bî,mela
Her dem bere bayê bihar
Bi qîr û fîzfîz û hewar
Ser jêre xwar nakî zenar
Qet çare lê nabî,mela
Milet ku şer dikin hemî
Ê qels serî dişkê timî
Bê tang û bê top û gemî
Nabî xwe azakî,mela
Vaye Terektor hate kar
Cotar ji hev kir tar û mar
Carek ji xew nabî şiyar
Cotê me ê ga bî,mela

## NIZANIM EZ NIZANIM

Xeyda ji min xeyidye
Rû sar û pir cemidye
Li ser wê ez di kalim
Wekû bilbil di nalim
        Tenê dibê nizanim
          Nizanim ez,nizanim ez,nizanim ...
Dibê; dûrî min here
Te yek diye ji xwere
Ez û tu bûne dijmin
Îdî bes were cem min
        Tenê dibê nizanim
          Nizanim ez,nizanim ez,nizanim...
Min go:bêje kiye ev
Li ser dibêm roj û şev
Go:min çijêye heyran
Win pîroz bin ji bo hev
        Tenê dibê nizanim
          Nizanim ez,nizanim ez,nizanim...
Min go: Botîye ?
                Go:na
Min go: Torîye ?
                Go:na
Min go: Sorîye ?
                Go:na
Min go: Lorîye ?
                Go:na

Tenê dibê nizanim
Nizanim ez,nizanim ez,nizanim...
Keça kê ye ?
nizanim
Ji Şamê ye ?
nizanim
Ji Bexdêye ?
nizanim
Ji Hindêye ?
nizanim
Tenê dibê nizanim
Nizanim ez,nizanim ez,nizanim...
Min go Rewşê ye ?
Go:na
Min go Eyşê ye ?
Go:na
Min go Fatê ye ?
Go:na
Min go Xatê ye ?
Go:na
Tenê dibê nizanim
Nizanim ez,nizanimez,nizanim...
Min sûnd xwarî bi Xwedê
Lê wê bawer nekir pê
Serê bav û serê dê
Lê wê bawer nekir jê
Tenê dibê nizanim
Nizanim ez,nizanim ez,nizanim...

Ne Tewrat û ne Incîl
Ne Furqan û Evista
Min sûnd bi van teva xwar
Lê ji payê ne hat xwar
Tenê dibê nizanim
Nizanim ez,nizanim ez,nizanim...
Go:şêrîna pir delal
Here niha werê mal
Ma min çi jêye heyran
Pêre bike tû seyran
Tenê dibê nizanim
Nizanim ez,nizanim ez,nizanim...
Min go:tu rast dibêjî
Tê navê wê bi bêjî
Ji te pêve me sûnd xwar
Ez bi kes re nebûm yar
Tenê dibê nizanim
Nizanim ez,nizanim ez,nizanim...
Go:yeke poz bilinde
Gelek delal û rinde
Bê xwedî û Xwedane
Navê wê Kurdistane
Me go:raste dizanim
Dizanim ez,dizanim ez,dizanim...
Tu tim li ser dibêjî
Pir ronikan dirêjî
Wê zor daye girînê
Çav sor bûye ji xwînê

Min go:qurban dizanim

Dizanim ez,dizanim ez,dizanim...

Bezîme herdû lêvan
Me dest birin du sêvan
Min go:raste bi qurban
Tiwî tiwî Kurdistan

Ji te pêve nizanim

Nizanim ez,nizanim ez,nizanim...

Ji te pêve nîne kes ne Faris û ne Çerkes
Ji tevan dil giranim
Ji te pêve nizanim

Nizanim ez

Nizanim ez,nizanim ez,nizanim...

Min ew da ber milê xwe
Min pê xweş kir dilê xwe
Bi qurbana te seyda
Navê te kirye:Xeyda

Dizanim ez

Dizanim ez,dizanim ez,dizanim...

# PARTÎ ME

Welat hezar salin beyar
Di nav de wer bê tînim ez
Hemî pûş û pelaxe lê
		Pir başe ko hê şînim ez
Dijmin disê xet lê kişand
Jehra dubendî lê reşand
Xwîna dilê min mijand
		Ev çende pê şêrînim ez
Karê wî ye tim roj û şev
Naçare em berdane hev
Karê me bû bazdan û rev
		Xweş zanibe dûrbînim ez
Heta nebin xwenda û jîr
Bê rêber û bê destegîr
Bê partî û rêz û wezîr
		Lê ji tere mizgînim ez
Tu guh mede sewal û pez
Hêjane çi ev dar û rez
Destê xwe bidne hev bi bez
		Pir dewlet û zengînim ez
Partîme rêça serxwebûn
Jêre bidin mal û hebûn
Bendê di lingên we vebûn
		Hêj nûber û bengînim ez
Destên xwe tev em bidne hev
Welatperest bin,ne bi dev
Xebat bikin em roj û şev

Wek Kawîs û Gurgînim ez
Win guh medin ê dil nexwaz
Wan hovê wek hirç û beraz
Yan roviyên pir hîlebaz
Pey wan de tim qêrînim ez
Ez tim dikim qîr û hewar
Gazî dikim kurdên xwar
Carek li me dijmin siwar
Lê hespê bê dezgînim ez
Carek ko ez lota bidim
Dîsa dinav xorta bidim
Gazî bikim forta bidim
Hirmîn û pir gurmînim ez
Partîme rêzanê te me
Pispor û pêzanê te me
Hozanê xêzanê te me
Neb tenê tim rotînim ez
Gavên xwe hawîr radidim
Hasin bi nermî badidim
Arzan dibim,biha didim
Keyxesriwê şêrînim ez
Bîst sal dibêjim eşkera
Dest bidne hevdî wek bira
Lê dîn çi zanin van dira
Lew gawir û bê dînim ez

## PEYMANA BEXDA

Peymana bexda, ya çewt û xwar, nadirist
Zû peqî ew peyman, çavên we zû derxist
Ereb,Kurd, tev gernas, tev leşker, tev iraq
Dane bin lingê xwe, ew peyman, ew tifaq
Şikandin koledar, şikandin koledar
Dil bi tirs, ser bi xwîn, perîşan, birîndar
Di civin, di kevin, bi paşve direvin
Haştîxwaz, serfiraz, mêrane peykevin
Bi ser de kumişîn, tev kozik, tev çeper
Ser bi reş, ji Qenal, ji Iraq, çûne der
Li herder, di revin, weke hirç, weke gur
Haştîxwaz, peykevin, geh li vir, geh li wir
Gernasan diz girtin, ser bilind weke Şêr
Tif dikin riwê wî, riwê diz, jin û mêr
Vî şêrê, rojhilat, rekeh, zû perçe kir
Koledar, zû şikest, di revî weke gur
Çavên wî wek pereng, pencên wî tev mirin
Damarên dilê vî, gurê har, kun kirin
Gurê har, birîndar, li her der di revî
Herî ku, wê Şêrek, ser mezin peykevî
Rê vekir, ji bo me, payedar-Şêr-Cemal
Şikandin li Siwês, derxistin ji Qenal
Gernasan çirandin, çi peyman, tifaq
Hilweşîn kozikên koledar li Iraq
Rencberên koledar, perçiqîn li bin pê
Hin kuştin, lê ên dî, roja wan vaye tê
Perda reş nikarî riwê wan veşêrî, riwê wan

Laşên wan kişandin, ber lingan, ber lingan
Huseyn û Şemûnko, di tirsin, di lerzin
Hana xwe, ji dijmin, ji dijmin dixwazin
Birevin, heye rev, bi dest we nekevî
Li ber we, dar û ber, bûne dêw tev devî
Xewna ko, we dîbû, va derket tev derew
Tac û text, perçe bûn, sefalet îdî hew
Dema me vaye hat, serbestî vaye hat
Roja me-ya milet, sor û zer, va hilat
Perda reş, ji ser xwe me dirand, me çirand
Zencîrên milên xwe, me çirand-me şikand
Azadî dev li ken, em dil geş, em rû geş
Lê Dalas, Makmêlan, dil nexweş, ser bi reş
Ala me bilind bû, ya Huseyn, hate xwar
Dengê te, em nakin, ey reben, ey Bayar
Bexda çû, peyman çû, pîşête nameşî
Ji bo te, ji bo we, pir divên serxweşî
Bi dest we, maye bes, Şahê dîn-efyûnkêş
Bi paş ve vegerin, riya we naçî êş
Miletên ên ko tim, vî aşî di gêrin
Serên we, yeka, yek, ew tê de dihêrin
Tîna we nema ye, ey reben, ey zigurd
Dê ji we bistênin, heqê xwe:-heqê Kurd
Çavên we kor bûne? li ber xwe nanerin
Wek terî, li pey ker, naçare di gerin
Ji bona Ingilîz, ji bona Amrîkan
Ji bo çi, Kurd û Turk, win dikin bi qurban ?
Ji jorve leşkerê, sor ku bê, hilweşî
Ji bo we ev xweşî tev dibin dilreşî

Ji jor ve, ji jêr ve, bêne we du leşker
Bi dest we nakevî, qet, ne rev, ne veger
Bextê we reş û kor, riwê we tev tenî
Tif têne, çavên we, kî heye, ne kenî ?
Tenê win, du rencber, ji Turkan, ji Îran
Bûn kolên Confostor, bûn kolên Makmêlan
Win mane perîşan, tim reben, tim birçî
Lê kerwan bi rê de, her diçî, her diçî....
Kurdistan, Kurdistan, namênî bin destan
Dê bibin tev agir, tev pijqîn ev bustan
Ev çiya, ev newal, ev serjêr, ev serjor
Ji bo we, Ey Bayar, ey Iqbal dibin gor
Ingilîz, Amrîkan, bê wijdan, bê olin
Gorna we, gornaxwe, bi destan di kolin
Bi gera vê çerxê, winê bên qeşartin
Di tingê tarîxê, winê bên veşartin
Deftera navên we di rizî, bi kevnik
Li ser we dê Pîrê, zû çêkî, xweş tevnik
Lê navên gernasan, dinvîsin ciwanmêr
Li pelên tarîxê, bi gulav, bi avzêr
Bi xwîna xwe avdan, wan dara serbestî
Her bijî, azadî, hilweşî, ZORDESTÎ

## PARTÎZANIM

Min daye ser vê rê ji dil
Zanibe partîzanim ez
Nabim xulamokî kesî
Da zanibî rêzanim ez
Milet şiyar bî roj û şev
Destan bi rastî bidne hev
Qîrîn û hawar bên ji dev
Wê çaxê borîzanim ez
Îro di bin destê neyar
Gazî û qêrîn û hewar
Tim derketime, bendewar
Bê mal û pir xêzanim ez
Bazim çiya koza mine
Serbestî tim doza mine
Rastî û bexa soza mine
Pir jîrek û pêzanim ez
Milet şiyar bû zû giha
Xwîna mine giranbiha
Belaş wê narjênim niha
Xweş zanibe hozanim ez
Gava xwe berdim ser çiya
Bigrim li ber dijmin riya
Bi kevme axa Mîdîya
Keyxesrew û Bazanim ez
Doza me qada Mîdîya
Daxwaz me her azadîya
Ev setema ha kê diya ?

Rustem û hirmezanim ez
Destê xwe bavêjim tiveng
Li ser çiyan qêrîn û ceng
Pêş de herim halan û ceng
Zanim ne pir arzanim ez

## PÎRA MIROV XWER

Rojek ji rojên salê
Yanî şeva sersalê
Ez derketim ji nav gund
Çûme ser kûpên bilind
Bi tiving û bi kolos
Ketim çiyayê Zagros
Berf û bahoz û bandev
Bi ser min de hatî şev
Şevek tarî,pir dijwar
Perda xwe berdaye xwar
Tijî kul û derd û xem
Pûk û serma û seqem
Ez tirsîyam wê şevê
Çavên xwe berdan revê
Hawîr me gur di zûrin
Teba li min di qûrin
Ez di hejim,dil bi tirs
Ezê ji kê bikim pirs ?
Gavek li pêş,yek li paş
Rê nexweş bû,rêl û kaş
Berjêr dibim newala
Newalên kûr û vala
Tijî ejdeha û mar
Di berfê de diçim xwar
Bi ser dev de di kevim
Nema karim bilivim
Wek çîplaxek dirêjim

Gavan pêş de tavêjim
Ez dixwazim vekim rê
Ji bo cîlê pey me bê
Bi zikxişkê diçim jor
Rê vedikim ez bi zor
Ew zenarên pir mezin
Li ber çavan dibin cin
Hîm û tamor û şikêr
Dibin wek piling û şêr
Bi xum,xum tên çem û cok
Devî dibin pîrhevok
Pîrek kete riya min
Pîrek weke diya min
Rawesta ye ew li rê
Pala xwe daye pirê
Ez tirsîyam wê şevê
Ev pîr ji min çi divê ?
Newêrim lê bi nêrim
Dixwazim xo veşêrim
Bi dengekî wek şekir
Go:Ez kurdim were vir
Ez naçare çûme cem
Pîra kevna dil bixem
Min dey lê kir weke mêr
Dayê şeva te bi xêr !
Go:Vê şeva reş û tar
Dernakevin derve mar
Vê şevreşa pir tarî
Zor û setem di barî

Xo -ew dêwê mirovxwer
Binbar kirin hişk û ter
Bahoz û serma û seqem
Welat kirin cihenem
Bêje:Çiye îşê te ?
Yan vîlik û pîşê te

Min gotê:Ey diya jîr
Cihan dît,û kevne pîr
Divêm herim cem Xwedê
Herim qata Xwedê lê

Go:Çij Xwedê dixwazî
Ka bêje bê tinazî ?

Min go:Divêm azadî
Serbilindî,dilşadî
Divêm bibim xwedî qad
Ne Taran û ne Bexdad
Ez naxwazim bindestî
Divêm bijîm serbestî
Bê kuştin û şerkirin
Welat bidî me dijmin

Bû tiqtiqa kenê wê
Piştê qetand benê wê
Porê serî bû gijik
Kef di devde bû mijik
Diran li min kirin qîç

Go:Siktir be,tijî hîç
Min go belkî tu mêrî
Wekî piling û şêrî
Eve pira azadî
Li pey pirê dil şadî
Lê nikarî derbas bî
Heta ko pir xelas bî
Serê çend xurtemêra
Divên ji bo pirê ra

Min li pirê nerî xweş
Herî sor û kevir reş
Xûn û serî tevlî hev
Şefeq hat û revî şev
Lê di nerim kûr û dûr
Tûj û zirav weke şûr
Nayê zanîn bi dînê
Dîwar sorin ji xwînê
Serî têde dev ji hev
Serê gernasane tev
Pêlên avê guj û sor
Ji jêr ve tên diçin jor
Porê serê min bû gij
Li ber çavên mi bû mij

Pîrê ji min di pirsî:
Çiman wilo di tirsî ?
Eger ne pir gernas bî
Kes nikarî derbas bî

Weke mêr û weke şêr
Serê xwe têxe dîwêr
Bere dîwar xelas bî
Da karibî derbas bî
Kesê bivê serxwebûn
Divê ciger bikî xûn
Tu vê xûnê dibênî ?
Ma qey Xwedê dişênî ?
Xwedê hêza milê te
Tîn û vîna dilê te
Serbeste ê xurtemêr
Bere bimrî nekirkêr
Zû vegere bê serêş
Nema karî herî pêş
Serê çend gernas û mêr
Werîn têxe nav dîwêr
Heta xwînê nerjênî
Azadîyê nabênî

Min sûnd xwarî bi Şêrko
Bi Salar û bi Xesro
Ez xwe ji rê nadim paş
Heta herim serê kaş

Go:Bi tenê nikarî
Kes hilgirî vî barî
Bi hûravêj,bi tiving
Bi dijmin re bikin ceng
Destê xwe bid mêrxasa

Herin rêza gernasa
Çiqas xûn bê rijandin
Doza we tê hejandin
Xwenda,pala,û cotar
Tevde bibin dost û yar
Hevdî bigrin mêr û jin
Bere çiya bihejin
Heta xwîn nebê lehî
Win nagirin vî cihî
Haçî nexweş,heçî jar
Nabin xwedî pişk û par
Bi gazin û lavelav
Kesek nabî xwedî nav
Tim bindestê neyar bin
Bi gazin û hewar bin
Bere bimrin heçî pîs
Ê bindest û ên xesîs
Binêr li dar û reza
Mirin para ê weza
Bi himhim,hîm ji jor tê
Kelemper ser dixî bê
Ev tarîxa pir mezin
Dijêr bûye bi kuştin
Ne peyxember,ne rêber
Neghan doza xwe bê şer
Dara xurt guh nadî bê
Dara sêfîl tim dişkê
Min go:Ezê herim mal
Peyda bikim çend heval

Çend hevalên xurtemêr
Di şeran de weke şêr
Da em destan bidin hev
Xebat bikin roj û şev
Serê xwe têxin pirê
Derbas bikin oxirê
Bi serbestî,dilşadî
Herin şarê azadî
Welat bikin wek bihişt
Têde çêkin hemî tişt
Bi xebitin roj û şev
Milet bikin wekî hev
Wekhevî bê nav welêt
Bere bimrin har û şêt
Welat bibî ronahî
Kareba û şînahî
Pir çêkin dezgevana
Dixan herî ezmana
Tê de bijîn bi xoşî
Bê dizî û keleşî
Sêv sor bibin di baxa
Nemênin şêx û axa
Rista me li dar kevî
Dîmuqratî-wekhevî
Bi hevsînorên xwe ra
Bibin heval wek bira
Vê cihana xweş û rind
Ava bikin ser bilind
Bê setem û dijwarî

Em xweş bikin vî warî
Kes nemênî belengaz
Nexweş nekin gazegaz
Bê top û tang û leşker
Ne şewat û nejî şer
Bi destkir û zanebûn
Pêşde herin hemî şûn
Bi xwendin û bi zanîn
Ev çêdibin,Cigerxwîn !...

## SERSALA SALA/1959/

Sersal hat Kurdistan hê perçe hê bindest
Sersal hat,em tev Kurd,hê serpêl,hê bindest
Koledar,xwedîmal,tev dilşad,tev dilxweş
Em tenê perîşan,belengaz,ser bi reş
Bê rêber,bê rêzan,bê dewlet,bê serdar
Bê xwendin,bê ziman,bê rûmet,tev hejar
Berdan ser pişta me,dijmin pir lat û hîm
Newêrin,em bêjin,li ber wan lam û cîm
Navê me,zarê me,qada me tev dizîn
Dixwazin her weha em bimrin,bi rizîn
Lê şaşin,nezanin,Kurdistan namirî
Rojek tê,naçare,tola xwe wergirî
Bişkênî ew serê zorker û koledar
Bêne ber destê me sernexûn,gunehkar
Şopa me tev bixwîn,jîna me tev bi ceng
Şerkoh û Erdeşîr,li cîhan dane deng
Navê me Kurde , her karê me şerkirin
Emin ê rojhilat,parastin ji mirin
Dilê-Şêr , me şikand,me Liwîs girt esîr
Derwêşan destên girêdan bi zencîr
Li jor me Sovîyat,serbilind,hinermend
Piştemêr ji bo me , bû keleh,bû derbend
Bê xwendin,bê hiner,bi tizbî,bi nivişt
Me meydan da dijmin,bi dest me def û xişt
Dijminê koledar,dilxwazê azadî
Dixwazî her milet,bijî xweş,bi şadî
Li jêr me birayên me-Ereb,serfiraz

Dijminê koledar,ji bo me ew dilxwaz
Naxwazin Kurd wesa bimênî bê rûmet
Perîşan,belengaz,bê welat,bê dewlet
Li her der her milet,dixwazî serbestî
Ev sedê bîsta ye kê divê bindestî ?
Azadîxwazan tev destên xwe dane hev
Di destên koledar,çi maye ji bil rev
Li her cî birîndar,bi paşve di revî
Li ber xwe pir didî,naxwazî bikevî
Dewletên polperest,li hawîr di civin
Bi girê girêbend,naxwazin bi revîn
Dewletên wek Turkan,wek Îran,Pakistan
Xwe dane ber lingên koledar,ji tirsan
Hey dinya!!!.ew Turkên cîhangîr,berxwedar
Deyndarin,deynê wan,sed milyon-şeş milyar
Herweha Îrana qereman,Pakistan
Yek Dolar hêjaye,bîst Lîre,bîst Tûman
Ew kesên deyndar bin,her û her ziman kin
Qada xwe bê rûmet,datênin ber dimin
Koledar dixwazî qada wan seranser
Bi Zere, bi Sarûx,bikî cî ji bo şer
Ji bo çi qada xwe difroşin,ev zigurd ?
Da bi xun mafê me-mafê Kurd ........

Lê divê zanibin çi gava bibî şer
Bi barin li ser wan ji banî ar û ber
Cî nîne xwe têde ew xwînmij veşêrin
Dostê wan ji dûr ve dê li wan binêrin
Xan û man seranser hilweşin bikevin

Rê nîne, nikarin bipaşve bi revin
Qîr û deng, tev talan, tev kuştin tev şewat
Birçîbûn, tazîbûn, bikevin nav welat
Miletin ên ku wan bidin ber pirsiyar
Bikêr wan kengî tên, ev dijmin, koledar ?
Ême em, naxwazin, ne kuştin, ne talan
Tenê em naxwazin, bimênin ber destan
Dixwazin wekhevî, biratî, dostanî
Ji qada me carek derkevin biyanî
Naxwazin bimênin:- hin zorker, hin bindest
Dixwazin em hemî, bijîn tev bixweşî, serbestî
Qatqatî naxwazin, dixwzin wekhevî
Ba bimrî zordestî, hilweşî, bi kevî
Birçîbûn nemênî, kes nebî belengaz
Ev cîhan pir xweşe, tev bijîn serfiraz
Pîroz bî· ev sersal, her bijî ev rejîm

SALA /1959/

Îsal zivistana me sar
Birfa sipî hûr têtE xwar
Xemlandine deşt û zinar
        Kengî bi xêr bêtin bihar ?
Hezar û pêncî û nehê
Hem bîst û çarê sêmehê
Berfa me hûr, hûr tê ve hê
        Kengî bi xêr bêtin bihar ?
Ka nîne ,pir kêm bûye zad
Zarok dixun berf û celad
Hin dil bi tirs û hin bi şad
        Kengî bi xêr bêtin bihar ?
Nahêlî berf em derkevin
Em girtîyên roj û şevin
Xew nayê em ranakevin
        Kengî bi xêr bêtin bihar ?
Berfa sipî wek royê yar
Pir sare wek çehrê neyar
Lê ewle nabin em tu car
        Kengî bi xêr bêtin bihar ?
Baran li berfa şevnivî
Bê û li pey roj derkevî
Tev şîn dibin dar û devî
        Kengî bi xêr bêtin bihar ?

Bihar xweşe çaxê gulan
Çaxê kulîlk û sinbilan
Nûroz û sersala dilan
Kengî bixêr bêtin bihar ?
Ba bê û sinbil bên sema
Pêlan bidin avên çema
Talan dikin derd û xema
Kengî bixêr bêtin bihar ?
Dîsa ji bajêr bêne der
Xort û ciwan û bîrewer
Rengê kulîlkên sor û zer
Kengî bixêr bêtin bihar ?
Rengê delalan meş bikin
Birhên ji dalan reş bikin
Derdê ji kalan xweş bikin
Kengî bixêr bêtin bihar ?
Zozo bi ser ciwan kevin
Xor û ciwan pey wan kevin
Xew nayê em rana kevin
Kengî bixêr bêtin bihar ?
Xwezka bihar bêtin bilez
Ferman kî serdarê nebez
Em herne dijmin tev bi bez
Kengî bixêr bêtin bihar ?
Bilind dibî ala me jî
Ba lê bidî xweş rahejî
Milet hemî serbest bijî
Kengî bixêr bêtin bihar ?

Rûnim li zozanê keper
Carek me peyxam bête ser
Xoşwan bibêjim ez ji ber
        Kengî bixêr bêtin bihar ?
Zanim bihar azadîye
Serbestî û dilşadî ye
Doza me cejna Madî ye
        Kengî bixêr bêtin bihar ?
Doza me axa Erdeşêr
Her kes dizanî Kurde mêr
Rabûye dest avête dêr
        Kengî bixêr bêtin bihar ?
Sûnd xwarîye ranekevî
Xencer ji desta nakevî
Dîsan bi ser çîya kevî
        Kengî bixêr bêtin bihar ?
Roja me Kurd aza bibî
Ala me serbest ba bibî
Dilê Cigerxwîn şa dibî
        Kengî bixêr bêtin bihar ?

# ŞORIŞ

Şoriş destpêkir qêrîn û gurmîn
Gule barandin li hawîr xurmîn

Li jor Firoke, li jêr tang û top
Ji xwînê sor bûn hemî der û şop

Dijmin hilweşand tev gund û bajar
Zar û zêrçê Kurd mane ber dîwar

Êrîş dibin wan hemî hirç û hov
Doza çi dikin ev renge mirov ?

Welat bi carek dane ber şewat
Milet perîşan, bê kar û xebat

Birçî û tazî hemî perîşan
Bê mal û birçî, ne xew, ne razan

Êrîş dibin wanew gurên devlok
Di kevin çola wekî pîrhevok

Ji ber firokan hawar û qêrîn
Di ber latan de di kevin, digrîn

Bi tirs û sawîr, jar û sergever
Gelî dagirtin axîn û keser

Li ser zik diçin zarok û biçûk
Diber lingan çûn hemî jin û bûk

Li hawîr kuştî, ketî û birîn
Ser û dest û pê sor bûne ji xwîn

Êrîş dibin wan dijmin bê hewes
Li wan napirsî ne Yezdan, ne kes

Li ser çiyane lê gernas,palewan
Şerê Kurd dikin hin Kurdê nezan

Dibin koleyên dijmin û neyar
Şerê xwe bi xwe dijware-dijwar

Dijmin di tirsî newêrî bê şer
Lê Kurdên nezan ji wan re rêber

Dixwazin welat bidin diyarî
Bin destê dijmin rûnin bi jarî

Lê Kurdên gernas ketin ser çiya
Di Xwazin bigrin axa Mîdîya

Êrîşî dijmin dikin weke Şêr
Hawîr dişkênin, li jor û li jêr

Naxwazin bimrin reben û bindest
Lê divên bijîn azad û serbest

Weke pilinga dema diçin şer
Dijmin dişkênin êrîş dibin ser

Destpê dikî şer qêrîn û hawar
Nayên jimartin dîl û birîndar

Dijmin bi tangin, belê newêrin
Direvin,ka cî, xwe lê veşêrin ?

Li hawîr şewat, li hawîr kuştin
Di nav welêt de tiştek nehiştin

Hemî şewitîn dar û ber û rez
Dane ber lingan dexl û dan û pez

Lê Kurd êrîşan dibin berew pêş
Ji ber wan dişkên teng û top û gêş

Dijmin wek pezê gur bibî şivan
Di bîra wan de tenê pîlivan

Pey wan dikevin wekî çêlekew
Şerê ser çiyan çi zanîn bedew?

Carna di revin gernasênçiya
Di zanin rêç û derbend û ciya

Li ser sînga xwe diçin weke mar
Li ser zikên xwe diçin birîndar

Berf û bahoz û banger û bandev
Biser wan de tên rojê dikin şev

Di berqefan de dimrin wek Kovî
Goştê wan di xun teba û rovî

Di kunc û qulan tenê dimênin
Ne dê û bav, kesî nabênin

Kîne birîndar ? kîne ev kuştî
Kurdê gernasin, xortê hilmiştî

Da bijî milet didin dil û can
Xwîna sînga wan perwa û nîşan

Berf û baran û serma û qeşem
Bi ser wan de tên kul û derd û xem

Hero ev kuştin, hero ev talan
Topên dûravêj gum,gum li meydan

Em tev tên kuştin ne sûc, ne sebeb
Ji me çi divên birayên Ereb ?

Heqê mirovan ji wan dixwazin
Çima nadin me bê şer û gazin ?

Emjî weke wan mirov û milet
Dixwazin çêkin jibo xwe dewlet

Me divê bibin keya û keyxwe
Li ser welat û qad û cihê xwe

Heta ko serbest nebî Kurdistan
Herdem sergêjî nayên rawestan

Welatê meye nej derve hatin
Çend hezar sale xwedî welatin

Kurd êrîş nakî welatê kesî
Ne dostê benda Sinto-Etlesî

Em Kurd û Ereb birane wek hev
Serbest bjîn tev bi dostî em tev

Dijminê meye tenê koledar
Xwe jêre mekin çeper û dîwar

Şerê koledar bikin li her cî
Em dest bidin hev karker û birçî

Doza me tevan bibî azadî
Bi hevre rûnin xweş û dilşadî

## ŞORIŞIM AZADÎ XWAZIM

Şorişim bahoz û mijim
Pijqîn û gijim hawîr di rijim
Di teqim di peqim dijmin di kujim
Pêtim agirim xwe ranagirim
Kuştin û talan firmêsk û giryan
Halan û şewat ketim rojhilat
Di qurijim dijmin di kujim
Agirim
Venamirim:agirê dilê diya
Dilê sêwîye dilê hejara
Dilê bêzara dilê birçîya
Bi pêşve diçim di qurjim
Şorişim
Şorişa kurdim bi ah û derdim
Ew kurdên gernas cengawer,mêrxas
Destên xwe dan hev xencer û tiving
Hawîr di bazin bi halan û ceng
Weke şêr wek piling
Dijmin di kujim
Şorişim
Şorişa kurdên azadî xwazim
Ez şer naxwazim mafê xwe dixwazim
Di bin desta de naxwazim razim
Hawîr di bazim
Lê çibkim dijmin dijminê xwîn xwar
Hirç û hov û har
Doza min nadî carek bi şadî

Ji serbestî ji azadî
Bê beşim
Şorişim
Di rojhilat de kevn û dirêjim
Ji bo parastin xwînê di rêjim
Xwedî çiya me bi şax û kêwim
Xurtim navdarim sitûrim dêwim
Ne hirç û hovim ne dîn û gêjim
Bi pêşve diçim gavan tavêjim
Eger bixwazim bikim ez dişim
Şorişim
Venagerim paş
Gernas û qellaş
Navêm bindestî
Koletî mestî
Divêm serbestî
Bimrî zordestî
Azadî xwazim
Ez şer naxwazim
Gelek paqijim
Şorişim
Xwedî tarîxim
Kurdim kurçîxim
Mîtan û Madim
Bi zar û qadim
Ev heşt salin ez
Gerden azadim
Ji dijmin re ez
Welat bernadim
Welat parêzim

Bi gêş û gijim
Şorişim
Hîmê xwe danî bi kok û binyad
Min natirsênî leşkerê Bexdad
Wek birûskim ez bi qîr û tavan
Hawîr di bezim bi gule baran
Ji jorve têm xwar ser hişk û dijwar
Berjêr di keşim
Şorişim
Tevger û xebat
Talan û şewat
Mal û can û ser
Didim ji bo şer
Tev didim welat
Di xwazim felat
Wek hewr û mijim
Bi gijgijim hawîr di rijim
Dijmin di kujim
Şorişim

## WEKHEVÎ

Divên em rûmet,gerdenazadî
Serbest bijîn em dilxweş û şadî
Ta kengî bindest,ta kengî em jar ?
Bindestê dijmin-dijminê dijwar ?
Şîyar bûn cotar,şîyar bûn reben
Bizor me çirand,zencîr û kepen
Serên xwe hildan bi deng û qêrîn
Cîhan me hejand ji Çîn ta bi Çîn
Li Korê binêr,kûre tev agir
Dijmin şikandin gernasên bakur
Tîpê Maw-sî-Tong,ên xurt û ciwan
Şikand leşkerê Mêster-Tiroman
Tîpên azadî,pêşve diçin her
Serê xwe şikand,Jenral-Mak-erser
Ey Celal-Bayar,Mêster-Tiroman,
Xortên Kurdistan we kirin qurban
Raste te sitand ey Celal-Bayar
Xwîna xortên kurd,sed milyon dolar ?
Cotkar û karker şîyar bûne tev
Zorker şikestin,karê waye rev

Destên xwe dan hev,em tev bûn heval
Çavên we birjin,Celal û Iqbal
Ma kî naxwazî, bi heq azadî ?
Ma kî naxwazî,xweşî,dilşadî ?
Em tev mirovin,pismam û dotmam
Bi me nexweş tên ev rist û nîzam
Serê me dişkê bi dar û qamçî
Bindest û reben,pêxwas û birçî
Îdî bi tirsin va roja me hat
Bimrî koledar,bijî ev welat
Bijî Kurdistan,bijî serbestî
Bimrî koledar,bimrî zordestî

## ZENCÎR JI GERDENIM ŞIKEST

Ji xew şiyar bûm, qêrîn û halan
Gurmîn û nalîn, kuştin û talan
Min go:- çibûye ? çiye ev bazdan
Dengek hate min dengî perîşan
Kete ber lingan, kete ber destan
Dijmin, dijmin.....
Dijmin kete kurdistan

Sermest kirim ez wî dengê şewat
Li ber min reş bûn, ev zinar û lat
Ev şar û ev gund, ev birc û eywan
Ev sera û xan , tev bûne zindan
Li me bûn dojeh, ev bax û bustan
Dijmin, dijmin.....
Dijmin kete kurdistan

Naçare rabûm, bi kar û bar bûm
Ketim şer û ceng, wek şêr û pileng
Dil xurt û bi tîn, pir vîn û evîn
Polpole nesrîn, qêrîne Şêrîn
Dibên bi kotek, bi gulebaran
Dijmin, dijmin.....
Dijmin kete kurdistan

Dema ketim şer, ez can giranbûm
Serhişk, û germ bûm, gelek nezan bûm
Bi êrîş çûm pêş, bê kewt û bê gêş

Bê derb û bê ber, bê dost û rêber
Bêhiş kirim ez, dengê perîşan
Dijmin, dijmin.....
Dijmin kete kurdistan

Bê perwa çûm pêş, wek hov û wek hirç
Min da ber gulan, sînga xwe ya pirç
Sînga min kun kir, gulakî dijmin
Ev cihan pûç bû, li ber çavên min
Dema hate min, ev dengê halan
Dijmin, dijmin.....
Dijmin kete kurdistan

Çend sal li ser hev ez mam dilbirîn
Can û ciger tev li min bûn bixwîn
Gazî û hawar, qêrîn û nalîn
Ji dengê:- Nesrîn, Sitêr û Şêrîn
Ker bûn bi carek tev xan û eywan
Dijmin, dijmin.....
Dijmin bi xurtî kete kurdistan

Piştxûzşikestî, li ser zik diçim
Pir derbas kirin, sînor û tixûm
Şeva min bû roj, roja min bû şev
Girtin û lêdan
Qamçî û zindan
Karê min mabû veşartin û rev
Dijmin, dijmin.....
Dijmin bi xurtî kete kurdistan

Bê nav û winda,bê dost û hevdem
Birçî û tazî,wek mirxê ber çem
Li min gihan hev,derd û xizanî
Pîrî û qelsî,û cangiranî
Li min bûn dojeh,ev bax û bustan
Dijmin,dijmin.....
Dijmin bi xurtî kete Kurdistan

Derd li min civîn,parsek,berdîwar
Rûmet çimaye,Hacî û Hejar
Nedkirne recnber Xanî û Bêkes
Neddane destê ên wek me meknes
Bi pol difrotin,Hêmen û Goran
Dijmin,dijmin.....
Dijmin bi bi xurtî kete Kurdistan

Li min di barîn sed tif û dijûn
Nebûn,ling dabû,ser sînga hebûn
Rencberên dijmin,tim digotin min
Eve Cigerxwîn,eve,ê bêdîn
Çine ev zigurd ?
Çine,? evê bibin,Kurd ?
Dijmin,dijmin.....
Dijmin bi xurtî kete Kurdistan

Wesan birîndar,dil jar û nexweş
Bindest,û sermest,bê nan û keleş
Di kuncikên reş dijîm wekû diz
Li me ne pirsîn,ne Yezd ne Hirmiz

Li ber Belavok,Kovar bi destan
Belkî bibhîzim navê Kurdistan
Dijmin,dijmin.....
Dijmin bi xurtî kete Kurdistan

Ji nişka dengek şêrîn û pir xweş
Hate guhê min,dilşad û rû geş
Çardehê Temûz,bû cejn û şadî
Ji bo gelê kurd,gerdenazadî
Bi çepk û haw,haw,govend û dîlan
Herkesî digot:-bijî Kurdistan ?

Rabûme serxwe,bê hiş û bê bîr
Me tev hejandin,ew bend û zencîr
Pişta min xwar bû,sînga min birîn
Hinav û ciger,seranser bi xwîn
Herkesî digot:-Şabaş û lîlan
Bijî Kurdistan,bijî Kurdistan

Min dîn sê keçik,ser bi reş û mest
Zencîr di milda hersê kemerbest
Min ji wan pirsî:-canan,çi bûye ?
Ev çi govend û qîr û berbû ye ?
Bi girî û ken bersiva min dan:-
Dijmin derxistin,ji hin Kurdistan

Min go:wesa ye,mizgîne,pir xweş
Lê nizanim ev çi zencîr û reş ?
Çiman we dan ser ? çiman, we dan mil

Min dî ji nişka, xar vebû li gul
Go:- hersê xuşkin, em sê perîşan
Bindestê dijmin, emin kurdistan

dema min rû dîn, ketim ber lingan
Hew ji min derket, qîrîn û giryan
Destekî pîroz, nazik û şêrîn
Çirand kincê min, ew kincê bi xuîn
Ji bo derdê min ew destê Luqman
Destê kê ye ew, destê Kurdistan

Çawa giha ser sînga me ew dest
Zencîr ji gerden; perçe bû, şikest
Xweş bûn, li min, zû, ew derd û birîn
Biskan vemalişt, ew elem û xwîn
Eve yara min, nazdar û ciwan
Ya dil birîn bû, li ser, Kurdistan

Çavên min vebûn,min xweş lê nerî
Xem pir sivik bûn, ziman xweş gerî
Min go:- bi qurban, min bike hembêz
Ba bi xwîn bibin, ev xeml û ev xêz
Maçek ji lêvan, dermane, derman
Eger dixwazî nemrim, Kurdistan

Dam ber sînga xwe, pêçan li min mil
Berdan ser lêvan, du lêv wek sorgul.
Neman bi carek, ne derd, ne birîn
Bi min pir xweş bûn, ev hebûn û jîn

Li min bûn bihişt, ev deşt û zozan
Dema ketim ber, sînga Kurdistan

Piştî dilê min ê kul derman kir
Bi wan lêvên sor, şêrîn wek şekir
Awir ji min dan, tev jîn û hebûn
Sînor, li bîr û hişim fire bûn
Min go:- ji bo çi, herdû perîşan
Digirîn? bêje min, ey dost- Kurdistan

Kenogirî go:- herdû xuşkê min
Dîl û perîşan, bin destê dijmin
Gerden şikestî, dil jar û nexweş
Çend sal li ser hev, girêdane, reş
Haware, hawar, ey gelê Kurdan
Ji destê dijmin derxin Kurdistan

Rabûme ser pê, çav sor û mû gij
Dinya li ber min, bû dûman û mij
Migo:- sûnda min ev demên di geş
Ezê bavêjim vê çarika reş
Ji ser riwê van, herdû mehreban
Eger bimrim ez, bijî Kurdistan

Destê min girt zû, da pêşiya min
Go:- heydê fermo, seyrîke dijmin
Ser pêl û rû reş, şikestî gerdan
Li wan bûn girî, ew şadî û ken
Sera û eywan, li wan bûn zindan

Her bijî îraq,bijî kurdistan

Me derbas kirin pir kuç û kolan
Hawîr me çepik,haw,haw û lîlan
Em gihan cîkî,pir tarî û kûr
Rengê wî nexweş,xuya bû ji dûr
Go:-eve zindan-Neqretisselaman
Eve,cihê ço,qamçî,û lêdan
Ba bimrî dijmin,bijî Kurdistan

Gava ko min dîn ew der û dîwar
Firmêsk ji çavim gêr bûn-hatin xwar
Di vir dẹ,gernas,di hatin kuştin
Tîn di laşê wan,şêran nehiştin
Cihê gernasên Ereb û Kurdin
Bimrî koledar,bijî Kurdistan

Çerxê wergerand,bû cihê dijmin
Destên koledar,ba tê de bimrin
Da zanîbin ko,dinya bi dore
Gerek li jêre,gerek li jore
Da zanîbin ko nexweşe zindan
Sed sale tê de,Kurd û Kurdistan

Em ketin binê wê zindana teng
Wek çala bêjen,bê pêjin û deng
Pê bi pê,diçin,dil bi saw û tirs
Hawîr di nerin,bê deng û bê pirs
Ew rencber û diz,ew pîs û teres

Dil bi tirs û saw, tev rabûn bi lez
Riwên wa tev reş, tenî û qetran
Van bin dest kirbûn, Kurd û Kurdistan

Tifû, ey felek, ey çerxa cebar
Te ev li ser me, kirin xwedî dar
Mirovên xwînxwar, bê dîn û bê bext
Çawa gihandin ber tac û ser text ?
Ên wek cemalî, wek Muxtar baban
Çon ferman bikin, li ser Kurdistan ?
Min go:- ey teres, ey dûvên neyar
Ji dest we derket, meyxan û qumar
Bixun, bi zanin tama ben û dar
Dawî werenge, dûvê koledar
Şehpa, û kuştin, zindan û lêdan
Wek segan bimrin, bijî Kurdistan

Win hemî, bêbext, win hemî casûs
Welat we firot, kursî û filûs
We em tev dane, ber lingê dijmin
Xercê we ye ev, de, bixun, bimrin
Dijminên Bêkes, dijminên Goran
Bi perçiqin win, bijî Kurdistan

Hêrzê min rabûn, diran qîçe,qîç
Li ber min dinya, hemî pûç û hîç
Min xwest bikujim, tevan bi dindan
Wan hilweşênim, wek Şêr û guran
Go:-na, bere wer, bimrin di zindan

Ba serbest bijîn, Kurd û Kurdistan

Ev mirovên pîs, bê ol û gawir
Welatfiroş û dîn û cenawir
Dijminê milet, kolên bêgane
Pîroz bî li wan, ev çilexane
Çû dema Çûrçil, dema Makmêlan
Her bijî îro, dema Kurdistan

Nûrîseîd, wek seg hate kuştin
Di ber lingan çû, bê berg û şûştin
Jîna segê har, raste çil rojin
Dawî tên kuştin, bi av di sojin
Tac û Sedare, ketin ber lingan
Her bijî Iraq, bijî Kurdistan

Leşkerê iraq, gernas û egîd
Hilweşand qesra:-Rihab û Seîd
Perçiqand serê xwînxwer û noker
Bijî ev leşker, bijî ev leşker
Nedane dijmin, fersend û meydan
Her bijî Iraq, bijî Kurdistan

Ey ebdilkerîm, ey ebdilselam
Ji kurdên Sûrî, li we sed selam
Win herdû gernas, win herdû şepal
Bijî payedar, serok Şêr Cemal
Bijî leşkerê xurt û qareman
Her bijî Iraq, bijî Kurdistan

We pelê dara koledar weşand
Diranên Dalas, raste we şikand
Dalas, Makmêlan, Bayar û Iqbal
Gelek di tirsin, ji Serok-Cemal
Ji Ereb, ji Kurd, ji Canral Barzan
Her bijî Iraq, bijî Kurdistan ?

Destê hev bigrin, bi kar û xebat
Ji dest koledar, derxin rojhilat
Bijîn ev welat, serbest û azad
Bijî tev dinya, rûgeş û dilşad
Tava we daye Turka-Îran
Her bijî Cemal, bijî Kurdistan

Gerek bên kuştin, hemî koledar
Di dest me kevin:-tev rejîm û dar
Dinya tev bibî bihişt û gulşen
Her kes bijî xweş bi şadî û ken
Bibin wek bira, em hemî insan
Bijî serbestî, bijî Kurdistan

Firmêsk nemênin, nemênî girî
Cihan bibî gul, bê xar û sitirî
Perda reş rabî, ji rûyê cihan
Bijî serbestî, bijî Kurdistan

Ala kesk û sor, bidî serê xwe
Li ber me vekî, serbest derê xwe
Têde em rûnin, azad û dil geş

Zû perçe bikin, vê çarika reş
Ji wan lêvên sor bigrin ramîsan
Çend xweşe ev jîn ?!... li nêv Kurdistan ?
Kurdistan bibî, hemî yek dewlet
Em jî tev bibin, bi paye-rûmet

Welat tev bibî, av û avahî
Seranser bibî, bax û ronahî
Xwendegah, têde, bilind û fireh
Kesek nemênî binbar û guneh
Keç û xort bikin, lê geşt û seyran
Pir xweşe ew dem, bjî Kurdistan

## ŞÎNA SEÎD ELÇÎ

Ey heval Elçî ey heval Seîd
Ji bo azadî tu bûyî şehîd

Di nav xebatê tu bûyî xweşmêr
Di kêferatê wek Piling û Şêr

Te ronî dabû wek sitêra geş
Li ezmanê kurd rûgeş û dilxweş

Li fermangehê dijmin tu gernas
Ji te di tirîn,ew diz û pêxwas

Di dilê dijmin tu tirs û sawîr
Li te qelizîn wek dizan,hawîr

Tu dane kuştin,tu dane kuştin...
Ji wan weye ko tukes nehiştin,

Hevalên te ne kurdên xebatker
Rengê Şêrane roja bibî şer

Pûç bibî destê tiving berda te
Wî kurdê teres fersend neda te

Diya wî bigrî li ser kurê xwe
Ew nan nebênî li hindirê xwe

Li ber dîwarê dijmin bî parsek
Lingê wî bigrin li her derî seg

Heval, dil xweş be milet şiyar bû
Ji bo wekhevî li her der kar bû

Azadîxwazin hemî bûn heval
Bi hevre dikin şerê Impiryal

Li paş xwe hiştin tev kevneperist
Gavan tavêjin, bi tektîk û rist

Divên Azadî, divên wek hevî
Zor dane dijmin hawîr di revî

Divê Kurdistan wek Hindêçînî
Xwîna gernasan hawîr birjênî

Borcewazên Kurd hevalên dijmin
Ji xortên wek te gelek di tirsin

Fişaran dikin, ew qels û zigurd
Divên vekujin arê dilê Kurd

Hevalên tene em tev de Seîd
Gavan tavêjin, gernas û egîd

Rêça me da ser, ev riya dijwar
Bûye wek dojeh, tijî Ar û Mar

Xwîna şehîdan wek nift û benzîn
Ronî daye me bûye wek dûrbîn

Rê bûye ronak, em xweş diçin, tê
Hindik maye ko dema me jî bê

Emê bidin ser şop û ola we
Heta bistênin doz û tola we

Nema karibin bigrin riya me
Kurdistan bûye pîra diya me

Îdî naxwzin, ev kevne dijmin
Malê me bixun, me didin kuştin

Ev miletê Kurd Qareman, Qelaş
Roja bibî şer ew xwe nadî paş

Tenê dixwazî rêçeke dirist
Bere biteqin, ev kevneperist

Di bin lingê wan tijî dînamêt
Roja biteqin ev agir û pêt

Ev kevneperist bi carek dimrin
Karker û Cotar cihê wan digrin

Ev riste, ev rist, kê ew li darxist ?
Ev rista kevn û çewt û nadirist

Ev rista kevnar, qerêj û gemar
Mirovên xwînxwar, mêrkuj, setemkar

Ew ji bona xwe kirin rist û ol
Bi xwîna milet sor kirin ev çol

Zorker û paşa, wek gornepaşa
Di xun malê me, di xun kelaşa
Devên xwe ewan xistin laşê me
Dixwarin serbest, wan kelaşê me

Ew mirovên pîs, peyayên nabaş
Mirov dane paş, milet dane paş

Niha jî divên em bidin pey wan
Biner Viyetnam, biner li Taywan

Ji bo ko nemrin xwe dane dijmin
Dijminê wek gur, dijminê wek cin

Dixwazin milet dîsa têxin xew
Dîn dikin alet, sed vir û derew

Borcewazên Kurd-hemî borcewaz
Dizin,mêrkujin, tolaz û şerxwaz

Didin ber dijmin kelat û delav
Jêre vedikin:-sînor û perav

Bê tirs û bê pirs, hemî hûr û girs
Serbest têne nav, dixun bej û av

Em nema divên kevneperestî
Ev sedê bîsta-sedê serbestî

Ji bo dijmin re em nabin nekes
Malê xwe nadin mirovên teres

Îdî me navê ev bendewarî
Ev paşdemayîn, dîlî, hejarî

Milet şiyar bû îdî bese bes
Vaye me şikand ew tenge qefes

Ev hezar salin bindest û reben
Bi destê me bes tiving û kefen

Em hev dikujin, talan û şewat
Dane ber lingan hatina welat

Ji bo Şêxan re benî û kola
Ji birçîna tev derketin çola

Dest û lingên me bi zencîr û ben
Girtî di çalê bi rengê Bêjen

Hevalên dijmin tev kevneperest
Malê me dixun bê tirs û serbest

Bi dijmin re ew li perlemana
Me didin kuştin bi çend fermana

Wek pehlewana me didin kuştin
Hevalên neyar, ew xwedî piştin

Rencberê dijmin, fermandarên Kurd
Gerek zû bimrin ev diz û zigurd

Divê Kurd bibî serdarê welêt
Kurdên ciwanmêr, Kurdên bi fehêt

Kurdên bi rûmet, Cotar û Karker
Rojên dijwarî ewê herin şer

Ev kevneperest gerek nemênin
Rista wekhevî ji nû vejênin

Bimrî Kurdên pîs, bimrî koledar
Bijî Kurdistan:- Karker û Cotar

Bijîn canên pak, paqij û şehîd
Hezarên wek te, Hevalê Seîd

## ŞÎNA BÊKES

Eto bêkes niye bêkes, kesit ew role û lawin
Kesit ew şox û şeng û naz, û ew xuşkên belek çawin
Kesit ew rûpelên tarîx û rojnamew, û hemî ristit
Kesit ew canepakin ko li jêr sehpa de xenkawin
Eman boçî dilet mawe, le em çend seg peyayên kurd
Ke dostên dijmin û dijmin, le bo milet heta kewin
Segê har jînî çil roje, çi ê min bî, çi ê dijmin ?
Ke dimrin wek segên bedkar, le her tarîxe bê nawin
Le ezmanê bilindê kurd, sitêrên geş edîb û xort
Ke zorker tarî û zorin, edîb hem lutf û hem tawin
Çi fêda wan segan bo me, heye, kurd bin, we ya nakurd
Ke ew firewn û em mûsa, û ew zehak û em kawin ?
Emin wan nakesan nakim be kes bo xwe, heval Bêkes
Kesim wa her de zindanan, dikin hawar, keç û lawin

## XABÛRÊ

Ey Xabûr,Xabûr,ey Xabûr,Xabûr....
Wek daxwaza min, pir dirêj û kûr
Kêferata te,xum,xum, û lew, lew
Nayên bîra te, ne razan, ne xew
Herdem dinalî, bi qîrîn, gazî
Lê kes nizanî, ka çi dixwazî ?
Armanca te ye, xurtî, pêşveçûn
Cihê te tenge, divê firehbûn
Pêlan didî xwe, qîr û firyadî
Te jî wekî min divê azadî
Sînga vê erdê te çirand bi zor
Nizanim çira tu naçî berjor ?
Ev çende xurtî, bê daxwaz û vîn
Dikevî sînga Derya bê evîn
Xwezka min bi te, bê derd û bê kul
Dijî bi şadî, bê mejî û dil
Tujî wekî min, ger bibûna Kurd
Ev xurtîya te dibû kul û derd

## DIYA KEYO

Ber xwe mekeve ey hevala min
Di bîr xwe bîne tim xeyala min
Xwînî wek me pir, li ser min megrî
Zanim tu xurtî gelek bi sebrî
Zarokên her kes hene wek ê te
Dilê daykan tev ar û pête
Jîna şêst sale ko min tev biwar
Ciwaniya min hilweşand yek car
Bînfire, dilxurt, dikim ez tevger
Bixwaze ev şer çênebî, ev şer
Li deftera jîn navê me xwendin
Niha em başin, îro em rindin
Kerwan rê berda, em tenê diçin
Rê dûr û dirêj, bê ser û bê bin
Di jîna min de armanc û hêvî
Lê ez naxwazim kes min baxêvî
Tiştek nahêlim bi şûn xwe ve ez
Ne xan û ne mal, ne rez û ne pez
Win serbilindin ji xebata min
Ji bo we dîwan, bes xelata min
Para we kême, lê pirin par
Kara we kême, ji herkes re kar
Dimrim da bijîm, pir xweşe ev jîn
Mirovanî tev îro Ciger-xwîn .....

## KEÇA KURD

Keçê rabe serî hilde divê çaxê weha nabî
Binêr jin çûne ezmana, heta kengî di xewda bî ?

Dixwazim zû bixwênî xweş, ji ser rû rakî çara reş
Tu gavan pêşde bavêjî, wekî:-Andêr û benda bî

Çine ev çarik û pêçî, di rextade xwe rapêçî
Bi destê te kelaşînkof, bera zana û xwenda bî

Ji dijmin re tu mêrkuj bî, di hindur de tu paqij bî
Ne xav û bê xuy û rij bî, meger çendan li gunda bî

Bere gundî û rencber bî, welatparêz û perwer bî
Sipî bî yan tu esmer bî, wekî fanos û finda bî

Wekî findê dikî ronî, li bajêr yan li gund rûnî
Diya şêr û pilinga bî, hevala ser bilinda bî

Erê şoxê, erê şengê, bi hevre em herin cengê
Girêdayî heta kengî, bimênî, dîl û winda bî ?

Dixwazim ko wekî min bî, bi dijmin re tu dijmin bî
Di cengê de wekî cin bî, ne rengê bûm û kunda bî

Were xuşkê tu zû rabe, di şer de rengê Şêra be
Bere Ala meya rengîn, li ser şaxan te hilda bî

Di rojên şahî û cejnê, binêrim ez li wê bejnê
Bi hevre em herin dansê, tu padîşahê rinda bî

Şirîn û nazik û rind bî, şeker lêv û sipî zend bî
Were em hev bikin hembêz, bere fetwa xwe min da bî

Keça zana û jêhatî, bibe Partî-Dîmuqratî
Bere dîsa tu şêrîna dilê xorta û Seyda bî

## BERSIVA NAYIFÊ HESO

Ey hevalê minî rind
Çi li bajêr,çi li gund ?
Bo milet û bo welat
Divê bikin em xebat
Gerek em ranewestin
Ma ev ji kê tê xwestin ?
Xewna teya pir giran
Ji bo laşê te derman
Çi xewneke rast û xweş
Dilê te pê maye geş
Hewrê reş û pir tarî
Sitemkarî,xwînxwarî
Ew tîrêjên kesk û sor
Ala me ye çû ye jor
Ar û pêtên ko me dî
Ma kî li me bû xwedî ?
Bayê meyê xurt û gur
Ji Mehabad destpê kir
Va xuya ye wî bayî
Asman ji me kir sayî
Turk û Iraq û Îran
Tirsa me ket dilê wan
Dinya bibî germe ron
Em bi carek koç û kon
Digel tang û top û gêş
Di cengê de herin pêş
Xortê te yê qelew laş

Ew xwe tu car nadî paş
Wê xweşxwanan bixwênî
Çavê dijmin derênî
Ev xwendin û zanebûn
Nêzîk dikin serxwebûn
Xortên wek te pir zana
Gerek bêjin:Nezana
Bere destên hev bigrin
Di vê rê de em bimrin
Bikêr nayê rawestan
Bijî,bijî Kurdistan.

## EZ Û YARÊ

Berî çil sal me yar xwest û bi xeyd go sêwîya nakim
Me go başe,û bûm xwenda,me go vê car
Go qurban,ma nizanî ko tu carî birçîya nakim

Gelek başe û bûm seyda,me rî û cibe wergirtin
Go seyda ma nizanî ez mela û sofîya nakim

Me go başe û çûm bajêr ketim zindan û sêlûlan
Bi ken go ma nizanî ez tucarî girtîya nakim

Me rih û cibe avêtin û me go îcar tu nabê çi ?
Go seyda ez misilmanim tu caran Êzdîya nakim

Me go başe û çûm Bexda me ders gotin,me go îcar ?
Kenî û go nizanî ez tu caran feqîr û xwînîyan nakim

Me go başe niha vame qelabendê Suweydame,dibêjî çi ?
Bi xeyd go ma nizani ez tu caran Durziya nakim

Me go başe li Şam mame li zindana mezê girtî
Go seyda ma nizanî ko xerîb û Şamîya nakim

Me go başe te ez kuştim were ser min bese hórî
Go seyda ez ne horîme mirî û kuştîya nakim

Me go carek tu guh nadî li ah û qîr û nalînan
Go heta kurd nebî serbest bi ah û zarîya nakim

# LORÎ

De lorî,lorî kurê mi lorî
Bavê te kuştin dayik bi gorî
Gernas û mêrxas divê tu negrî
Milet ku sax bî nema tu dimrî
De lorî....
Milet şiyare gelek gihaye
Tiving bi deste li ser çiya ye
Şêr û pilingin,hawîr di bazin
Doza me kurdan,serbest di xwazin
De lorî....
Bi xwîn nivîsîn li ser zinara
Li vir nemaye cihê neyara
Bi qeşte,dijmin,qada me berde
Ev der welatê gernasê kurde
De lorî....
Dijmin bi top û firok û leşker
Bumbardûman kir welat li her der
Hilweşandin tev mizgeft û dîwar
Kûr,kûr,di nalin,jar û birîndar
De lorî....
Zar û zêrçên kurd,pir têne kuştin
Dexl û rez û pez,tiştek ne hiştin
Tazî û birçî,bin banger û berf
Wan naveşêrin,şikeft û berqef
De lorî....
Li ser zikên xwe diçin bi mestî
Hin dest û hin pê,hin ser şikestî

Di şevreşan de gernas û rêber
Şêrên birîndar,dema diçin şer
De lorî....
Dijmin ji tirsan dişkên û dimrin
Derbend û rêçan li ber me digrin
Ji wî distênin derb û berên xwe
Xwedî dikin pê em leşkerê xwe
De lorî....
Serdar bilinde rêzan û mêre
Zêrên serê xwe bişênim jêre
Bere bifroşî,bidî bi şeşar
Berdî pêsîra dijmin û neyar
De lorî....
Qada me berdin ji bo me yek ser
Aştî dixwazin,me navê ev şer
Em jî wekî we divên serbestî
Ma kî dixwazî,dîlî,bindestî ?
De lorî....

## GULA ROJHILATIM

Gula baxê bihişta rojhilatim
Di tarîka şevê rojim hilatim
Ji nav sînga demê pijqîme îro
Di tarîxê fireh hatim,Feratim
Hemî jînim,dixwazim xweş vejînim
Hezar û nehsedî şîn bûme katim
Birûskim,pir çirûsk û hewr û tavan
Bi himhim têm,ji ezmanê welatim
Lehîme ez di ser hev re di borim
Di xwazim nû bikim rêz û civatim
Birûsk û pêt û ar û kevne sojim
Ji pût û lat û lahût re şewatim
Di sojim lê dikim ronî şeva reş
Çira kora ye ev kar û xebatim
Di rê ve ez diçim lê seg di qorin
Fidakarim,li ser rêça felatim
Dixwazim ez di ser hev re bi fûrim
Xebatim,şorişim,xweş kêferatim
Cihan tev de wekî pingav û derya
Tenê jêre wekî cok û qenatim
Bi daxwazim ko serbestî dixwazim
Wekî her kes xwedî qad û qelatim
Dîmuqratim,dixwazim serbilindî
Ji milet re di vê şabatê hatim

## BI PÎRÎ EZ GIHAM AVA HEYATÊ

Me da ser rêçika hat û nehatê
Bi gernasî ketim kar û xebatê
Heye çil sal ko porsorê di xwazim
Ko pîr bûm ji nû şêrîn niha tê
Ser û pa bejn û bala şox û şenge
Di sîngê de memik sêvê xelatê
Belê ez pîr û kal û bê diranim
Serî bûye wekî berfa sibatê
Nexoş û cangiran û bê qidoşim
Nema karim herim nava civatê
Civan ew bû berî sih sal bibînim
Bi pîrî ez giham ava heyatê
Li benda yarê mame dûnde korim
Ji dest min çûn şirîn û Zîn û Fatê ...
Evîn pingave kûr û bê perave
Gelek xoşe, belê cewr û cefa tê
Me daxwaz ketye pişta kohê Qendîl
Bi neynûka di kolim ez ji latê
Wekû ferhad niha bûme çiya dûz
Belê şêrîn di nêv birc û kelatê
Evîn wek Dijle û Zab û Ferate
Seraser ew di gel jan û kula tê
Xeca min ketye destê dêwê sêser
Dinalim ez li sîpanê xelatê
Cigerxwînim dikim qêrîn û hawar
Bi qûran kî gihaye ber felatê ?

# CIWANÎ

Bihişt û bostanê welêt biçûkî sur didan min
Şêrînleb û dêmgewheran ji hawîr ber didane min

Îro ko pîr û jar û mest, bê heval û bê tîn û hest
Ew bax û bostan çûn ji dest neçare tev berdane min

Ma kî divê berdî welat? Şêrîne tev zenar û lat
Bûke di nav rojhilat lê dijmina berdane min

Berdane min ez laketim carek bi nêv çola ketim
Dîsa di ber pêla ketim êş û kulan ser dane min

Ser dane min derd û kula Ahî ji wan dêmsorgula
Ew jêderê derd û dila, dil lanika derdane min

Derdê li min nayên jimar her dem ji ber ahîn û zar
Lê ji bexçeyê rindan bijar ew nazika durdane min

Wê nazik û dêmgewherê şêrîlebê, tîr awirê
Kuştim bi derba xencerê lew ser timî gerdane min

Xencer bi dest dilgawirê ez dame ber yek awirê
Carek ko derxistim ji rê çerxa Felek gerdane min

Ez ketme ber çerxa Felek dijwarî dîtin min gelek
Çavên belek, biskên xelek talan kirin merdane min

## KURD Û FELESTÎN

Bilindî digrî,rûmet bû xemgîn
Tarîx,serbestî,hemî dil birîn
Meydan sar maye,paye bê rûmet
Xurtî,dil,nexweş,rojhilat bi şîn
Namûs perîşan,mehrebanî pûç
Li kurd hozanî tim dikî nifrîn
Perav bi hawar,de rabe ey kurd
Li te di qîrin:-Dimyat û Hetîn
Koledar konê xwe vegirt serbest
Ka Esedidîn,ka Silededîn ?
Qareman-Ereb vaye Xweş rabû
Êrîşe,êrîş li ser Felestîn
Sehyûnê xwînxwer,ji bo koledar
Ev welat xweş kir,kozik û hêlîn
Milyonek Ereb,ji cî derxistin
Welat şêrîne bi serde digrîn
Rojhilat îdî,hemî şiyar bûn
Nema guh bidin maldar û zengîn
Zencîra dijmin,naxin destê xwe
Ji bo koledar,nabi ser nuxwîn
Rûmet bi xwînê,tête parastin
Ji gernasan qet,nayîte kirîn
Dijminê me ne koledar û bes
Em tev hevalin,ne gir û ne kîn
Ger çi hin serkar,dûvê koledar
Xistin dest xwe dar,bê ol û bê dîn
Welat û milet,difroşin dijmin

Xwe tavêjin xwar,weke hov û dîn
Milyarek mirov,serên xwe hildan
Soviyetistan,Belqan,Hind û Çîn
Eger me serê koledar şikand
Felestîn dighê me bê şer û xwîn

## ÇÛNA ŞAM

Şevek tar û reş,ezman pir bilind
Ji ber me winda dibûn şar û gund
Otmobîlek reş şepal û çeleng
Qadê li pey xwe dihêlî bê deng
Serê xwe daye sînga vî bayî
Reşê dişkênî,ji ber ronahî
Şosake hilûs,wek marekî reş
Otmobîla me li ser diçî xweş
Baxçakî pir xweş kete riya me
Mij yekî pirsî,go:-ev der Şame
Li min vegerand her wekû mizgîn
Belê ev Şame-Şama pir şêrîn
Li me ronî bû ronîke pir geş
Zorê dabû wê şeva tar û reş
Em ketin bajêr,Otêlek mezin
Em lê hêwirîn,xweş lê raketin
Sipîde,rabûm,ser-çavê xwe şûşt
Dane destê xwe kitêb û nivişt
Ez çûm taxa jor,xortekî xursî
Bersiva min da:-li kê dipirsî ?
Min divê herim,cem xwedyê Hawar
Kete pêşya min,rêçek xwar û mar
Wî dey li min kir,go:- ho ez benî
Ev xana mezin,lê qata binî
Destê xwe deyne ser zîl û zengil
Wê dengek jê bê wek dengê bilbil
Gava min lêda, zû derge vebû

Lawikek derket ser û çav û rû
Bi min dan zanîn, ko gelek jîre
Lewra min zanî ev torin mîre
Min go:-Cemşîdo, bavê te kanî
Go- wer keremke, rûne li banî
Bi paşve bezî, da bavo mizgîn
Mêvanek me hat, rengê Cigerxwîn
Destê min hejand wî kalê Şepal
Tu xweş, xweş hatî mêvanê delal
Em tev rûniştin, kir pirsa welat
Delavê Hirmiz, ta Mûş û Xelat
Min lê vegerand, bindestê neyar
Ronik ji çavan bi lez hatin xwar
Ez lê dinêrim, dil mest û birîn
Mala te nava dinya derewîn
Gelo ev kîye, ez lê dinêrim
Ev çi dibêjî, guh lê didêrim
Ev nêçîrvanê Zozanê Keper
Îro dikşênî axîn û keser
Qey tê bîra wî, Şarê Cezîrê
Al û tac û text, tev têne bîrê
Ji dest derketin, ev gund û bajar
Îro li Şamê jar û birîndar
Ew mîrê mezin, bi tîp û bi gêş
Îro li Şamê wa bûye derwêş
Sed tifû li te ey dinya rûreş
Tu kes bi royê te nabî dilxweş

Berê xwe da min, bersiva min da
Çi tê bîra te, Seydayê Kurda
Metirsê, êdî, nema em dimrin
Pir hindik maye em welat bigrin
Wan demên borî, ji guh xwe bavê
Rengê kevnare îdî menavê
Şalek te çêkir, bi xam û xetê
Pir xweş dibênim li bejna me tê
Paşê derketin, çapxana Hewar
Rêçek dûr, dirêj, nexweş û pir sar
Me derî vekir, em ketin zindan
Ted go qey bi xwe bûye Kurdistan
Kalê ser sipî kete ser kursî
Şevqa xwe danî ji min dipirsî
Seyda, binêre, ev der çawaye
Min go:- qey weke mala Kurda ye
Biken û rû geş, serê xwe danî
Go:- belê raste, te tê deranî
Lê pir dijware, bi tîpên Kurdî
Du xortên ereb, bûne şagirtî
Ez mame li şam, sê meh zivistan
Heta bi zorê me çêkir dîwan
Hin xortên kurdan, hin mîr û axa
Alî min kirin, mala wan ava
Sermayê min, tev derd û xeme
Ciger:-Xwîn me tirs, ev dinya deme

# BİRÊ.... II

## AWIREK LI JÎNÊ

Peyala jîna min rijîya ser axê ax
Wer guh bide vê nalîn û axê ax
Gizîrê jînê dengê xwe hilda û go
Mala xwe barkin ne hêjaye ev tax

Carek tu were bi delalî,ey delala min
Qurta dawî vexwe ji qurban ji peyala min
Şerabê bi hev re vexun lebaleb serbest
Destevala min birî meke ey hevala min

Em hev dimijin,em hev dikujin,em hev difroşin
Em hev dimijin,em hev dipêjin,em hev di doşin
Di ser hev re derbas dibin,û di nav hev re diçin
Em pêş ve diçin gavan di jînê de sivik tavêjin

Ev jîn gelek xweşe,lê jîndar nezan û hov
Kî zanê bê kê ajot û kê reşandî ev tov ?
Her habûn,û wê her hebin her weha ye ev jîn
Aferîn,û dawer û bîrewerin em mirov

Cihan bindestê me ye lê em destên xwe nadin hev
Naxwazin bi şadî têde serbest bijîn em tev
Dexsok û kur,û çikûs,ji gemarê têr naxun
Ceng û şer û qêrîne li ser vê axê roj û şev

Termekî mirdale,segên har û birçî li ser
Dixun,êrîş dibin,hev bi kuştin,bi şer

Ê xurt pencên xwe dighênî ser kezeb û dil
Lê reben û weza bê havil pal didin li ber

Bi milyaran karker û cotar,perîşan û řeben
Bi destên xwe dikşênin,û bi xwe birçî û bindest
Dewlemendî ji xebata destên me ye lê nezanin em
Destên hev bigrin û bi xwe bibin raser û serdest

Tifû,li me bî,ger em tif bikin ser riwê dijmin
Pingaveke mezin,bi ser wan de tê û bi carek dimrin
Pale dibin serdarên cihan,û serkarên civakî
Hevsarê rist û fermandarî bi dest xwe digrin

Bîrewer tev dibin dost û bira û heval
Bindestê me dibin ev sitêr,çiya û newal
Bê derd û zarîn,dilşad bi hevre dixun,û diçin
Cihan tev bax û bihişte,cejn û ger û kerneval

Şevreş,tarî namênin,cihan tev dibî ronak
Di nav me de beg,ne axa,ne sermayedar,kolak
Her tiştên ne pak ji riwê jînê bavêjin carek
Û ji xwe re bihêlin,bı ser hev de berdin pak

Niha min kara xwe kiriye,dixwazim herim şer
Qelem sarûxe,û di destê min de der û ber
Hevalên min pirin,gernasan hilgirtine çek
Dijminên me tenê mirovên xwînmij,û xwînxwer

Delalê,ji lêvên şêrîn,bide min peyalek şerab

Da bi xurtî gavan bavêjim,bê lerzîn tirs û tab
Tu di bîra min de bî,kengî mirin tê bîra min ?
Xwarina rê ji min re deyne,de rabe ser xwe,rab

Rê dûr û şer girane,dijmin pir ji me xurtire,dijwar
Ji ber me girtine,derbend,rê,newal,û nezar
Divê bi hovî û gernasî em xurte êrîşan bibin ser
Bizor em konê xwe vegrin li warên xweyên kevnar

Xefalokên biskên xwe veke da dil,nekevî nêv dava
Qelpaxên çavên reş bigre,da tîr neyên ji çavan
Li avista riwê tey sipî peyxama Zardeşt bixwênim
Zulfan me de ber anîya kever,da li me ro neçî ava

Wek başok û bazin,daxwaza me tim cihên pir bilind
Dûr di nerin û guh nadin,oqyanûs û Çîn û Hind
Bedbîn,bi çavika reş her tiştî nexweş di bênî
Xweşbîn,bi çavika ronak,her tiştî dibênî rind

Ez û tu ne daxwaz,ji hebûn û jîn û jîndarî
Wer em hev bi mijin,berî ko bar kin ji vî warî
Bê pirsîyarî em hatin,û bê pirsîyarî em diçin
Me çi jê ye,gunhê me li kê dibarî,bere bi barî

Pêwan li ber me danî ne,nahêlin bijîn em ser best
Em girêdane,bi rista kevnare,kevnare perest
Eger rast bêjin,em dibin gawir û bê ol û dîn
Lê eger rast nebêjin,dimênin dest best û bindest

Em hev bi mijin,me di kujin,bê rûmet û bê ol

Em hev bi mijin,me di kujin,bê rûmet û bê ol
Lê ji bo qerêja destê me bixun,bi xwîn sor dikin,çol
Ne diriste ko bidizî ez û tu bighên hev carek bes
Lê diriste ko bighên hev bi def û qîr û heytehol

De ka were zencîrên milên xwe em bişkênin bi lez
Sêncê bi çirênin,êrîş bin nava werz û bax û rez
Êvare roja jîna me xwe berda ye ber ava derenge
Berî şevreş bê,berî em bimrin,tu dizanî çi dixwazim ez

Berê bexçê me nû şêrîn bûye,gihaye ber dev
Were em jê bidizin,û bi dilxwazî bidin hev
Pêwanê kevneperestî şiyar bin wê destê me jêkin
Cihan teng bûye nema bi dest me di kevî rev

Eger ez û tû hev bixwazin,Mihemed û Îsa çi jêne
Çidxwazin?
Ev cihan saze,lê em deng û qîr û awazin
Di nav/Bêdawî/de em têne pişavtin û diçin
Çawa di nav hebûnê de bijîn û di ber hev de ranazin ?

Em ji hev re ne fetwa me ne ev qanûn û ribab
Kevneperestî ji mijîyê me malişt qonyaq û şerab
Li ser masa evînê rûnuştine,serxweş û ser mest
Ji lêvên te şerab,û ji cerg û dilê min kibab

Li gulîyên şengê di nêrim şerpeze hatine berdan
Li Serwê dinêrim bi rist û xweş hatine pêçan
Ji xwîna dilê mine rengê gulê erxewan û sor
Ji kilên çavên te ye çîçek wer hatine kildan

Em hemî yekin,çine:Sipî,sor,û zer û reş ?
Bi hev re bi dilşadî bixun vê cihana xweş
Bere bimrin:Koledarî,û zordestî,ceng û şer
Em hemî bijîn,bê derd û kul,serbest û rû geş

## BEGIM HERE ? HERE .....

Beg ji min xeyidye, axa hew dinere
Di nav min û wan de bûye ceng û şere
Ew dema raborî,îdî hew vegere,
Begim here....
Ji bo pût û latan serî hew datênin
Me win afirandin, emê we bişkênin
Nema dibin kole îdî, em ji were,
Begim here....
Em tev şiyar bûne, neko em nezanin
Hêjî win vegerin, dîsa ne poşmanin
Ê welatfiroş bî, tucar venagere
Begim here....
Tevde kurên Kurdin, ev karker û cotar
Abor bi dest waye, tenê win setekar
Win rençberê dijmin, nabin diser me re
Begim here....
Milet wekî derya, pan û perav dûre
Herkes jê di tirsî, xurt û binî kûre
Nahêlî ên wek we bibin xwedî pere
Bagim here, here,Axam here,here
Ew dema raborî îdî hew vegere

# CEJNE

Cejne îro dilxweşin,herkes li wan pîroze cejn
Pel ji dara dil weşandin,wê li min bahoze cejn

Şahî û cejne,diçin,tên,serxweşin lê ez tenê
Dil nexweş ahan di kêşim,agirê dilsoze cejn

Çîçek û gul çilmisîn,kelbeş bi cejnê dil xweşin
Min ji salê carekê ger bê bihar Nûroze cejn

Ez ji dilber dûrîdestim,jar û mestim,dil nexweş
Ko di cejnê dilberê carek nabênim toze cejn

Cejne nakim ta nebênim dilbera şêrîn û rind
Kenşeker kengî bibênim ez di nav kolxoze cejn

Çîçek û gul bel bibin,sinbil ji şadî bên sema
Karker û palebi şadî bêne ber patoze cejn

Xort û keç bêne sema,tev kesk û sor û rûperî
Tev li mêrga geşt û seyran,dest bi dest xaloze cejn

Doz û daxwaz min ji cejnê şadî û azadî ye
Jar û dîlim,bendewarim,sare lew bê doze cejn

## ÇÛNA MEHRECANÊ

Ev derya mezin, wek gomanên min
Kûr û perav dûr
Hawîr çiya ne wekû dilê min
Pir xurt û sitûr
Şevek tar û reş hemî kul û xem
Wek çarçefa yar
Sipîdê avêt wek riwê dildar
Em kirin hişyar
Hebûn û jînê cihan dagirtin
Wek navê Lenîn
Rojê şev şikand wek leşkerê sor
Çawa çû Berlîn
Ev sitêrên geş, weke ristên min
Belav û bi rist
Hawîr digerin, wek çavên mêrkuj
Şikestî û mest
Gemî xweş diçî, pêla dişkênî
Bi xurtî û zor
Tijî jin û mêr, tev dost û heval
Diçî ber bi jor
Dilxweş û rûgeş, azadîxwazin
Diçin mehrecan
Haştîperesen, mirovparêzin
Ji dil û ji can
Çiqas bibêjim bi zêde, bi kêm
Hevalên bêbext
Nehiştin ez bêm, bême mehrecan
Derbaskirin wext

## EM JI RÊ DERNAKEVIN

Em ji rê dernakevin çendan bi bênin zulm û zor
Lewleb û çerxa cihanê, geh li jêrin geh li jor
Lê bidin dora we ye ey koledar û zorkeran
Ev pîkole em ji hawîr we dikin,çavên we kor
Nîvê karker dar bi destin,ê dî her dem kêferat
Va nêzik bûye dema me,karê dinya tim bi dor
Win li Çîn û rojhilatê meyzekin,xweş meyzekin
Tev di vê rê de di bazin ,wek pilingan qore qor
Her çiqa zorê bikin,win me tajon ber bi pêş
Pir nezîke sewre rabî,leşkerê Kurdî û sor

## DESTÊ TE MAÇ NAKIM

Şeyxê min destên îdî maçî nakim ez bese
Kavil û wêran te hiştin ev sera û Medrese
Şeyxê ewrûpa binêre, wane hasin birne jor
Em bi xişt û def û dîlan, paşketin, tev mane kor
Her keşakî deh zimana zanî rengê efletûn
Em çima hov û nezanin, ser di berde paşveçûn
Qet bi sîwaka te dijmin paşve naçin gavekê
Bo çi tev mane perîşan, dîl û bendê davekê
Xortê Kurdan tev şiyar bûn dil bi pêta agirî
Bayê zanînê li wan da, gur dibî qet namirî
Dev ji vê paya xwe berde, ev tiralî ma çiye
Ma ne şerme, rût û xwase, Kurde jar û tazî ye
Bes di pişt perdêde rûne, ey ciwanmêr xo bi nas
Dijminê jîna welêtî, tim bi dest te tevr û das
Hêj bibêjim, tê bibêjî:-ev cigerxwîn gawire
Na, di bextê tew xwedêde, dil bi pêt û agire
Ez dizanim pir dirêj kir, min li te peyv û kelam
Ger tu Kurd û kurdperest bî, em birane wesslam

## EM ŞER NAXWAZIN

Ev av û agir,ax û ronahî
Ev dar û ev ber,hişk û şînahî
Hatin afirandin cîhan seranser
Da ko bijîn xweş,têde tev beşer

Gihan me:-ev hiş,bîr û bawerî
Zanîn,bihîstin,xwarin,tevgerî
Ev afirandin,hasin,û benzîn
Ev tam,û dîtin,hişyarî û bîn

Ka em bijîn tev,heval û hevdem
Bê kuştin û şer,bê derd û bê xem
Destên hev bigrin,li her şûn û der
Veşartiyan em sivik bênin der

Bela nemênin:-birçî û tazî
Carek nebênin:-hewar û gazî
Koça xwe barkin:-kuştin û talan
Serbest bikin em, cotar û palan

Bibin wekî hev tev:- sipî û reş
Kesek nemênî dil jar û nexweş
Serbest bijîn tev hemî jin û mêr
Bibin tevayî ev hatin û xêr

Ev cîhan xweşe,seranser bihişt
Yek so bibin tev Mizgeft û Kenişt

Ol tev bibin yek:-Mirovperestî
Rist tev bibin yek:-Jînek serbestî

Çekan bavêjin-van çekên mêrkuj
Ji ser xwe rakin mirovên xûnmij
Dezge bi gêrin,ji bo dilşadî
Ji bo serbestî,gerden azadî

Parsek nemênin,nebênin sêwî
Serbest bigerin,li her der rêwî
Derman bikin em derd û nexoşî
Gazin nikin em ji bêqidoşî

Setem nemênî,sipî bibî bext
Senem bişkên tev,ev tacû ev text
Jandirme rabin,ne dar,ne lêdan
Bikin xwendegah,hemî ev zindan

Dilxweş bibin tev hemî weke hev
Yek rû bibin tev ev roj û ev şev
Îdî nemênin,ne talan, ne ceng
Serê me dagrin xweş awaz û deng

Ev tang û ev top,tifing û singo
Bêne veşartin di ting û sergo
Dînxane bibî cihê dilgawir
Ên wek Makmêlan,wek Ayzenhawir

Firanko û Bayar,Çankayçek,Îqbal

Dijminê mirov,kolên xwedî mal
Sîngman-rî,Dalas,Hir Adînawer
Sezaye bo wan kûre û agir

Eger ne ev bin,em zû li hev tên
Aştî û yektî,naçara pêktên·
Destên hev digrin,dibin tev heval
Welat dibin yek-yek ol û yek al

Bela bikenin:-çîçek û sorgul
Bela nemênin di dil de ev kul
Xort û keç bikin tim dans û dîlan
Li her deřî em bikin mehrecan

Şerme,ko em tev,wek dêw û wek can
Hildikşin ser van hewran û ewcan
Da em karibin,hevdî bikujin
Xwîn û xwêdana palan bimijin

Bilind bigerin,li her der û cî
Dema bêne mal,tazî û birçî
Em ev hasin xweş hilfirandine jor
Dîsa ranebû ji ser me ev zor

Raste em gihan rajorê ezman
Li jêr em bê cî,pêxwas û bê nan
Di ser hewran re wek dêw di firin
Li ber derên me parsek di gerin

Me ev sera û eywanên bilind
Avakirin tev li bajêr, li gund
Lê em di bênin koxik û reşmal
Di wan de dijîn, parsek û evdal

Me çêkirin ev, Nexweşxan, -mezin
Li ber dîwaran, reben dibezin
Xercê rê nîne ji gund, bên bajêr
Bi tîfo, dimrin, hemî:-jin û mêr

Peyda bûn li me, zanîn û finûn
Hatin destên me, hatin û hebûn
Hawîr digerin ji bo nanezik
Di dil de şîn tên:-ev gir û ev rik

Ev sitêra xweş em têde dijîn
Pir xweşe lê em hemî dil birîn
Ev rista Faşîst, çewt û nadirist
Şêrîn û talî, tirşî li hev xist

Kirin kerafî xwarin û xweşî
Ev jîn û evîn, kirin dilreşî
Qasek nikarin dilxeş em razin
Sal hemî diçî, bi derd û gazin

Di ser me ra ev xanên poz bilind
Li ber derên wan digerin wek kund
Li ber qasê ye, xwînmijê maldar
Bere her bimrin karker û cotkar

Di ber pirê ve dema ezçim ez
Otombîl diçin û tev tênin bi lez
Li herdû alî tev parsek û kor
Destên wan bilind berê wan li jor

Hemî birane, tev Ademîzad
Çima parsek bin, reben û bêd ad
Çkarin bikin:- firyad û qêrîn
Dilê xwînmijan nerm nabî bi dîn

Bi kêr me nayên ne qîr, ne hawar
Şanî wan bidin, serê ço û dar
Destên hev bigrin, seranser ji dil
Li her alî em, mil bidin ber mil

Hevalbendin em, tev xort û mezin
Êrîş bikin wan pêş de bi bezin
Kaşo li gogê bidin şeka şek
Yan ser şikestin, yan bavêjin çek ?

Em hemî bibin, serbest û azad
Em hemî bibin rûgeş û dilşad
Bibin dewlemend, bi xan û bustan
Da kes nemênî birçî û bê nan

Tazî nemênin, pêxwas û bawî
Qûnax bi qûnax bighêne dawî
Zerre, bişkênin, ji bo xêrxwazî
Bere bimrin tev:-Faşîst û Nazî

Her yek di qada xwe de ser bilind
Bibin wekî hev tev bajar û gund
Serbest bijîn em, hemî jin û mêr
Bêtir dibin ev hebûn û ev xêr

Hero li darxin, govend û dîlan
Geşt û seyran bî, li nêv Kurdistan
Çîmsim, bilîzin, bi kenin lêvsor
Serbest bigerin, li jêr û li jor

Bibî seyrangeh, sitêra Merîx
Têde bilîzin, Şêrkoh û Zelîx
Destên hev bigrin Ferhad û Şêrîn
Qapût bavêj Memê ji ser Zîn

Hembêz bikin hev Romyo û Colyêt
Leyla ji nişka bi ser Qeys de bêt
Bayê sipîdê bidî riwê gul
Dil xweş bibin tev Şalûl û bilbil

Serxweş herin, bên sazbend-bilûrvan
Em hemî bibin dost û dilovan
Çiqas xweş dibî, ev hebûn û jîn ?
Ìdî namênî kesek ciger-xwîn

## EY KARKER BIBIN YEK

Karkerê kurd tev li karin
Dest bi dar û tevr û bêr
Wek xebatkarê cihan ew
Tev di cengê mêr û şêr
Ev cihan qada me ye
Ev cihan qada me ye
Her divê em bibne yek
Her divê em bibne yek
Wek bira bin wek bira

Ta bi kengî kole bin em
Pî di bend û mil di nîr
Tim di benda koledaran
Wer bi mênin destegîr
Ev dema azadî ye
Ev dema azadî ye
Ger bi kuştin wer bi hiştin
Yan xweşî û yan reşî
Her divê em bibne yek
Her divê em bibne yek
Wek bira bin wek bira
Tev mirovin em bi carek
Gewr û sor û reş çiye
Sed tif û sed tif bibarin
Zor û diktatorî ye
Ev setemkarî çiye ?

Ev setemkarî çiye ?
Ger bi kuştin wer bi hiştin
Yan xweşî û yan reşî
Her divê em bibne yek
Her divê em bibne yek
Wek birabin wek bira

# EM JI NÛ BERJOR DIÇIN

Welat hemî ji dest me çû,axa carek ne xeyidî
Lê îro gundê wî diçin,binêr çawa di xeyidî ?
Xwedî ku pez berdî çiyê,ser têxî tamara xewê
Her kes dizanî,ko,gur û wawîk û diz dibin xwedî
Şêx û beg û axane ko,em dane bin destê neyar
Li ser me xo bilind dikin,bê şerm û bê eyb û fedî
Milet şiyar bûye ji xew,zanî çine rast û derew
Nema dibî kolê we ew,ma kengî şêr dibin gidî ?
Nezanî ketbû nav welêt,me destê şêx maçî dikir
Karê xwe ew bi wan dikî,nîsk û nanê cehî didî
Xelk bûne padîşah bi zor,asin bi zanîn birne jor
Lê em bi jêr de baz didin,ta bûne muxtarê şidî
Nezanîya we ye ko em sipardine bextê dizan
Cezayê vê nezanîyê bi tirsa a paşî bi dî ?
Ava ferat jo jor ve tê,kî karî xwel ber ragirî ?
Lê ku serma bi ser de tê,dibî qeşem di cemidî
Kevir ji banî ve ku bê,kî karî rawestî li ber
Lê ku perçe,perçe dibî,her bi cîkî rû di dî
Ew kevir şahînşahî ye,ew perçebûn axatî ye
Şopa we zanim xware lê riya rast û dirist me dî
Bi jor ve wek bira herin,ber bi birc û sera herin
Lê bi loks û çira herin,sed bi yekî,yek bi sedî
Divê milet şiyar bikin,cotar û palan kar bikin
Xencer bi dest rabî ji pê,welat bigrî û bernedî.

# EY QATA PERÎŞAN

Ey qata perîşan û reben çende di borî ?
Findî xwe di sojî,û ji dijmin re bi nûrî
Serkana qetûtî,bi xwe deryayê eborî
Tarîxê sivik pêşve bibe,hêjî li dûrî

Çend sale li bin destê neyar her we digazî
Îdî bese rabin,û bi dil xurtî bi bazin
Doza xwe,divê em ku bi mêrane bi xwazin
Ey karker û cotar û ciwan,şerme ku razin
Wek bazê ku ser daniye ber bûm û tilûrî

Wek Cûdî,li ser te mij û moran û kul û xem
Bin destê te derya û zevî,karkerî her dem
Asin te bi banî ve firand,girtiye ber çem
Zerre,te ji hevdî pijiland/keyfe/ji nêv /kem/
Daxwaz ji hebûnê,tiwî,hê,çende tu kûrî ?

Wek pêl û lehî,kengî serî hildî,tu mêrî
Toz û setemê,ber xwe dibî,jêk vedijêrî
Aşî,bigerî,xweş serê dijmin tu di hêrî
Her tişt tu bi zendên xwe yî pêçayî di gêrî
Heyha,!...tiwê qeleş,û tu cebar û xefûrî

Destên xwe li meydanê bidin hev wekû şêran
Carek xwe ji qadê çeng bike van hayv û sitêran
Aştî,xweşe van birc û seran bes bike wêran
Paya te bi zanîn û hişe,guh me de zêran

Ger hiş te nebî,ber hov û teba pêşî û mûrî
Ev hiş te ji ku girtîye hûr guh bide,zinhar ?
Barê te girane,çilo rê tarî û dijwar
Taktîk ji te ra danîye/Lênîn/bibe hişyar
Ger dest tu hilênî,dişikî dijmin û xwînxwar
Nabî ku hebin rengê te mil hişk û sitûrî

Îdî me navên,ceng,û ne firmêsk û ne kuştin
Çend sale li ser hev,ku di vî arî biriştin
Ev deşt û çiya,şîp û çem,û dar û bihiştin
Tev rez û sirin,kewk û çiwîk qidqid û qiştin
Tarîxe,bi rist pêş ve di çî her we di borî

Mehr û xweşîya canê xwe ey xortê serefraz
Gava tu diçî,zanibe daxwaz,çiye,daxwaz
Destên xwe bi germî bide şêrîn û perîraz
Azadî bixwazin,hemî,yek deng û dil û gaz
Em tev de yekin kurd û Ereb,Çînî û Kûrî.

## HAYDÊ GILÎ MEKE

Be derê Serayê gundî bûne leke
Yek dibêjî ê dî:-Haydê derî veke
Madem rê nasnakî xwelîl serê xwe ke
Haydê gilî meke
Dev ji we bernadin,çiqa win bi gazin
Axa qadê nadî çiqa win bi bazin
Mêre weke şeke xwelî lserê xweke
Haydê gilî meke
Li hev win bi pirsin, destê hevdî bigrin
Ji Axê me tirsin, ma qey winê bimrin ?
Win bîstin, ew yeke xwelîl serê xweke
Haydê gilî meke
Gilî li cem kê kin, tev hevalên wî ne
Ma wê serî jêkin ? tev borcewazî ne
Perê xwe xerc meke, xwelîl serê xweke
Haydê gilî meke
Roja intîxabê, we da destên wî dar
Îdî gilî nabê,çiqas bikî hawar
Bes, çavê xwe veke,xwelîl serê xweke
Haydê gilî meke

Ev peşkên baranê,yeka,yekan tên xwar
Lê ko hevdî digrin,dibin lehî,dijwar
Carek lê meyzeke,xwelîl serê xweke
Haydê gilî meke
Hasin ji axê ye, binêr çiqas hişke
Tijî wek axê ye, li ber dibî mişke
Hişyar û feneke, xwelîl serê xweke
Haydê gilî meke
We berdidî hevdî, li ser we dilîzî
Sîh sal ez dibêjim, hêjî na bihîzî
Dest hilanîn çeke, xwelîl serê xweke
Haydê gilî meke
Ev bigilî nabî, zû,zû hev bibênin
Divê milet rabî, li ber desthilênin
Tevde bibin yeke, xwelîl serê xweke
Haydê gilî meke
Tektîka rêzana bigrin Birolêtar
Welat bi parêzin, ji dijmin û neyar
Ev rê ne heneke, xwelîl serê xweke
Haydê gilî meke
Serê koledaran divê em bişkênin
Paşê qad û hasin, bi zor em bistênin
Hevalan peydeke, xwelîl serê xweke
Haydê gilî meke

## HEY PALE

Hey pale pale pale
Das li malê betale

Paleya genmê sore
Patozan qore,qore
Palan hawî da dore
Çavê maldaran kore
        Hey pale pale pale
        Das li malê betale
Palaya genmê şîne
Patozan tev çinîne
Pale lihawîr civîne
Zarok li mal birçîne
        Hey pale....
        Das li...
Paleya Genmê zere
Patozan xweş da bere
Pale çibkin ji xwere
Kar nemaye ji were
        Hey Pale....
        Das li...
Genmê reşê tilyanî
Patozan tev hilanî
Zarok li mal birçîne
Dikin qêrîn:-ka nanî
        Hey pale....
        Das li...

Genmê sorê qendare
Patoz hatin ser kare
Tişteк nema ji palare
Divê em bigrin dare
        Hay pale...
        Das li....
Divê em hev bibênin
Mêrane dest hilênin
Serê maldar bişkênin
Patoz ji mer dimênin
        .....
        ...
Divê em tevde rabin ,
Zevî li me bela bin
Zorker ji ser me rabin
Em tev wekî bira bin

.............

## JI HEVALEKÊ RE

Zivistana me dijwar
Weke dêwê dîn û har
Paşde,revî,bû bihar
        Mizgîn li te Evînê
Bahoz û sar û serme
Gelek barîn li ser me
Îro bihare germe
        Mizgîn li te Evînê
Sir û serma şikestin
Min û te ev dixwestin
Baqê gulan bi destin
        Mizgîn li te Evînê
Bilbil serek li gul da
Sinbil serê xwe hilda
Me kul neman di dil da
        Mizgîn li te Evînê
Bîst û yekê adarê
Yanî serê biharê
Gul bel bûne li darê
        Mizgîn li te Evînê
Giya geşe rû bi ken
Sor û zerin lêv û çen
Cihan hemî bi rewşen
        Mizgîn li te Evînê
Çîçek çavên xwe kil kir
Sosin dawa xwe hilkir
Şevnem şînahî şil kir

Mizgîn li te Evînê
Sir tê katik di hejin
Ronik ji wan di rijin
Derdê dilan di kujin
Mizgîn li te Evînê
Bilûra dengê avê
Li me dikî selavê
Me zordestî qe navê
Mizgîn li te Evînê
Roja me ya sor û zer
Taca zerîn daye ser
Tava xwe daye her der
Mizgîn li te Evînê
Candar hawîr di bazin
Ne gilî î ne gazin
Em jî wesan di xwazin
Mizgîn li te Evînê
Ne wek hevin dem û çax
Bes bi nale ax û ax
Va bel dibin pel û şax
Mizgîn li te Evînê
Li pey hevin roj û şev
Were destan bidin hev
Bi serbeştî bijîn tev
Mizgîn li te Evînê
Selav ji min bi bara
Bi barîne li yara
Weke tavên bihara
Mizgîn li te Evînê

Dilê min wek ferate
Bi xum,xum û xebate
Dixwazim bême ba te
Mizgîn li te Evînê
Lê ji her tiştî çêtir
Ez dixwazim tu bê vir
Ev Şam bûye wek şekir
Mizgîn li te Evînê
Gul û çîçek li ber rê
Wê bel bibin dema bê
Dil xweş dibin wê demê
Mizgîn li te Evînê
Serê roja me derket
Bextê sipî bi ber ket
Xêr hatîye û şer ket
Mizgîn li te Evînê

## KARKER

Ey karkerên xurt:
Karkerê reben,karkerê cotar
Karkerê rencber,karkerê hejar
Li ser pişta te:
Ev karê giran,ev barê giran
Bi dest we halet,bi dest we tev kar
Bindestê dijmin:
Dijminê xwînxwar talanker û diz
Ji we zana tir,li ser we serbest
Bextê we ê reş:
Maşê we pir kêm,li ser av û dêm
Qet nabin azad,qet nabin serbest
Zendên we yên xurt:
Bi bend û zencîr pişta we dişkê
Bi dar û kamçî,bi kurtan û kar
Nayê bîra we:
Carek bibin yek win jî wekî me
Bi we radibin,ev çol û beyar
Dixun serm û germ:
Renc û dijwarî xwêdan û lêdan
Nezan û reben,bindest û êsîr
Dema we digrin:
Ey rencberê jîr dixin zindanê
Dixin lingê we merbend û zencîr
We difroşin hev:
Ne cî,ne welat bê bend û partî
Ne al,ne milet,ne hiş û ne bîr

Bav û kalên me:

Ew jî wek me çûn hemî dil bi kul
Hemî dil birîn,wesan şil û pil

Dema we va hat:

Hemî wekî hev ne diz,ne mêrkuj
Rabin bibin yek bê bend û gij,gij

Eger win hemî:

Carek bibin yek rabin weke mêr
Wê bişkên zencîr bişkên qeyd û bend

Em jî di gel we:

Bibin bi rûmet bi al û welat
Bibin serfiraz,bibin ser bilind

Tenê hişyarî ji bo we divê:

Ji bo we divê xwendin û zanîn
Ey karkerê xurt ey hevalên me

Lê ez çi bêjim:

Xoû biraxo,bûn dijminê me
Mane perîşan,win jî wekî me.

## KA MIROVÊN BAŞ ?

Berjor diherim,li jor dinerim
Li jor digerim,dikim vegerim
Venagerim ez
Weke çerx û aş
Hawîr digerim
Li xortekî baş

Ketim kortala,binê newala
Dikevim çala,ez destevala
Hawîr digerim
Wek dolab û aş
Divêm bibênim ez xortekî baş

Li ber dîwara,lat û zinara
Kaş û berwara,wan kevnewara
Çavê xwedgerênim
Ez xwe nadim paş
Divêm bibênim ez xortekî baş

Diçim ser çiya,nav gul û giya
Li ber çem û av digerim her gav
Çeleng û qellaş
Ez xwe nadim paş
Divêm bibênim ez xortekî bas,

Di destê min de geşin mûm û find
Hawîr digerim li bajar û gund

Bi qîr û halan
Sipas û şabaş
Divêm bibênim ez xortekî baş

Dengek hate min,ji xwe di pirsim
Lê narevim ez qet xwe nadim paş
Dengê kêye ev bi saw û tirsim
Lê narevim ez
Qet xwe nadim paş
Divêm bibênim ez xortekî baş

Ew deng dibêjî:-bes bike halan
Ew mirovê baş hê wê bê cihan
Çiman digerî
Çewt û leç û şaş
Wê piştî te bê ew mirovê baş

Na ez pir şaşim ev cihan şêne
Hawîr kêlik û nîşan û rêne
Ma qey digerim ez wisan belaş ?
Li herder hene mirovên pir baş

## LEHÎ YA SOR

Ey lehî ya sor, ey lehî ya xurt
Ev deşt û newal,hemî te dagirt

Dema tu tê xwar, bi peşk û dilop
Li jor çênakî, ne rêç û ne şop

Lê ko dibî yek, her kes dil bi tirs
Didî ber lingan, çi hûr û çi girs

Li kê tu rast bê, dişkênî tavil
Bajar û gundan, tev dikî kavil

Dijmin di revî, bê çek û bê dar
Ji ber te dişkên, bi qîr û hawar

Seyda kiye, ko, ev ders daye te ?
Yekîtî ji kû, wer gihaye te ?

Em jî herin cem, dersê bistênin
Destên hev bigrin, hevdî bibênin

Wek te bibin yek, daxwaza me tev
Dijmin ji ber me, zû dişkê bi rev

Bi hev re êrîş, bi qîr û gazî
Dil bi kul, bimrin ev Borcewazî

Bixin bin lingan weke serê mar
Serê dewlemend, serê koledar

Ne wek te bêbext, bê ol û fersend
Dijminê milet, dostê dewlemend

Te dane ber xwe, weza û reben
Bi kul te gorand, ew şadî û ken

Ev kelpîç û dar, ev text û şirik
Kumişîn ser hev, bûne wek pirik

Wek Ayzenhawir, wek Teymûrê leng
Dilê te pir hişk, tim dixwazî şer

Bere ev sêwî, jar û belengaz
Li ber dîwaran, bikin:-gaze, gaz

Kara dewlemend, di ceng û di şer
Ziyan tim para, cotar û karker

Birinc û pembû, te dane maldar
Lê te talan kir, karker û cotar

Bela te li me, kara te li wan
Tu jî li ser me, bûye pehlewan

Roja ko dema me jî wek te hat
Em dest bidin hev, bi kar û xebat

Serê te jî wek, serê xwedî mal
Ji hev belav kin, bikin tev Qenal

Her cihî bi te bikin şînahî
Riwê vê qadê, bikin ronahî

Kengî me maldar, hevalê te kuşt
Cihan xweş bikin, bi te wek bihişt

Îdî nahêlin, ne şer û ne ceng
Bibin wek bira, em hemî bê deng

Ji ber me rabin,ev sînor û xet
Berxwedar bijîn,em-hemî milet

Têxin destên xwe,hevsarê hasin
Candar,hemî,em,hevdî bi nasin

Raserî/xo/bên,kulma li ser xin
Tiştên veşartî di nav de derxin

Wê çaxê,ava paqij û delal !
Ji bo her kesî dibî milk û mal

Setem û zora te qet namênî
Tê xurtêmêran,hingî bibênî

Tu jî xweş dibî,weke dilê me
Kulên me diçin,şên tên gulê me

Şopa te dibî,tev belor û cam
Dibin xalîçe,kolan û şeqam

Her kes rû bi ken,dil xoş û şadî
Bê bend û zencîr,gerdenazadî

Hemî bi rûmet,çi mêr û çi jin ?
Tenê cenga/xo/bi xurtî de kin

Payîz,zivistan,bihar û havîn
Bi.te,bi zerre,her der bikin şîn

Nema tu karî,bişkênî dara
Qet kes namênî li ber dîwara

Navê zorkeran,ji dinya diçî
tenê tu xweş reng dimênî li cî

Bes, ji bîr meke, ava Kurdistan !
Li ser sînga min, bike gulistan

Belkî zû bimrim, gelek nemênim
Wê dema pir xweş, wek te ne bênim

Qet nebî, bera ev laşê têr kul
Ji xwe şîn bikî, hin sosin û gul

Deynin ber pozênxwe, xort û ciwan
Herin ser lêvên sor û erxewan

Toza vî laşê bi êş û bi derd
Nedî ser lingên ciwanikên kurd

Xwîna vî dilê bi derd û giryan
Reng bidî sor gul, xunaf û xwêdan

Bi kûpê serim, bi gerênin mey
Da tev bi hejin, li ser me wek ney

Gava bîn bikin, wan gulên bîn xweş
Bi hev bigorin bi ken û rû geş

Navê me carek bênin bîra xwe
Xweşxwanan bêjin di nêçîra xwe

Bawer dikim ez, ey lehî ya dîn !
Tê bi xuş herî, wek dengê şêrîn

Dema xort û keç, xweş ristan bêjin
Ew gul û giya, wê xweş bi hejin

Ey lehî ya dîn, ey ava şêrîn
Em û tu tev de, veşartîyên jîn

Qencî,neqencî weke roj û şev
Çiman zordestî em bikin li hev ?

Bimrî zordestî,tev zor û setem
Bijî wekhevî her gav û her dem

Ev mada insan pak û dûrbîn
Çima nabin yek,ez bûm Cigerxwîn

## LAYKA ÇÛYE JOR

Ey Layka hêja,Segê bextîyar
Me tu şande jor,em mane li xwar
Dengê te ê xweş ilham di dî min
Bêtêlika te,Peyxam didî min
Ji vê çûna te,cihan maye gêj
Miyê koledar,tev girtî qerêj
Hayva tu têde çi renge ew heyv ?
Çawan dighê me,ew deng û ew peyv ?
Xwedêkî bêje,çawan tu gihişt ?
Gelo,te nedîn,dojeh û bihişt ?
Li hawîr qadê,çawan digerî ?
Aya dibênî,Ferîşt û perî ?
Me tu şande wan rajor û ewcan
Ji te di tirsin,ew dêw û ew can
Ji wan re bêje:-serbest û bê tirs
Ferman û peyxam,xweş gotin û pirs
Hilkişîme jor,ger çi ez hovim,
Hatime cem we,peykê mirovim
Ew mirovê xurt,serbilind,hişyar
Bîrewer û jîr,çêkrox û dijwar
Karê xwe dikî,êrîş bikî jor
Ma win nizanin,ev dinya bi dor ?
Çend hezar sal bûn ji we di tirsîn
Li her cî û der,li we di pirsîn
Ey sawîr û dêw,cin û pîrhevok,
Têne şerê we,mirovên devlok
Ew tirsonek tev,bûne weke şêr

Berê xwe dan jor,namênin li jêr
Cihê we digrin,bi zor û bi şer
Bindest dimênin,li her cî û der
Wê bi zor bigrin,ezman û sitêr
Ewê bêne jor,winê herin jêr
Dîl û bendewar,dimênin win tev
Nakevî dest we,ne bazdan ne rev
Ew tilisma we,vaye dixwênin
Perdê ji ser we,divên hilênin

Ey Layka mezin,wey segê rêzan
Berî min tu çû,gihiştî ezman
Bi dengê xwey zîz,bike zûre,zûr
Li te kom bibin,ew perî û hûr
Bo te bavêjin,pate û selav
Xweş û geş bikî,riwê te ew tav
Li hawîr bikin,govend û dîlan
Şabaş û haw,haw,çepik û lîlan
Li ber te vebî,dergehê bihişt
Laşê te bibî ji şadîyê mişt
Lê êmin li vir,bindest û reben
Nayê destê min bihayê kefen
Li ser hev dîlî,jarî,bindestî
Jîneke naxoş,seranser mestî
Ev birayên min,xurt û hov û kor
Mafê min dixun,bi kotek û zor
Dema dixwazim,bijîm wek insan
Lêdan û kuştin,zencîr û zindan
Bawerî ya min ya xurt û bi tîn

Xiste dilê wan,sed ta, û lerzîn
Di tirsin vebin,ev embûr û nîr
Ji ser me rabin ev bend û zencîr
Li hawîr poşan bidin koledar
Bixin destê xwe em rejîm û dar
Cî namênî,ko,bi revin ew gur
Bayar û Iqbal,Sêr-Ayzenhawir
Ew hov û devlok,ku bişkin bi rev
Hemî di mênin,bê gotin û dev
Di sînga wan de bikutin em mîx
Cihê wan dibî,serguwên tarîx
Em hemî bijîn xweşî û şadî
Bimrî zordestî,bijî AZADÎ

## MEHRECAN

Pêkve em xortê ciwanin
Tên ji her şop û cihan
Mehrecan bo me civanin
Her bijî ev mehrecan
    Doza me her azadî ye
    Doza me Dîmuqratî ye
    Doza me her aşîtî ye....
Ger bi vîn, û ger civîn
Yan xebat û kêferat
    Herdivê em herne pêş
    Herdivê em herne pêş
        Bo felat û bo welat
Em hemî dost û hevalin
Bo çi bend û berberî ?
Têkde nûhatî,delalin
Ev çi ceng û şerkerî ?
    Doza me dewletmendî ye
    Doza me serbilindî ye
        Doza me her aşîtî ye....
Ger bi vîn û ger civîn
Yan xebat û kêferat ?
    Her divê em herne pêş
    Her divê em herne pêş
        Bo felat û bo welat
Em dibistanan bixwênin
Kar û pîşîk hîn bibin
Bax û bustanan biçînin

Çîçek û gul şîn bibin
Doza me her xweşwîstî ye
Doza me her serbestî ye
Doza me her aşîtî ye....
Ger bi vîn û ger civîn
Yan xebat û kêferat ?
Her divê em herne pêş
Her divê em herne pêş
Bo felat û bo welat
Dest bidin hev em bi carek
Tev di hember koledar
Pêşkevin wek pehlewanan
Lê bi tektîk û şîyar
Doza me mirhovanî ye
Doza me her avanî ye
Doza me her aşîtî ye-aşîtî ye
Her divê em pêşkevin
Her divê em pêşkevin
Bo felat û bo welat

## MARŞA SEWRÊ

Rabin ser xwe hêrş û sewre despê kirye qîr û deng
Roja me ye,roja karker,roja cotar,herne ceng
Em ji dijmin zû bistênin,qad û hasin av û gaz
Ne em tenê dinya hemî îdî bibin ser firaz

Gundên me ne,avên me ne,em tazîne, em birçî
Van xwînxwaran, tev sitandin, em bê karin,em bê cî
Rê nemaye cî nema ye,çare nîne ji bil dar
Hernê,wernê,tev bi hev re da zû bişkê ev neyar

Dîlî bimrî,serbestî bê,xort û rencber weke şêr
Ala me ya,das û çakûç têde,hildin weke mêr
Em bişkênin,qeyd û zencîr,îdî navên bindestî
Bijî karker,bijî cotkar,bijî roja serbestî

Mêrên çê bin,pişta me ye yekîtîya Sovîyat
Çare nîne dê bi mênî her ji bo me ev welat
Di cengê de wekî mêran,tev de bê jin bi qêrîn
Herdem bijî ev rêçika daye ber me/vî seydayê/Cigerxwîn

## MARŞA HAŞTÎ

Şerkeran tang û top dane pêş eşkera
Lê di zanin çira,şer dikin,bo pera
Lê divê pêşkevin,dil bi kul,ser bi xûn
Hin bi bêjin:-hebûn,hin bi bêjin:-nebûn

Bo çi em wek bira,tev bi hev nakevin ?
Lê çira,wek gura,em bi hev dakevin ?
Zorkerî, Xwînxwerî, îdî qet nameşî
Em şîyar bûn ji xew, me divê tim xweşî

Min divê aşîtî, ev kevoka ciwan
Ev xweşî,raweşî, ser seraser cihan
Aşîtî,dilxweşî, tim divê em bivên
Gazinan da nekin ê ko piştî me tên

Em bibin yek hemî,peyde kin wekhevî
Tadi gorê setem,dil bi kul rakevî
Pir bi rûmet bibin,kar û bîr û qelem
Jîn bi me xweş bibî,tev bira bê setem

MARŞA COTKARAN

Bi destê me tevr û bêrin
Ciwên avê em dikolin
Di vê rê de beranin
Deştên xwe em pê av didin
Da şînahî zû derkevî
Ne çavnêrê baranin
Siya dara bidî ser me
Berê salê xweş û pir bê
Dexl û dan û zêrzewat
Dewlet serê ava dicle
Ava ceqceq,ava xabûr
Ya belîx û ya ferat
Zevîyên me tev parve bibin
Weke hevin,tev birane
Hemî xelkê welatin
Di nav me de,ne beg maye
Ne axa ye,ne paşa ye
Xwedî kar û xebatin
Qada meye, ava me ye
Bi dilxweşî bi rûgeşî
Tev bira û hevalin
Karê me ye,barê me ye
Ciwên avê em bi hev re
Bi dilxweşî di malin
Zarokê me tev de diçin
Xwendegehê ew bi kurdî
Bi serbestî dixwênin



Dektorê me tev ji me ne
Şev nemaye ronahî ye
Em her tiştî dibênin
Em serbestin,zor nemaye
Gundên me jî pir xweş bûne
Av û dar û sînema
Di nav me de gir nemaye
Dewlet serê yekîtîyê
Di ser me ra kes nema
Dewlemendin,xwedî gundin
bi me xweşe şev û rojan
Îş û pîş û karkirin
Roja cengê,bi dilxweşî
Vî welatî di parêzin
Nayê bîra me mirin ?
Di vê rê de pêşkêş dikin
Sipasên xwe em ji bona
Yekîtî Sovîyat
Piştemêrê qels û kêma
Azadîxwaz,haştî peres
Wî li me kir ev xelat

## MARŞA XORTÊN DÎMUQRAT

Em ciwanên welatin,haşîtî tim divê bo cihan
Tev pilingê xebatin,kirne yek zor û zilmên giran
Tevde xortê ciwanin
Ser bilindê cihanin
Rabin bi bên
Deng û qîren
awazê xweş
Rabin.
Li her derî xoşxwan di bêjin ciwan
Her xebat, her weha ...
Da cihan tev zanibin em ejdeha
Ejdeha....
Em ciwanin ev cihan tev de qada me ye
Li her derê xoşxwan dibêjin ciwan
Her weha.....
Da cihan tev zanibin em ejdeha
Ejdeha....
Em ji bîr nakin tu carî,xwîna gernasê xwey ser bilind
Em gihan hevdî neçarî,tev bira ne xort û rind
Bo bilindî herne pêş
Xurt û rindî herne pêş
Şêrên welat
Rabin xebat
Tev ser bilind
Rabin.
Pêşve naçin tu caran pêşveçûn her divê bo xebat
Naşikênin tu sozan distirênin ji bona welat

Bixne bin pê zorkeran
Bidne ber pê şerkeran
Xortên ciwan
Bigrin cihan
Sax bin bira
Sax bin.
Li her derê xoşxwan dibêjin ciwan
Her xebat her weha....
Da cihan tev zanibin em ejdeha
Ejdeha....
Em ciwanin ev cihan tevde qada me ye
Li her cihî xoşxwan dibêjin ciwan
Da cihan tev zanibin em ejdeha
Ejdeha,ejdeha....

## PERÇAK TORE

Zivistan hat, sare zivistan
Kar, xebat, tevger, hemî rawestan

Xo pel weşandin
Berjêr kişandin
Bahoz û serma
Ew rahejandin

Gul, kulîlik, şax, pel
Hatin veşartin
Deng, reng, hatin guhertin
Wek ar vemirtin

Ketin zikê Dêw
Hemî bûne ax
Ax, ax, ax, ax
Sed carî, ax, ax
Em jî wer diçin
Bê ser û bê ber
Em diçin, diçin
Diçin, her diçin
Lê em diçin kû ?
Di kevin bin pê
Yan dikivin rû ?
Şiyar nabin zû
Kanî heçî çû ?
Kerwan:
Kerwanê jîn

Kerwanê evîn
Dil xurt û bi tîn
Birê ketin em
Li pey hev birêz
Hemî xeml û xêz
Bûne şerîpan
Hemî em mirov
Weke hirç û hov
Di kevin çîya
Nav gul û giya
Newalên di kûr
Hemî mar û mûr
Armanc pir mezin
Rêça me pir dûr

## RENCBERÊ BI RÛMET

Kalek hebû li bajêr
Kuflet li ser bûne deh
Dilê mirov bi wana
Di şewitî, wey guneh

Kurê kalo ê mezin
Dibêjine wî:- Salar
Tu kar nema, nekirye
Heta dawî bû cotar

Piştî ew qas zehmetî
Bû ajiwê terektor
Kinc û nan û çigare
Nû derdixî, ew, bi zor

Geh ew li cem axê ye
Geh jî li cem çelebî
Paşê hate cem yekî
Dewlemend û Helebî

Xew bi çavan nakevî
Ne bi roj û ne bi şev
Dikî nakî nikarî
Nanê kuflet bidî hev

Di gel çend hevalên xwe
Li cem/Zoro/ rawestan
Mûçî wî bû sed kaxet
Belkî derxî mafê nan ?

Hero, hero, dibêjin:-
Ji axê re:- ka pera !
Axa dibê:-ser çava
Ezê bidim ser sera

Piştî hatin mala xwe
Dil bi derd û dil bi kul
Salar, sûnda mezin xwar
Îdî naçim ser şuxul

Hersê mehên payîzê
Ma bê kar û ma tiral
Lê ji tirsa bavê xwe
Nema bi roj diçî mal

Tim li qehwê rûdinî
Geh vexwarin, geh qumar
Heta deynê Qaweçî
Li ser piştê bûne bar

Kalê bavê nexweş ket
Çav li riya/Melkemot/
Xuşka biçûk diya wê
Şande qehwê jêre got

Dil bi kul û dil bi xem
Ji wê rabû hate mal
Li cem bavê xwe rûnişt
Awir danê bavê kal

Hê nû hate bîra wî
Ko barekî pir mezin

Barê vî kufletê hûr
Ji nû ket ser milê min

Salar çavê xwe gerand
Li xanî û li dîwêr
Kela dilê wî rabû
Di çavan re hate jêr

Enî tev bû qermîçok
Herdû birû gihan hev
Dinya li ber tarî bû
Zû gotinek hate dev

Xwezî ko ez nebûma
Li vê dinya pir teres
Paşê li xwe vegerand
Go:-ma tenê gelo, ez ?

Siba bavê min dimrî
Ezê çawa veşêrim ?
Riwê dost û neyaran
Ezê çawan binêrim ?

Çawa vî kufletê ha
Bi serbestî xwedîkim ?
Riwê xwe û riwê wan
Li nav xelkê sipîkim ?

Em têr nan û dew naxun
Dixebitin roj û şev
Xwedyê qesra sê tebeq
Çawan zêran didin hev ?

Salar kete gomanan
Kalê bavê lê nerî
Lê naxwazî kurê xwe
Ji nişka hilbidêrî

Kalo destê wî zû girt
Go:-xem nexwe kurê min
Jîna min tev wesa çû
Kes nezanî sirê min

Xalê te ye dikandar
Siba her cem xalê xwe
Bere kefen bidî te
Lê ji helal malê xwe

Apê te jî xerate
Pir silavên mi lêke
Wê tabûta min bê heq
Ew ji kîsê xwe çêke

Kurê min ev dinya ha
Her wesaye, guh medê
Ev kufletê hûr û pir
Rizqê wan jî li xwedê

Tenê divê şiyar bî
Xebatkar û dilovan
Divê ko qet ne tirsî
Da ko bibî pehlewan

Welatê xwe bi parêz
Bi ser bestî weke mêr

Ev kevirên derê te
Hemî dibin dir û zêr

Rast û dirist bi rê de
Here weke bavê xwe
Qet li malê feqîran
Megerîne çavê xwe

Gelek hene wekî te
Destên xwe win bidin hev
Şerê sermayedaran
Tev de bikin,roj û şev

Hişê Salar hate ser
Wî li bavê xwe nerî
Lêvên kald gihan hev
Ziman îdî hew gerî

Salar serê xwe hejand
Çavên xwe wî ziwa kir
Go:-ev kalê bavê min
Çima hat, û çima çû ?

Îdî çare nemaye
Çû cem xalê dikandar
Kefen ji cem wî anî
Bê gotin û bê bazar

Tabût,ji cem apê xwe
Anî,kalo veşartin
Bi wan derd û kulên xwe
Salar,çend meh qedandin

Rokê xalê dey lê kir
Go:-ka heqê cawê min
Xalo,heqê cawê çi ?
Ha, kefenê bavê min ?

Başe,ser herdû çavan
Xalo,ezê bidim te
Dil kul ji cem daye rê
Berê xwe da apê xwe

Apo go:-ha, tu hatî ?
Ser çavan bê,birazî
Xwedyê textan heqê xwe
Ev bû dehcar dixwazî

Apo,heqê textên çi ?
-Ê tabûta bavê min ?
Belê deynê bavê te
Divê niha bidî min,

Salar şebeşek kirî
Dema taştê hate mal
Zarok li ser bûne kom
Lê mexabin derket kal

Tevan girtin nanê xwe
Pêre xwarin tev qaşil
Salar,li wan dinêrî
Dilê wî ma tijî kul

Li ser min deyn bûne kom
Ezê çibkim, nîne kar

Ev zarokê çi bixun ?
Heqê mine/Intîhar /

Heta kengî ezê van
Kul û derdan hilênim ?
Vî kufletê hûr û pir
Bi vî halî bibênim ?

Ezê xwe bavêjim çem
Ne gilî û ne gazin
Bere xal û apê min
Deynê xwe tim nexwazin

Hate ser qiraxa çem
Çav li serî fireh bûn
Serî kete gomanan
Hinek hatin,hinek çûn

Paşê hatin bîra wî
Ew gotinên bavê kal
/Gelek hene wekî te/
Rabû bi lez hate mal

Hate riwê diya xwe
Dev li ken û dolovan
Divê deynê ap û xal
Bi carekê bidim wan

Diya pîra kevne jin
Bi awiran lê nerî
Go:-de here,kurê min
Here,Salar,aferîn

Wî zû destê diya xwe
Berdan, hate nav bajêr
Pirsî, yekî dewlemend
Xwedî mal, û gund û zêr

Dî û çû mekteba wî
Silav kir û jêre got:
Ez dixwazim, begê min !
Bême cem te, herim cot

Ewî kalê dewlemend
Berê xwe qet neda wî
Berê xwe wî nedayê
Da ko bixwî keda wî

Destê xwe da ser zengil
Dî ko xortek hate xwar
Go:- vî xortî bişênin
Bere li gund bikî cot

Çend qurûşek dane wî
Bi lez derket, hate mal
Dane destê diya xwe
Go:- ev deynê ap û xal

Çû ser cotê terektor
Şev û ro lê bûne yek
Belê Salar, weke mêr
Karê xwe kir weke şek

Piştî nema dema kar
Kalo îdî berdayê

Dewlemendê mal genî
Mafê wî jî nedayê

Gava derket ji cem wî
Dî ko weke xweye mal
Dîsan li ber dîwaran
Ma betal û ma tiral

Di gel çend hevalên xwe
Ên ko karê wan nema
Piştî şîvê hev girtin
Tevde çûne Sînema

Bextê wan pir sipî bû
Filim, Sewra Oktober
Ew karkerên Sînema
Hemî bûne wek agir

Piştî ko hatin malê
Li hev gerîn weke şêr
Destê xwe wan dane hev
Nû çêkirin benda jêr

Hemî karker bûne yek
Dest pê kirin sergêjî
Salar di nav wan de xweş
Tim gotinan dibêjî

Divê karker bibin yek
Da em bibin bi rûmet
Vê ristikê bigorin
Em jî bibin bi Dewlet

Ev karker û ev cotar
Divê bibin tev heval
Da bişkênin serê van
Dewlemendên, xwedî mal

Geh bi dar û bi lêdan
Geh bi qîr û bi halan
Lê pir neçû, welat tev
Rejîm, kete destê wan

Ji nû hatin guhertin
Kicê wan ê bi qelêr
Ew gemara milê wan
Tev bûe surme û zêr

Bi rastî û paqijî
Ew xebitîn roj û şev
Hefsar xistin destê xwe
Tevda bûne weke hev

Tevda ketin destê wan
Mal û gund û hemî tişt
Welat xweş û ava bû
Ji tevan re bû bihişt

Kesek nema jar û mest
Kesek nema dilbirîn
Ev çil salin li ser hev
Eve doza Ciger-xwîn

# XÊR Û ŞER

Hirmizê xêrxwaz, kinc û bergî sor
Ji rojhilat hat pir leşker li dor
Bê rî û simbêl, tev xort û ciwan
Azadîxwazin, mêr û qareman
Aştî di xwazin, ew naxwazin şer
Divên xweş bijîn hemî ev beşer

Ahremanê dîn, kinc û bergî reş
Digel wî leşker, xwînmij û keleş
Mêrkuj û xwînxwar, talanker û diz
Hawîr di bazin, dijminê Hirmiz
Rû reş û bi rî, seranser qetran
Bê ol û gawir, dijminê Insan

Li hev rast hatin li şaxê Zagros
Her yek bi dest wan, darek Ebanos
Bi Zerre û top, bi tang û tiving
Rapêçayîne herdû ji bo ceng
Yek dawerê xêr, yek dawerê şer
Kirin dibendî hemî ev beşer

Hirmiz, gazî kir:-kuro win kîne ?
Ahremen bakir:-em jî rêwîne
- Win rûreşn tev hemî tevlî hev
Diçin şerê kê ? bo, diçin bi şev ?
- Em keleş û diz, pir xurt û himbiz
Em diçin şerê leşkerê Hirmiz

--Hirmiz ezim,ez Hirmizê nebez
Bêje,çidxwazin, ez diçim bi lez
--Ez dixwazim şer,li her cî û der
Aştî naxwazim,dixwazim lêdan
Ev zerre û çek,çine, li meydan ?

--Xweşe ev cîhan, pir xweşe jiyan
Aştî dixwazim, şer hemî ziyan
Zerre naxwazim, bikevî nav şer
Em wê pêktênin bo xêra beşer

--Hirmizê reben, ezim Ahramen
Ji tîp û estol mişt dikim ev çol
Dema biteqin,ev tang û ev top
Xwîn dê birêjin,li herder û şop
Bumbardûman bin li her cî û şop ev xan û eywan
Cihan dibî tev berbad û talan

--Zanî ez kîme ? Ahramenê diz !
Dawerê xêrim-Hirmizim,Hirmiz
Dixazim cihan tev bibî bihar
Şîn û geş bibin,tev çol û zenar
Derkevin:-gul û çîçek û reyhan
Dilxweş bigerin di bax û bustan

--Ez Ahramenim,mêrkuj û xwînxwar
Dikim zivistan, naxwazim bihar
Berfê dişênim, tim ba û bahoz
Sersal xweştire ji cejn û Nûroz

Serma dibarî, lê ferman ji min
Koledarim ez, kî karî bi min ?

--Karê te dijwar, navê te naxweş
Me xist gerdena te ev toqa reş
Leşkerê min tev, azadî perest
Rist û xweşî min, hemî li dar xist
Havalê min tev karker û cotar
Emê bişkênin serê koledar

--Ezim Ahramen,ezim koledar
Havalê min tev bangêr û maldar
Ev sarûx û top, ev tang û leşker
Di perçiqênin cotkar û karker
Dema ko em şer, dirist bidêrin
Emê serê we tevan bihêrin

--Sarûx li nik me ji ên we çêtir
Top û tangên me ji ên we bêtir
Dema serên xwe, rakin ev birçî
Ji nav tarîxê, navê we diçî
Dema li darxin, ceng û şerkirin
Para we ye bes, kuştin û mirin

--Divê zanîbî, benda Etlesî
Dema şer bibî rê nadî kesî
Emê cihanê bigrin seranser
Çiye rûmeta cotar û karker ?
Dema bibhîzin nav û dengê min

Di perçiqin tev dibin ligê min

--Dema ser hildin, parsek û reben
Di perçiqênin serê Ahramen
Tîp û top û teng, dema bimeşin
Ev bircên bilind, hemî hilweşin
Zencîrê milê me palan şikest
Nema dimênin em jar û sermest

--Dolare, dolar, bi dest me dolar
Emê bikirin karker û cotar
Birçî û tazî, hemî nexoşin
Em wan dikarin, em wan difroşin
Hezar sale wan, dîne bindestî
Çavên wan mane ji me şikestî

--Tifî li dolar, wey riwê te reş
Dolar, koledar, çi navên ne xweş ?
Welatparêzin, em tev hasinker
Îdî natirsin, ji ceng û ji şer
Gernas û xêrxwaz, hemî jin û mêr
Roja biteqî diçin weke Şêr

--Koledarim ez, Ahramenê gor
Min cihan tev girt, bi kotek û zor
Çend hezar salin, ferman dikim ez
Bê tirs û bê pirs, talan dikim ez
Kiye ew kesê ji serê xwe têr
Li ber min rabî, li jor û li jêr

--Hirmizim, hirmiz, hirmizê gernas
Min afirandin, binyad û esas
Herdû çavên te, ezê derînim
Tola hezar sal ji te bistênim
Îdî şiyar bûn, karker û cotar
Serê te dişkê wekî serê Mar

--Dêwê reşim ez çiyan dihêrim
Aşê serê we, ezê bigêrim
Dema serên xwe li ber mi rakin
Emê serê we ji hev bela kin
Kîne ev parsek, kîne ev karker ?
Bi das û çakûç çawa herin şer ?

--Inzar didim te, derkev ji taywan
Derkev ji Urdin, derkev ji Libnan
Emê serê we bi perçiqênin
Ji her cî û der, bi zor derênin
Nema ye îdî, cihê Ahramen
Ha bigere çend pol, bihayê kefen

--Dewlemendim ez, çibkim ez bi mal
Bi mal dikirim, Bayar û Iqbal
Hevalbendê min, maldar û bangêr
Tacan dikirim, ez bi mal û zêr
Li hev kom dikim, dolar û filûs
Ez pê dikirim, pîs û bênamûs

Hirmiz kir qêrîn:-Sarûx ħilda jor
Ahramen tirsî ji leşkerê Sor
Pişta xwe da wan, şikest û revî
Li paş xwe hiştin welat û zevî
Zorkerên Iraq ketin bin destan
Bimrî Ahramen, bijî Kurdistan

## XWENDEGEH

Xwendegah ez çê dizanim
Kanîya jîna minî
Çêlî yê bazê çelengim
Lê tu hêlîna minî

Ez biçûkim çê dizanim
Bê te kes nabî mezin
Wa li nik min pir sirînî
Rengê dayîna minî

Xwendin û zanîn û rutbe
Tev ji dîdara te ne
Ger çi ax û av û berdî
Qesreşêrîna minî

Serbilindî,dewlemendî gewher û neqşên te ne
Ger li gundî wer bilindî,ameda dîna minî

# BİRÊ ... III

## NIVÎSAREK BO YAR

Yara por zerîn,
Çav şîn, rû geş
Dosta xem revîn,
Şêrîn û ken xweş
Lêv şeker, çen gewher
Poz çilak û dêm gul
Bînahîya çavan,
Dermanê dilê kul
Ey Dektora dil û can bi dest
Şahîya dilê evîn perest
Hevala bi rast û ronî
Şevçiraxa dilê bê ronî
Li bexçe rûniştî
Xame min bi dest
Pir mest û bê hest
Gêjim,
Nizanim, çi bêjim
Bê heval û hemdem,
Dîlê destê derd û xem
Li hawîr di nerim
Çavên xwe digerim
Dûr, dûr, digerim
Dikevim sawîra
Dikevim gomana
Wek zana,Wek nezana
Perda gomana, dema hiltênim
Kesî nabênim

Dimênim, dimênim
Wer dimênim, bê hiş û tevger
Jîr û bîrwer
Vê reşbelekê, ji ter dişênim
Ah!?vîn, ah evîn, ah jîn!!...
Jîna ciwanî
Nadim arzanî
Dixwazim bijîm bi hêz û dil xweş
Em hemî mirov dilşad û rû geş
Yara bextyar:
Navê te kete piştî navê min
Raboriyên me tên ber çavê min
Ji xwendegehê dema diçûm der
Em diçûn yek ser
Otmobîlê em direvandin xweş
Li deşt û çiyan bi ken û rû geş
Dûr diketin em
Ji hilma bajêr
Di bîr me nedhat
Ne mal û ne zêr
Diçûn nav çiya
Nav gul û giya
Li nav newala
Li nav dara
Dev bi ken, xwînşêrîn
Deng,
Awaz
Zimîn,
Şêrîn,

Çûk , çivîk
Bi çirîk , çirîk
Qebqeba kew , çilpîna kovî
Pêl rû geş , dil xweş
Tev dar û devî
Çiya hemî şîn
Sir û baweşîn
Her kes bi rojê
Dixwazin bijîn
Ah , lê çi jîn ?
Jînek tevayî
Dostî , birayî
Hemî kes dilşad
Serbest û azad
Bigerin
Binerin , em hemî serbest
Hatin û hebûn
Bi hûnan û rist
Tekûz û dirist
Rûdiniştin em , ber av û daran
Lat û zinaran
Wan kevne waran
Diketin gomana
Bilûra şivana
Hewrên gomana
Wek tavana
Ji ser hişê me didan alî
Dibû ronahî
Xweş dibû sayî

Mej hev di pirsî:
Ê kêne ev war?
Çawa çêbûne ev lat û zinar?
Her weha bi vî awî ta dibû êvar

Ajo ez û tu , bê tirs , eşkera
Diçûn , dihatin , wek xuşk û bira
Di nav me de bûn
Dan û sitandin
Nedhatin gotin
Hemî axavtin
Ji kê bi tirsin?
Ne diz , ne pêwan
Daxwazên me tev veşartî diman
Em herdû heval
Herdû dilovan
Dil bi dil , can bi can
Em dihatin mal
Bîrewer , hişyar
Çaxa bû benga me
Heval û hemyar
Dîsa diketin nav hilma bajêr
Tev qulebazî , fen û fût û fêr
Dixwazin hemî ji hev bidizin
Ji rikê hev re hemî dibezin
Hevdî dixapênên
Pişt perde dimênin
Dixwazin bidizin
Lê em nebênin

Çiqanûn ?
Çirist ?
Dirist, nadirist
Tev polperestî
Pêkarin, xurtî
Qelsî, bindestî
Hemî ne raste bi carek derew
Li pêş hev diçin weke roj û şew
Li ber çavên me dereng dihat în
Dinav dilên me tijî bû evîn
Xwezî kom dibûn
Hêvî dicivîn
Em dighandin hev
Evîn û hebûn
Dîsa dibûn cot
Pêkve em diçûn
Divên tenhabin
Li nav çiya bin
Serbest û azad
Rûgeş û dilşad
Ah ...
Ev xweşî û jîn ? !
Neghane dawî
Jîna me tev çû
Her bivî awî
Ka ew ciwanî ?
Ka ew xortanî ?
Ka ew çax û beng ?
Nema dibênin

Li me bû dereng
Îro ez tenê dil jar û bê deng
Bê heval û yar
Bê dost û hevdem
Li min kom bûne
Kul û derd û xem
Li hev rashatin, em wer dûrxistin
Zencîra dûrî destên me bestin
Armanc kete dest
Vî dêwê zergeş
Rê tarî, şaxur, bi tirs û nexweş
Ez ne serbestim
Dîlim, bin destim
Dil jar û bê yar
Gêjim, sermestim
Li gulê dinêrim
Tu tê bîra min
Li sêvê dinerim tu tê bîra min
Serwê di hejênim
Wekû bejna te
Şengê miz didim wekû porê te
Ristan dibêjim
Ronika dirêjim
Çi dixwazim ?
Ranazim
Divêm azadî
Xweşî, dilşadî
Navên bindarî
Nalî û zarî

Divêm jîndarî
Li her warî
Dilê xwe megre ji min ne dûrî
Lê hêvîdarim, di min biborî
Di nav dilê min cîkî pir bilind
Paytextê te ye ey hevala rind
Te wergirtiye
Bergê ciwanî
Daye serê xwe
Taca keyanî
Li ser textê dil
Şahî bi rûmet
Jîna ciwanî ji bo te dewlet
Dilê min tijî bawerî û vîn
Hişê min dûrbîn
Pir hêz û bi tîn
Xurt û bilinde
Armanc û daxwaz
Dixwazim, bi naz
Bi saz û awaz
Jîna xweya xweş
Her bi vî awî
Bighênim dawî
Ez jînperestim
Dixwazim hebûn
Peyda bûne em
Ba bimrî nebûn
Hewrên kul û xem
Xwe bidin alî

Reşî nemênî lê li heralî
Xweş bibî cihan
Têde bijîn em
Bê derd û bê jan
Bê setem û xem
Gerden azadî armanca me bes
Lê ne tenê em, bijîn hemî kes
Cihan pir xweşe
Sorgul di navê
Li ser te firmêsk, xunaf û avî
Pertava roja zer û zêrînî
Xarê ji ser te bizor hiltînî
Ah, çend şirînî ?
Ah, çend şirînî ?
Jîndar ezim lê
Tenê tû jînî

## AGIRÊ EVÎNDARÎ

Şev tev çûye îdî ma tû hew tê lo
Ez ranazim,kengî bê tem xew tê lo
Xanî bûye zindan tê de ranazim
Ta sipîdê qîr û nal û tew tê lo

Tej min dil bir carek mij ter nego na,
Te rû kul kir carek mij ter nego na
Ma ji bo çi,îro tuj min xeyîd ye ?
Tij min çidkir,carek mij ter nego na

Ay dil,ay dil,ma kes nîne mîna wî ?
Bo çi her dem wer dil xwazê dîna wî ?
Ahî dema destê wîl bin serê min !!!
Bi min xweş tê gelek hilm û bîna wî

Tenê hiştim ay dil îşev çima çû ?
Wî ez kuştim,ay dil îşev çima çû ?
Rabe peykev ay dil zû wî werîne
Tev biriştim ay dil îşev çima çû ?

# BAV ECEMÊ

Bi xwedêkî were ey pûtperes û bav Ecemê
Bes bi barîne, li min, sir û serm û seqemê
Çi dema ber bidî, dilşad û serefrazî dibim
Lê ku pişta xwe bidî, dil di kevî ber elemê
Dîtinek, dêm û riwan, xweş dikî van derd û xeman
Dûrîya çavên belek,dil dixî ber derd û xemê
Setema ko te li min kir, qe bi dev nayê jimar
Me ne sûc û ne guneh, wer me didî ber setemê
Bi du lêvan şekerî, ez te ji dîn dûrî kirim
Me bi wan dêmê gulî ser bire ber wê senemê
Me ji wan birhê şikestî ber û sarûx di rijin
Kuştîyê çavên te nayên ne jimar û qelemê
Awirek çavên belek,dil dixî ber pêt û birûskan
Agirê derdê dilê min di helînit qeşemê
Çi dibî ko tu bi borî li me van bê gunehan ?
Ta bi kengî, di biwêrî, me di vê keyf û kemê ?
Sedê bîsta ye dixwazî bikujî bê gunehan
Kengî Asik dikujî Şêra divê çax û demê ?

# BEGLER Û MÎRÊ

Tîran di reşênî tu li dil begler û mîrê
Dil gazî û nalîne ji ber gezme û tîrê

Sîh sale,di benda te de ez girtî û dîlim
Guh nadî gilî padîşeh û mîr û wezîrê

Carek tu li ber camê temaşe bike birhan
Belkî tu bi saya biriwan min bixî bîrê

Rojek ji serayê were zindanê me dîlan
Pirsek ji te,xanim,vedikî bendik û nîrê

Ferman bike carek ku li dergahê te rûnim
Da secde bibin kengî tu bê ey şeh û jîrê

Seydayê Cigerxwîne ji derdê te di nalî
Daxwaz çiye,zanî,me ji vê gazî û qîrê ?

## BÊ KESIM

Were xanim bi qurbanim bizane bê kes û kûsim
Bere xêra tebî carek were çavê te ramûsim

Çima herdem di tirsî lê, çima carek ne pirsî lê
Ejî wek te mirov û dilbijokim lê ne kabûsim

Eger wek qumriya rindî kevok û nazika gundî
Bizane ez di vê rê de wekî Xesro û Kawûsim

Çiqa Mûsa li ser te gewherên lala bikî ristik
Li rista min binêre da bizanî ez çi qamûsim

Kirim wek ta wisa jar û wesa hiştim bese dilber
Di kinca Laleşa işqê bizane pîrê tawûsim

Eger xanim bira rastî dixwazî min, bela rûs bî
Di larûsa evînê de Cigerxwînim bi namûsim

# BIHARA DIL

Bi serbestî were perda xwe bavê
Wekû hevdî ne em ḥerdû bi bavê

Were carek herin bostan û baxan
Bidêrin guh li dengê ba û avê

Di jînê de ji hevre em gihane
Eger téde nebî carek me navê

Du lêvên te ji ber xwîna me sorin
Ji xwêdana teye şûşa gulavê

Di dîdara tede tême pişaftin
Wekî murxim di nêva bend û davê

Di pingava evînê de di nalim
Ji te pêve me naghênî peravê

Nexoşim ez ji dektoran me pirsî
Dibên derman ji bo te germeavê

Belê lêvên tene dermanê derdim
Bi te şîn tê bihara dil di gavê

Wekî bazim were ser bazikê min
Te bavêjim bihişta nêv giravê

Bere kes me nebênî,dûrî dest bin
Bere dijmin ji dexsa ber xwe bavê

Te rû dane û biskên reş ji davin
Ko dil çû daneyê zû girtî davê

Di bênim ber derê bavê te dîlan
Dibên rê bidne Bûk û bidne Zavê

Xwezî roja bibin em bûk û zava
Li ser çavên me bê şêrîn ziravê

Ji lêvên erxewanî ez binoşim
Di jînê de ezê çibkim ji avê

Ji bustanê te bigrim ez du sêvan
Ji wan pêve di jînê de me navê

Perî navêm,ko lêvsorek dixwazim
Bihişt navêm bi daxwaz û bi lavê

Were hevdî bikin hembêz bi dilşad
Berî ko em bibin nêçîr di ravê

Te rû roje di sojî dil di tirsim
Ko seyda dil bidî ber ar û tavê

## BÊ MALÊ

Nazik û gewr û şirîn û rind û xweş bala minî
Çîçek û nesrîn û sorgul û zenbeq lala minî
Nêrgiza baxê dilî yan sinbilî yan yasemîn
Dêm bi xal û rû hilal û naz û mindala minî
Lêv şirîn û hinguvîn û şerbeta jîn û evîn
Dariwê derd û birîn û xem,li ber pala minî
Şox û şeng û pir qeşengî ketme cengê ez li ser
Pir delal û çav xezal û bawer û bala minî
Pût û latê rojhilatê min xelat dayê ji dil
Nazenîn û pir şirîn û aydek û ala minî
Wek Feratim bê tebatim pêl li ser pêlan diçim
Rengê Xabûr kûr di nalim jêderê nala minî
Roj û şev herdem di bazim bê te min qet nayê xew
Ger bi bazim wer bi gazim her tu havala minî
Ristevanê vê cihanê her yekî yarek heye
Lê bi wan dêmê gulî tim rist û galgala minî
Herkesek pûtek heye tim ser li ber datênî ew
Lê bi wan çavên belek herdem tu bêmala minî
Her evîndarek ku tê baxê evînê gul bi dest
Lê di baxê naz û rindî her tu halhala minî
Min bi pîrê fal vekir herdem bi navê tey şirîn
Sûnd dixum bawer bike daxwaz ji wê fala minî
Vaye sersal hat û her kes dil bişadî bezm û ger
Lê tu herdem tê xeyalê cejn û sersala minî
Ez di cejna dijmina wek Rustem û Salarê kurd
Kengî meydan teng dibî tim pişt û mertala minî
Min di sîngê rengê sorgul sed birîn derbûn bi xwîn
Sed sipas îro me dî dîsa li ber pala minî

# BIRONIKA RÊ XWEŞ DIKIM

Min di xwest ko ez bibosim pê û destan wê nexwest
Ez di berde ketme xwarê hestîyê piştê şikest

Min bi ava ronikê çavên xwe rê xweş kir li ber
Da ku toza ax û axan ranebî ser pê û dest

Min serî danî liber da dev bi pê pîroz bikim
Lew ji nişka dilberê zû qûndere danî ji qest

Ev dilê jar û nexweş xweş kir bi destên xwey sipî
Wek mesîhî min li hember kember û zenare best

Dil li min xweş kir dema dilber biken rû daye min
Lê li min rabû qiyamet kengî şêrîn rû guhest

Min dixwest biçme tewafa Laleşê dêmê gulî
Reşkezî marên di reş çember li hawîr rû vebest

Dest me birne gerdenê ejder li serwê têne xwar
Min dixwest ko rû bibosim ejderê reş dil vegest

Wê bi lêvê xwey şirîn xwend ayeta Lateqrebû
Ez di berde ketme xwarê dil birîn û jar û mest

Şerbeta lêva bi min da dev biken go wey reben
Rabe ser xwe zû bi noşe ,min ji dilber ev di xwest

## BIHARA DIL

Ji ber rojê tu rake xoş du biskên tar û mişkîne
Kevanê ebriwê reştûj bi ser dêman de meşkîne

Bihara dil bike şîn bê
Bere dil serxweş û dîn bê
Bi/A/ şekir ji lêvên sor
        Ji Seyda re tu bişkîne
Mebê /NA/ na, ji nalan tê
Ji goşê nûn û dalan tê
Ji wan çavê xezalan tê
        Ji zulfên ser dupişkîne
Ji dil her ah û nalînim
Ji tîrê birhê dalînim
Hewar û qîr û nalînim
        Ji wan dêmên nivişkî ne
Bihara dil niha zer bû
Di ber ba çû kelemper bû
Evîna dil jinû der bû
        Ji herdû çavê rişkî ne

## CIWANÎYÊ ÇI KARE ?

Delale nû gihaye
Li ser min pir biha ye
Evîn her dem weha ye
        Ciwanîyê çi kare ?
Divê dil tim bi kil bî
Çavê reş tim bi kul bî
Rûdem ji rengê gul bî
        Em dûr kevin ji wara
Şêrîn û gewr û nazin
Ji dil em hev dixwazin
Li nav daran di bazin
        Sî daye ser zinara
Dengê avê bilûre
Ba, li pelan di bûre
Em guh didin tilûre
        Bilbil qîr û hewara
Êvare çaxê xewê
Kew gihaye mêkewê
Ketme ber singa ewê
        Cihan xweşe bihare
Ez gihamê ji rêva
Dest bezîne du sêva
Lêv gihane ser lêva
        Wijdan gelek şiyare
Tîna dilê me germe
Rû mazeye li ber me
Şev perdeye li ser me

Bextê me nobedare
Bi devken û bi yarî
Şekir ji dev di barî
Pir dane min dîyarî
Tiştek nehişt ji para
Bextê me pir sipî bû
Dost bi min re kedî bû
Bê şerm û bê fedî bû
Pir pak û payedara



## CEJNE

Cejne îro dûrî destim lê dilim naxweş çiye ?
Ev çihan yekser ji min re bê te ey mehweş çiye

Boçî her kes rû geş û dilşad û azad lê tenê
Ez ji vê dilşadîyê bê par û doz û beş çiye

Ger sipîdê bête nik min ew şirîna çav belek
Ew ji lêvan xweş bidîmin maçekê oxweş çiye

Herkesî dostek hebî lê min çira yarek nebî
Tev di çin quds û hicazê ger biçim laleş çiye

Ez giham ava hayatê şadîmanî ez di jîm
Lê di dil de agirek ev agir û ateş çiye

Min gula cûrî bi desta canişînê dilberim
Dê çikim xar û xesan sed tolik û kelbeş çiye

Ger ne bilbil dilbijokê sorgula rûgeş bitin
Rûmeta wî bilbilî bê sorgula rûgeş çiye

Bextê tarî key sipî bî ma gelo hêvîheye
Carekê hembêz bikim lê çar û pênc û şeş çiye

Wey li ser çavê me bê ew lêv şirîn û ken şeker
Lê nizanim ev giranî lenc û lar û meş çiye

Ey şapala dil li balanazik û gerden belor

Ger tu canî ez leşim lê can tenê bê leş çiye

Carekê çavên di reş dîn û ji dîn ez dûr kirim
Min didil tîr bê jimarin tev ji çavên reş çiye

Min ji pîrê berderê meyxane pirsî ez benî
Her dema dilber di bênim ez dibim bêweş çiye

Badeya şêrîn bi min da go binoşe sede dil
Da bizanî ka meya pir sade û bê xeş çiye

Min ji dest wî bade noşî toşîbê hoşî di bûm
Çûme govend û sema ma lewleb û kerkeş çiye

Navê dilber tim li ser lêva bû wek navê Xwedê
Rast û çep têm û diçim sed bekur û bareş çiye

Ez di vê rê de biriştim ciger û dil bûne xwîn
Min ji nû zanî evîna serxweş û bê heş çiye

## CIBRÎLÊ EVÎNÊ

Peyxam ji şirînê sibehê ger ji mera bê
Cibrîlê evînê ji mera pifkî şebabê
Lebxunce şerabê ko ji lêvê bi werêvê
Cana ji lebaleb ji dî bi ribabê
Zanî me ji sazê ko bi nazî çi di xwazî
Sed ayetê esra me di nêv saz û şerabê
Carek bi mera bê di şerabê bibî hexwer
Xabûrê evînê bigihê Dicle û Zabê
Destê xwe bi destê me bidî biçne semayê
Da bên û bi rist bi hejênin mil û kabê
Biskan vereşîne bere sinbil bi sema bên
Gulyan vereşîne bere şebnem li gula bê
Sermaye-ê jîna me ne azadî û şadî
Dil şa bike carek bere her kes bi me şabê
Dostî ne bi dil hişkî ye bes dûr keve dilber
Qasek were ba min bere ferman li me rabê
Çend dûr bikevî ez ji tere her wekû sîber
Cana bi xwe zanî tiwî can,ronî û tabê
Ne dikarim bigerim ne dişim bê te bijîm ez
Xew bê te me nayê ji me axîn qe venabê
Gunhê me çiye ko me didî ber setemê wer
Wer dil li mexweşke tu Xwedê beske şitabê
Seyda ko şeraba lebê lalê te di xwazî
Beyhûde şerabê kî dixwazî ji şerabê ?
Tîra te li dil daye ciger tev herişandî
Maçek bide carek li birîna me şefa bê......

## CAREK WERE BA MIN

Dev û lêvên şekerî bes bike inwanê xwezî
Çi dibî ko ji serayê carekê bê bi dizî ?

Sîng,sîng û lebaleb,bi hev dil xoşî bibin
Bêne govend û semayê,me li dêm bisk û kezî

Me ji bustanê evîna te gulek taze divê
Berî ko ba bê setem wê bi weşînî,bi rizî

Dewleta dîdar û dînê,her demê nayête dest
Hew te dî dîwarê jîna me hejî û derizî

Ev ciwanî û delalî nebî beyhûde herin tev
Tarîx bi xwe guh nadî kisî,xweş di bezî

Em herdû evîndar,ji hebûnê çi di xwazin ?
Carek were ba min bide ber bayê sebayê temezî

Seydayê Cigerxwîn,Rustemê meydan bî çi karî ?
Dêwê sipî ye çerxê felek,destî bi gurz daberizî

## ÇEP Û RAST

Sersale li mêrgê bine tev ordek û qazin
Çep û rast
Xemlîne zer û sor û sipî tirhik û katin
Çep û rast
Gazinde dikin bejnê şivînî ji zenar
û Kemerên zêr
Zendên ji xeyaran,dibirin, quflik û bazin
Çep û rast
Bin bar dikirin qulpê guhara guhê yara
bi cewahir
Gerden ji dir û gewher û rista ye di gazin
Çep û rast
Gul û beybûn di kenin xweşçîçek û sinbil bi
sema tên
Awazê çem û ba û pêlan derbik û sazin
Çep û rast
Gazî me dikî zirne werin, reqs û semayê
bi gerê nin
Nazdar û perîzade li wê navê di bazin
Çep û rast
Asik bi defê re di gerin, eprî û boşî
xeyîdî ne
Her yek di meqamê xwe de manendî terazin
Çep û rast
Bê şaşî û çewtî di bezin, bê hiş û mestane
di lîzin

Peyxamê ji govend û def û sazê di xwazin
Çep û rast
Awir ji kevanê biriwan dirijîn, pêt û
birûskin
Em badexwer û serxweş û nêv penceyê bazin
Çep û rast
Deng û reng û pêt û ronî ko di jînê de
xuyane
Ew têk de seraser ji mera nukte û razin
Çep û rast
Badeya vê qedehê, da bimijin bê xem û
pêjin
Her çî ko me gotî, neko wek qerf û tinazin
Çep û rast

## DINYA LI HEVHATINE

Ne dirêje,ne kine,gewr û rinde,a mine
Pîrê mexan dibêjî: Win ji hev re hatine
Yar di hembêza mine
Dinya li hev hatine
Sazên me avên çema
Bisk û kezî tên sema
Îdî tiştek kêm nema
Ev dinya tev a mine
Li nav daran di gerin,em xweş li wan di nerin
Bê gotin û bihîstin,xuya lal û kerin
Dinya li hevhatine
Yar di hembêza mine
Sazên me avên çema
Bisk û kezî tên sema
Îdî tiştek kêm nema
Ev dinya tev a mine
Yarê ez kirim hembêz û lêv lêvan di mijin
Ji xwezî û evînê, pelê daran di hejin
Dinya li hevhatine
Yar di hembêza mine
Sazên me avên çema
Bisk û kezî tên sema
Îdî tiştek kêm nema
Ev dinya tev a mine
Pir xwenda ye markisî, poz bilinde Çirkesî
Fistan lê ye etlesî,bala xwe nadî kesî
Dinya li hev hatine

Yar di hembêza mine
Sazên me avên çema
Bisk û kezî tên sema
Îdî tiştek kêm nema
Ev dinya tev a mine
Li ser ciwên avê ne, di nav sî û tavê ne
Dest bi destin,diçin,tên weke bûk û zavê ne
Dinya lihevhatine
Yar di hembêza mine
Sazên me avên çema
Bisk û kezî tên sema
Îdî tiştek kêm nema
Ev dinya tev a mine
Em sorgulan didin hev herdû dilan didin hev
Di gerin û di nerin bi ser me de hatî şev
Dinya lihevhatine
Yar di hembêza mine
Sazên me avên çema
Bisk û kezî tên sema
Îdî tiştek kêm nema
Ev dinya tev a mine
Çi dibêjî dibhîzim çavên reş radimîsim
Geh li ser û geh li bin bi du sêvan di lîzim
Dinya lihevhatine
Yar di hembêza mine
Sazên me avên çema
Bisk û kezî tên sema
Îdî tiştek kêm nema
Ev dinya tev a mine....

## DÊMAFÎTAB

Îro tenê min dilberek dî,rûperî,dêmafîtab
Rûniştibû bircabelek,biskan weşand misk û gulab

Biskên direş bînenberin wan şer digel xarên qerin
Zulfan bi ser de kerkerin,Ebrû kevan,awir nişab

Ew awirên çavên direş berdane dil wê şest û şeş
Tîr tên ji çavên reş bi weş,na, ez çi zanim,bêjimar

Nayên hisab,nayên jimar,ew awirên çavên xumar
Min dil ji ber qêrîn û zar,nalîne, bê çeng û ribab

Nalîne dil bê çeng û ney pir lê kişandin dax û key
Pirsa dilê min nakî hey,bê mirwetê,wey malxerab

Nakî ji min pirsa dile,ma qey nizanî dil kule ?
Dil bilbile can da gule,gazin çine,lewm û itab ?

Ey dil çira lewma bikî ? dîlê keçî lewma dikî
Tiştê te kir lo,ma dikî ? dîlê key û Afrasiyab ?

Pêsed key û sed Xesriwan wan daye can dêm û riwan
Kuştin bi remza ebriwan,sed şah û sed şeyx û şibab

Sed şeyx û mîr û beglerin,yekser di benda dilberin
Kesra û Xan û Qeyserin,ew dane ber zehr û ezab

Ger çi di benda dilberim,dîsa şukur,mîr û serim
Sed aferim sed aferim,tê nik me her şev bê hicab

Her şev ji bircê tête der Cibrîle canê min di ber
Nûrîne axa pê li ser,/ya leytenîkuntû turab/,

Mizgîn bi min Cibrîle da,nûra di dil qendîle da
Min can bi dest Izrîle da,çerxê li dil kir Inqîlab

Ez can bi sed/leyta/didim dimrî Cigerxwîn ta didim
Pîrim wekî xorta didim,îdî bese/Feslilxîtab/.

# DINYA PÊLÊ EVÎNIM

Cana, xwe derîne tu ji pişta çeperê
Perdê tu hilîne ku li min roj bi derê
Şevreş bike ronî, tu bi loks û fenerê
Maçek ji du lêvan bide, ey lêv şekerê
Ewe dermanê birîn û kul û derd û kederê

Ronakê dilim, dawere vê jîn û evînê
Carek tu bizane sebebê nal û girînê
Sozek bide min ko ji mera bête civînê
Bi nedînê dikujî min, vedijênî me bi dînê
Maçek ji du lêvên te ye dermanê birînê

Ey hor û perîzade, şepal, nazik û rindê
Wey xesrêwê rindan, û şehê bale bilindê
Ma qey tu nizanî, şewitîm, ez wekî findê
Sed bendik û zencîr te girêdane li zendê
Ta kengî bihêlî me di vê davik û bendê ?

Carek tu were xweş veke van bendik û dava
Destim bi hejîne, û li dil awirê çava
Tu bi lêvên şekerî min bide ber pirs û silava
Van Ah û kulan derbixe carek ji hinava
Jîna me nema ye, li me roj va çiwe ava

Heta bi sipîdê me li ser hev nalî û gazin
Ma qey tú nizanî, ji te ka em çi dixwazin ?
Ahan vedirêsin, bi şevan dev wekî sazin
Sed tîre di dil de me ji birhên te di bazin
Ronik me ji çavan, di rijin, dê çilo razin ?

Wer da ku bi noşim, ji leban şîr û şerabê
Zaza ji mera lê bidî aheng û ribabê
Heta ku sipîde biderê, bayê seba bê
Jîna me li ser destê perî, çengê xurabê
Keştî me şikest, mane di nêv pêl û ibabê

## DIL XERAC

Dilber sipîdê hate xwar berdaye ser zilfên xwe tac
Her kes serî datênî ber şaha di xwazî dil xerac

Kesra û şah û Qeyserê serdar û Salar û serê
Kuştim bi tîr û xencerê min can û dil danîn di bac

Min mal û can danîne ber wê nazika zêrîn kemer
Avête dil tîr û teber kengî li dil tên sed îlac

Kevan kişande ber bi mil berdaye dil tîra qizil
Barîn li dil sed jan û kul min sîng ji tîran bû kerac

Tîr têne dil her roj û şev derdan li dil ser dane hev
Carek bide min lêv û dev da xweş bibin zewq û mîzac

Carek bi wan lêvên gulî merhem bide ber vî dilî
Ez dê çikim gaz û gilî rabû qiyamet,bû icac

Dinya li ber min tarîye her kes ji derdan zarîye
Ev reng evîn xemxwarî ye lê ko nebî jîn bê rewac

Ev jîn û ev rist û hebûn kengî li wan ev reng vebûn
Çawa dihatin wer di çûn her tişt dixwazî izdiwac

Istêr li ezman darijîn serwîn di baxan rahejîn
Ta key diçî ev renge jîn wek şevreşa tarî û dac

## DI XWAZÎ DIL BI SOJÎ

Ji rengê sihrê harûtî te reşçavê xwe kilda ye
Kevanê ebriwê reştûz bi ser xala de hilda ye

Di nêva dil de rûniştî bi şîranî bi şahanî
Gelo raste te fermana şewata dil ji dil da ye ?

Bi qurbana te bim mîra mekuj wer dil bi şemşîra
Ji birhên fitne engêzî li dil tîra qizil da ye

Bi şîranî bi şahanî me çil salî didil danî
Dikî gazin ji bona çi di nêv cergê bi kul da ye ?

Bese xwenda û rêzanê veger carek ji fermanê
Te dil danî di zindanê derî girt û qifil da ye

Li dil xeşmê meke mîra meke armanc li ber tîra
Girêdayî bi zincîra di pê û dest û mil da ye

Dilê xemgîn birîndare bi qîr û nal û haware
Belê dermanê derdê dil di wan lêvên bi gul da ye

Di tirsim ez bibêjim lê dilê xanim nexweş bî pê
Meraqa maçekê seyda mexeyde hêj di dil da ye

## DAWIYA PEYALÊ

Min dî sipîdê xemilî
Kesk û zer û sor û gulî
Sîngê ji zêran kir gilî
Hatin sema bisk û gulî
Agir te berda vî dilî
Carek xwe berde vî milî
Hewran ji ber rojê hilî
Rûne di nêva pencerê
Kixme li wê bejna xwe ke
Carek girêbendan veke
Hûrhûr li ser dêman şeke
Miskê liwan biskê xwe ke
Zulfan li jorê perçeke
Wer guh li xemxwarê xwe ke
Pirsa birîndarê xwe ke
Kuştim bi derba xencerê
Carek wekî axa bike
Seyran li nêv baxa bike
Seyra gul û zaxa bike
Şebnem li ser şaxa bike
Melhem li van daxa bike
Min dil wekî saxa bike
Ey padîşah û beglerê
Meyzake sêv û sorgula
Guhdêre dengê bilbila
Gulyan tu berde ser mila
Biskan bike wek filfila

Xoşke birînê dil kula
Derman bike derdê dila
Dîn ke bi dêman aqila
        Şêrîn û gewr û dilberê
Bejna bilind bostane ew
Xweş kixme û fistan ew
Wek baxê Kurdistane ew
Lê şêr li ber westane ew
Destên sipî hostane ew
Gewher di nêv ristane ew
Bisk tên sema mestane ew
        Kengî ji pişt perdê derê ?
Fistan li bejnê gulgulî
Mîtan bi ser de mûsilî
Carek xwe berde vî milî
Biskan ji ser dêman hilî
Bêne sema bisk û gulî
Maçek ji wan lêvên gulî
Dermanê derdê vî dilî
        Ey nazikê lêv şekerê
Şeker kenê lêv hinguvê
Şerbet di nêv lêv û devê
Rû kehreba nîvê şevê
Sor û sipî tevlihevê
Gerden xezala bêrevê
Bê û di nav destan kevê
Seyda ji te tiştek divê
        Jêre bi dil şadî werê
Bîne bi destê nerm û ter

Wê mersefa du sêv li ser
Sêvên serî sor gewr û zer
Pêşkêş bike jêre tu wer
Lêvan tu pêre deyne ber
Rûne li cem zûzû tu mer
Jêre veke pişt û kemer
        Mêwa ciwan û nûberê
Jêre veke xweş paxilê
Sêvin di nêva paşilê
Rûdêm ji rengê sorgulê
Biskan ji hawîr wek filê
Lêv melhema derdê dilê
Carek were pir aqilê
Perdê ji ber dêma hilê
        Ey lêv şeker dêm gewherê
Ey can were da roj û şev
Maçan ji lêvan bidne hev
Dîsa di ber min de vekev
Da ez bibosim lêv û dev
Talan bikim bejna te tev
Rabî qiyamet nîne rev
Karê keç û xortaye ev
        Pîr bûme li dil wek berê
Pêta evîn û dilbijî
Min dil ji wê herdem tijî
Agir bi serde lê rijî
Min dil di nêv agir pijî
Ma ê di vê rewşê bijî
Jêre divên eql û mejî

Ava feratê nakujî
Pêtî gihane cegerê
Agir gihaye cerg û nav
Pirqîn di dil de sed girav
Sotane tev birc û delav
Hawîr belav bûn şewq û tav
Hawar û gazî tên perav
Ma dê çikin sed paç û av
Ez dê ji kêkim gaz û lav
Ey keyqubad û Qeyserê
Ey padîşah û xweşriwê
Şêrîn ken û gulgûn riwê
Heyva ziravik ebriwê
Rûdêm ji roj û şev miwê
Pîroz bişahînî li wê
Bejna ji serwa ser ciwê
Min dest dirêj kir zengiwê
Wê padîşah û serwerê
Go: bêje ka seyda çiye ?
Bê xan û mal û bê ciye ?
Bê pare û bê xerciye ?
Min go: ji şahan qenciye
Daxwaz me dêmê gurciye
Lê ên wekû narinciye
Min dil ji wan re birçiye
Heta nedî naçim ji rê
Dilber ji nûve dabezî
Berdan ji bin tacê kezî
Min dil ji nûve mizmizî

Bezîme lêvên qurmizî
Sed maç li ser hev jê dizî
Dijmin ji dûrve kizkizî
Kêşan ji min ah û xwezî
Min dest bi destê rêberê
Min dest bi destê wê şehê
Ebrû ji heyv û rû mehê
Bejna bilind serwa sehê
Biskên di reş berdane hê
Memik li ser singa behê
Ez dûr kirim ji xergehê
Dest kir bi gaz û gilehê
Wê rêberû Peyxemberê .
Go:ma çira tim wa dikî ?
Bê naz û bê perwa dikî
Êrîşî zenguwa dikî
Doza leb û riwa dikî
Gazin ji ebriwa dikî
Zor û setem li wa dikî
Ma raste qey rewa dikî ?
Ka şerm û ew tora berê
Min go:bi qurbanê nebî ?
Dil bigrî carek,tewbe bî
Seyda li ber der kolebî
Her dem li dîwana te bî
Heta sipîdê ranebî
Guhdarê fermana tebî
Herçî tu bêjî her we bî
Ey gewher û taca serê

## DÎSA BIRÎNÊ MIN VEBÛN

Dîsa birînê min vebûn,ahî ji dest daxa evîn
Çil sal di benda dilberim,çavan bi carek xew nedîn
Ê dil di nêva bend û dav
Çawa bibênî xew bi çav
Tîra kevanê mal zirav
        Carek li min dil kir birîn
Tîra kevanê reng şevî
Gazek di nêva dil kevî
Ma kî dikarî rakevî ?
        Her roj û şev nal û girîn
Her roj û şev ahîn û nal
Her çende borîn mah û sal
Carek nehat mizgîn ji bal
        Key Xesriwa kember zerîn
Dijmin ji cem em rakirin
Min çend birîn derman kirin
Pêt û birûsk û agirin
        Hê min ji nûve  axivîn
Gava me dî dilber bi çav
Agir kete cerg û hinav
Pêt û birûsk û şewq û tav
        Lê bisk li dêman xweş çivîn
Dêmên sipî xalên di qer
Bisk û kezî lê bûn çeper
Zulfan bi serde ker bi ker
        Sir tê,li ser dêman livîn
Ba tê li wan biskan didî

Bîna gul û miskê di dî
Lê cam kiras keskê didî
        Têde şaraba hingivîn
Gava li bejnê min nerî
Gur bûn li dil pêt û gurî
Îdî me dev qet nagerî
        Jar û nexweş ketne nivîn
Destê me girt û berneda
Ebrû çivand,awir veda
Go:Kanî ew soza te da ?
        Îdî ciger min bûye xwîn

## DILGÎRÎ

Heçî maçek ji lêvan bir weko sed hec ji laleş bî
Li ser pê ger bidî seyda,ciwan û xort û serxweş bî
Eger carek dixwazî dil,bidî ber xencer û tîran
Dixwazim kuştina dil bes,li ser çavên teyê reş bî
Eger dilgîr evîndar bî,divê ko dil bi dest yar bî
Çiqa xûnxwar û dijwar bî,gerek dilşad û rûgeş bî
Eger dilber wekî gul bî,divê pêtek ji wê hilbî
Dilê dilgîr ji ber kul bî,çiqa şêrîn û mehweş bî
Eger dilber bi nazdarî,bidî min şerbeta lêvan
Ezê fir kim bi hişyarî,meger sade ji ateş bî
Eger mey têde jehrîn bî,ji destê Zîn û Şêrîn bî
Bi min dê xoş û şêrîn bî,li ser dilwê gelek xweş bî
Eger dilber bi lêvên xwey şirîn bêjî:Bimir seyda !
Divê seyda di fermanê,wekî dolab û kerkeş bî

## DIL JI MIN BIR

Kaniya ava heyatê
Şeker û qend û nebatê
Wey li ser çavê me hatê
            Dil ji min bir ahî dil
Rû ji rojê rengê dojê
Dûrîya wê dil di sojê
Min ku dîtî ew bi rojê
            Dil ji min bir ahî dil
Pir şirînê,nazenînê
Kuştime wê ez bi dînê
Dêm ji şana hingivînê
            Dil ji min bir ahî dil
Şox û şengê gul ji rengê
Xûnxwerê,Teymûrî lengê
Dame ber top û tivengê
            Dil ji min bir ahî dil
Wê delalê dil li balê
Serwe bejnê gul ji xalê
Ebriwên wek nûn û dalê
            Dil ji min bir ahî dil
Tê ji banî lê giranî
Boşîya gulreng hilanî
Roj û heyv bûne xuyanî
            Dil ji min bir ahî dil
Dêm sipî xal gewr û sorê
Bûne çember bisk li dorê
Herdû ebrû birne jorê

Dil ji min bir ahî dil
Ebriwên xar û ziravik
Dêm û bisk bûn dav û danik
Lê dema da min silavik
Dil ji min bir ahî dil
Wê silav da min bi çava
Agirek berda hinava
Wey Xwedo mala te ava
Dil ji min bir ahî dil
Dil ji min bir şox û nazê
Wê çikin qêrîn û gazê
Ketme tora borcewazê
Dil ji min bir ahî dil
Ketme tora keyxwedayê
Min dema awir vedayê
Dane dil lerzîn û tayê
Dil ji min bir ahî dil
Lê dema dilber vewesta
Mersefa qehwê bi desta
Sed xwezî min jê bixwesta
Dil ji min bir ahî dil
Çend qedeh şerbet ji lêva
Min vexwarin, lê ji rêva
Dest bezîne herdû sêva
Dil ji min bir ahî dil
Ez ji wê dîdar û dînê
Ketme nêv pêlên evînê
Ma çi daxwaze ji jînê ?
Dil ji min bir ahî dil

Ebriwên wek heyv û dasê
Bejn û bala serw û asê
Da me şerbet wê bi tasê
    Dil ji min bir ahî dil
Bisk li ser dêman belayê
Zilf bi ser de rengê layê
Wek Huseynê Kerbelayê
    Dil ji min bir ahî dil
Bisk bi têlê ser bi zêrê
Lê benî berdane jêrê
Awirên wek şûr û şêrê
    Dil ji min bir ahî dil
Newq ziravê rû ji tavê
Lê gulî wek bend û davê
Dil ji nişka ketye navê
    Dil ji min bir ahî dil
Ser bi zêrê bisk bi têlê
Xanima bajar û êlê
Dame ber tîrêj û pêlê
    Dil ji min bir ahî dil
Keyxwedayê şarezayê
Ez birim birca serayê
Min dema destê xwe dayê
    Dil ji min bir ahî dil
Dest bire ser mil ji rêve
Şerbeta leymûn û sêva
Xanimê da min ji lêva
    Dil ji min bir ahî dil
Lêv şirînê peyve qendê

Rengê berfê sîng û zendê
Min ku dî dil ketye bendê
        Dil ji min bir ahî dil
Por şevê rû rengê rojê
Lê bi çavan dil di sojê
Dûrîya wê rengê dojê
        Dil ji min bir ahî dil
Lêv şirînê hingivînê
Min dema lêv hingivînê
Agir û pêta evînê
        Dil ji min bir ahî dil
Pir çelengê xweş ciwanê
Lêv ji sorê erxewanê
Ebrû wek heyv û kevanê
        Dil ji min bir ahî dil
Ebrû heyvê qende lêvê
Paxila ko sêv di nêvê
Min dema dest birne sêvê
        Dil ji min bir ahî dil
Bejna şaxê nû şivînê
Dêm ji rojê por şevînê
Ew dema hatî civînê
        Dil ji min bir ahî dil
Ew bi şev hate civînê
Zer kirasê bê kitanê
Nazikê wê meş giranê
        Dil ji min bir ahî dil
Nazikê şox û şepalê
Dêm dirê gerden şemalê

Ebriwên wek nûn û dalê
Dil ji min bir ahî dil
Dêm dira ebrû şikestî
Şê gulî berdan bi mestî
Min ji dev maçek di xwestî
Dil ji min bir ahî dil
Kanîya ava Hesarê
Min ji dev şerbet vexwarê
Ez di berde ketme xwarê
Dil ji min bir ahî dil
Serxweşim ez mest û gêjim
Xwîn ji çavan ez dirêjim
Lê nizanim ez çi bêjim
Dil ji min bir ahî dil
Xwîn ji çavan ez di malim
Tim bi qîr û ah û nalim
Dil ciwanim pîr û kalim
Dil ji min bir ahî dil
Pîr û kalim dil ciwane
Her wekû kul tê nema ne
Yar bi lêvên erxewane
Dil ji min bir ahî dil
Yar bi wan destan û zenda
Pêçîyên wek mûm û finda
Şerbeta lêvan bi min da
Dil ji min bir ahî dil
Borcewazê gewr û nazê
Gawirê wê dil berazê
Guh neda qêrîn û gazê

Dil ji min bir ahî dil
Ser bi zêrê,penceşêrê
Agirek berdaye dêrê
Geh bi xencer,geh bi kêrê
Dil ji min bir ahî dil
Kanîya zêr û dirava
Wê bi tîrên herdû çava
Wey Xwedo mala te ava
Dil ji min bir ahî dil
Newq ziravê ser diravê
Her demê bedlakî tavê
Wê bi dêmên rengê tavê
Dil ji min bir ahî dil
Keskesorê,mû bi morê
Êzdîya şengal û torê
Geh bi nazî,geh bi zorê
Dil ji min bir ahî dil
Ronîya çaven te seyda
Ya ji ber bû şêt û şeyda
Carekê çibkî me xeyda
Dil ji min bir ahî dil

## EV ÇI DÎMUQRATÎ YE ?

Delale poz bilinde, çeleng û şemşatî ye
Ji kuştina dilan re pir xurt û jêhatîye
Kezî û bisk û ebrû, şêr û piling û xwînxwar
Bekelorya pêre ye, ji xwendegehê hatî ye
Ramûsanek me jê bir, wê dil ji min bir û çû
Min lê nerî û go:-tew, ev çi dîmuqratî ye ?
Êzîdiya ji torê, zû awirek ji min da
Go:-xuyaye çikûsî, xuyaye boşatî ye
Min go çira te dil bir ? dilovanî nema ye
Go:-karê şox û şenga, talan û berbadî ye
Min go:-te dil ji min bir, qena, maçek bi min de
Bû tiqtiqa kenê wê, go:-ka çibte hatî ye ?
Ji nû bezîme desta, rengê hejar û mesta
Sed maç me bir ji lêvan, şêrîn û nebatî ye
Awir vedan bi ken go:-dîmuqratî wesaye ?
Min go:-belê efendim, qatek bi sed qatî ye
Kenî, go:-raste seyda, sîh sale bû cigerxwîn
Li te pîroze ev maç, te dil jêre patî ye

# EZ BÊ TE NEHÎNIM

Were ey nafizê derdim,mebîn gêj û nesaxim
Maçek ji du lêvên te ye xweş melhemê daxim
Ger pêtî û ronî ji evîna te di dil de
Bawer bike qurban,bixwe ez pêt û çiraxim
Wek bayê sipîdê tu bi nermî were ba min
Da xoş tu bibênî ko li ber pête çi axim
Tirsî bişikî qûndere wer zû bike ferman
Da dest û ser û çav ko li ber pê te ve raxim
Bihna te cihan girtîye ey sorgul û beybûn
Lê zanibe ko ez ji te re katik û şaxim
Xabûrê evîna te di dil de ko di borî
Cana tu dizanî ku bixwe lêv û qiraxim
Ger bê te nehînim,tujî bê min ji çira yî
Wer şarî di jînê,ji te re xanî û taxim.

## EZ DI CENGA DILBERIM

Dilberek min dî sipîdê tîr û keyber têne dil
Ez bezîme pê û destan lê du ejder têne dil
Min dixwest ko pê bibosim da bi bala hilkişim
Rast û çep min dîn du xûnxwer dest bi xencer têne dil
Min di xwest bighême şengê sed çeper min dîn li ber
Agir û pêt û birûsk hawîr ji kember têne dil
Min di xwest carek ji rêve herdû sêvan bixme dest
Lê bi hevre erxewan û lal û gewher têne dil
Zû bezîme gerdenê wek sengerê kohê Sefîn
Rist û zencîr û benî hawîr û yek ser têne dil
Min dixwest ko ez ji lêvan şerbeta şêrîn vexum
Awirên çavên di reş wek tîrê sencer têne dil
Ez giham dêm û riwan lê ebriwan ser dane hev
Bisk û zulf û serkezî wek tîp û leşker têne dil
Min li bejna nazikê dest bûne çember sîng bi sîng
Mujde û ferman ji şahê rengê Qeyser têne dil
Rengê Rustem pehlewanim ez di cenga xweşriwê
Lê ji biskê rengê miskê misk û ember têne dil
Ez giham ava heyatê şerbeta lêvan vexwar
Hê ji nûve biskê tata mest û bê şer têne dil
Leşkerê bisk û kezîhawîr şikestin paşve çûn
Remz û nazê şernexwazê pir ji dilber têne dil
Sed cigerxwîn bûn di vê rê ketne ber pê tînlêv
Min ji lêvên erxewanî şîr û şeker têne dil

## EZ Û YARÊ

Derket ji serayê biriwan gezme reşandin
Ba,hat,li riwan da kezî û bisk vereşandin
Destê xwe bi min da û birin bexçe û baxan
Hilma gulîyan çîçek û sunbil şewişandin
Em çûne derê meykedeyê serxweş û rû geş
Lêvên ji gulan qend û şeker têk felişandin
Gazî kire meyger û şeker jêre şikandin
Çend şûşe ji zêravê ji masa me re şandin
Go:Tê çi vexwî ?
  Min go:ji lêvên te,şerabê
Lebleb me şerab û mey û koktêl vekişandin
Awir ji kevanan li me malik şewitandin
Çavan ji me yekser cerg û dil herişandin
Min dil kire maze û ji lêvan vedixum ez
Çavên me bi tîran kumbedê zerm û kumişandin
Camek ji şeraba dev û camek ji meya rez
Min tev kire koktêl û bi ser hev de xweşandin
Lêvên me li ser lêvê keç û bayê seher hat
Biskên ko ji zêravê bi tev de weşandin
Em serxweş û gêjin,çi bibêjin ne gunehkar
Lêvên me li dêman ayetê/Esra/neqişandin

# EVÎNÊ

Werîn ey meygerê serxweş,şeraba abê rimanî
Bere/Zaza/bi nayê re binalî pir dilovanî
Şerab û dengê nayê xweş,gihan serdil,tijî kul bû
Li ber masê di nalim ez,evîna xemrevîn kanî
Evînê ez hilavêtim,seranser agir û pêtim
Birîn kir dil û şîşa sor,bi destên xo li ser danî
Bi wan destên sipî kuştim,di nav xûnê de ez hiştim
Eger kuştin bi dest wê bî,ezê çibkim ji vî canî
Heçî dil dî bi dest yara,şepal û şox û xûnxwara
Divê,can dî di vê rê de,bi gernasî û mêranî
Evîna nazik û şêrîn,bi lêvan xûn ji dil kêşa
Binêre herdû lêvên sor,wekû lalê belexşanî
Te dil kuştî evîna min,were ey xemrevîna min
Şeraba lêvê narincî,bi noşim ez bi şîranî
Çiman wer hişk û dijwarî,di hember minde xûnxwarî
Nikarî maçekê carek,bidî seyda bi arzanî ?
Tu dilsojî wekî rojî,tiwî jîn û evîna min
Tiwî derdê dilê xemgîn,belê dîsa tu dermanî
Xwezî carek perî bejnê,di roja şahî û cejnê
Bi wan lêvên şirîn bêjî:Were seyda,tu qurbanî
Bese seyda megir lavan,te gerden ketye nêv davan
Şikestî per,wekî biskên perîşanê,perîşanî
Cigerxwîn bu di vê rê de,heta kengî herî pê de
Me mal û can û cerg û dil,ji dest çûne ji nazanî

## EVÎNÊ

Dilo mizgîn li te şabe,ko dektora birînê hat
Derefşa kawe hilgêve,şehînşaha evînê hat
Xem û derdan ji dil bavên,gilî û gazinan navên
Sipas ko em sipî bextin,delal û xem revînê hat
Tu destan deyne ser desta,li pêşber wê tu raweste
Li te pîroz û nûroze,şepal û lêvşirînê hat
Ji lêvên erxewanî xweş,vexwar min şerbeta jînê
Bi carek ez nema dimrim,xwedana vîn û jînê hat
Li min zindan vebû carek ko ronahî bi çavan hat
Li Mem,zindan dibû ronak,ji nişkave ko Zînê hat
Civan dabû ku bê ba min,çi mizgîn bû ku bê da min
Me jîn çûbû li ber ava,li ser soza civînê hat
Bi wê xemlê,bi wê xêzê,me yar danî di hembêzê
Li min zindan dibû gulşen,dema ko porzerînê hat
Hejar û dilnexoşim ez,ji jînê bê qidoşim ez
Dizanim yar serek da min,ji bona pirs û dînê hat
Evîna ber dilê seyda,ji lêvan şerbet û mey da
Perî bû,yan zerî bû,di roja cejn û înê hat

## GULPERÎ

Hey gulperî, gulperî taca liser firqa serî
Min ramûsanek jê xwest, li ser bûye berberî

Gulperî mîr û axa
Sibhê derket nav baxa
Wê dil daye ber daxa
        Gava mil bejnê nerî
Hey Gulperî.....
Newq zirave Ertoşî
Tel serî şar û boşî
Payê li min difroşî
        Kol nav baxan tud gerî
Hey Gulperî.....
Sibeye hilma bê tê
Bîna bînokan jê tê
Li ser enyê civîne
        Bisk û zilf û temberî
Hey Gulperî.....
Çav heşîn, porê zêrîn
Ji dûrve lê dinêrîn
Can û ciger tev kir xwîn
        Ez qurbana wî serî
Hey Gulperî, Gulperî
Taca liser firqa serî
Min ramûsanek jê xwest
        Li ser bûye berberî.....

## GUL LI HAWÎR GEŞ BIN

Kî dizanî ka çira yar xwe xo ji min wer dûr dikî
Awirek çavên belek,dil perçe,perçe,hûr dikî
Her dema tê û li min pirsê dikî dil xweş dibim
Lê ku bê dey nekî,daxa di dil de kûr dikî
Ko bi ken tê bal me de,sorgul li hawîr şîn dibin
Ez dizanim wê çikî,ko ebriwan wek şûr dikî
Xûnxwerê talan kirim, û dane ber pê can û dil
Ev setem,ma kî dikî,wek Xesrew û Teymûr dikî
Dil di nalî ta sibê,hawar,ji destê dilberê
Wer temaşa,guh bidêre,wek ney û tenbûr dikî
Min ji wan çavên belek,sed ah û nalîn roj û şev
Lê evîn pêlan didî,wek Dicle û Xabûr dikî
Ma ji vê xûnxwarîyê,carek kesî karek diye ?
Ez bi qurban,bo çi seyda,dil kul û rencûr dikî ?

## HAT Û ÇÛ

Ez ji xwe agah ne bûm
Ew dil bi destê hat û çû
Wey,li bextê mey bi reş bî
Can bi destê hat û çû
Ez çilo hişyar ne bûm
Çawa nedî min ew perî ?
Herwekû ava tenik bê
Kurt û pistê hat û çû
Wê şevê pêde li dil
Kom bûne,derd û jan û xem
Sur perî dermanê derdê
Min di mestê hat û çû
Ger bidîta bejn û bala
Wê şepala şeng û şox
Sal bi min pîroz dibû
Lê heyv ji ristê hat û çû
Wê civan da bû ku îşev
Bête nik min lê dereng
Ew ji bircê hate xwarê
Şox û mestê hat û çû
Wê ji min can xwestibû
Soz da bû ko bidmê bi şev
Lê sipîdê dil bi destê
Can di xwestê hat û çû
Qûndera kabik bilind bû

Lê çepûne kurt û teng
Her wekî bayê sipîdê
Kurt û pistê hat û çû
Min li şopa wê nerî
Sorgul li hawîr derketin
Min dizanî rû ji rojê
Zendevîstê hat û çû
Hatibû maçek bi min dî
Cejn û sersala me bû
Lê çikim,ew maç ji lêv
û dêm,diristê hat û çû

## HEYVRONÊ

Min ji nêv bostanê jînê her tenê yarek heye
Sohtime wê ez bi dînê,dême ruxsarek heye
Rû ji rojê lêv şirînê
Dêm ji şana hingivînê
Sorgula baxê evînê
        Her gulek xarek heye
Her sibeh ew rûperî tê
Lê di ber min ve diçî,tê
Tîn bi vî laşê mirî tê
        Zanî dil jarek heye
Porzerînê poz bilindê
Nazikê rû gewr û rindê
Sohtime wek mûm û findê
        Min di dil arek heye
Her sipîdê şox û şengê
Por ji zêrê rû ji pengê
Awirên wê wek tivengê
        Şoxe dîdarek heye
Bexçeyê jînê bi carek
Her gulek têde bi xarek
Sed sipas ko min jî yarek
        Gewr û dîdarek heye
Heyveronê hate jorê
Êzdîya şengal û torê
Wê ji min dil bir bi zorê
        Renge bazarek heye
Carekê hate viyalî

Bisk bi paşve dane alî
Wê li min pir kir delalî
Zanî xemxwarek heye
Şerbeta leymûn û sêva
Carekê da min ji lêva
Şeker û hingiv di nêva
Rû de qentarek heye
Wê Ciger xwîn kir bê dînê
Agirek da ser birînê
Ah, ji destê vê evînê
Pête dijwarek heye

## HEYVERONÊ

Evîna heyveronê ez bi ser hevdê guvaştim xweş
Ku nal û ah û avxanim, ji destê şox û şengê tên
Şeva tarî ji biskên reş, li dêman pişkivîn sorgul
Birû xwar û şikestî ne ziravin nû ji yengê tên,
Şeker şêrîne wek lêva memik sêvên xelatî ne
Xem û derdê dilê seyda ji wê awir pilingê tên
Li ber paçê diçî û tê, dilê xemgîn kirî armanc
Sanser têne dil awir, wekû tîr û xedengê tên
Birîndarim ji wan tîran, bi şev pêde dinalim ez
Ji dil tên nêm û xûn û zox, ji ber derba tivingê tên
Bi pêt û agirê dil ez, disojim agirê dojeh
Hemî zor û setemkarî, ji wê mirwet firingê tên
Dil û cergên me tev kuştin, di nav xwînê de em hiştin
Ji tûzê bisk û birhên wê xuyaye ko ji cengê tên
Du birhan dil ji min kuştin, du zulfan xûn di malîştin
Tenê dermanê derdê dil, ji lêvên wê çelengê tên

# HEYVERONÊ

Ji bo ko roj herî ava,li dil carek bibî şevreş
Du biskên wek şeva tarî,bi ser dêman de berda ne
Ji bo heyva zirav carek bibênim ez di cejnê de
Du birhên malzirav û xwar,bi ser xala de ser dane
Ji wan birhên şikestî re,me dil armanc û nîşane
Li ser hev zo bi zo şahê,du sed tîrê qecer dane
Ji wê tîrêj û ronakê du pêtî çûne mêlakê
Şev û rojan dil û cergim,di nav ah û keser da ne
Ji wan pêtan bi êşanim,wekû biskan perîşanim
Sipas,îro evînê pêl,li mêlak û ciger da ne
Ji bo dil heyverona min,tu dermanî sebona min
Vejîn û kuştina seyda,di lêvên wek şeker da ne
Ji bo her kes bi dîdara te dil xweş bî bihara dil
Me pesnê bejn û bala te,bi zêr û hem zeber dane
Ji bo xweş rind û zîba bî,bere biskên te berba bî
Xweşî û malewêranî,di biskên ker bi ker da ne

## HERDÛ ÇAV

Ez li vir dilber li şamê lê di bênim herdû çav
Ayeta:Ez te dixwazim,lê dixwênim herdû çav

Nameyek jêre nivîsî min bi xwîna cerg û dil
Sed selavan jêre îro xweş di şênin herdû çav

Her çiqas dûre ji min,dilber,hezar kîlometir
Lê bi radar,roj û şev,her lê di nêrin herdû çav

Sed kul û derd û elem kom bûn di dil de roj û şev
Van kul û derdan tenê karin derênin herdû çav

Min ji çavên dilberê herdem bi ahin cerg û dil
Tîr û xencer xweş di sîngê tim di çênin herdû çav

Kî dikarî şer bikî,carek digel çavên belek ?
Mêrkuj û talanker û xweş rimkilênin,herdû çav

Gazinan ba kes nekî,ko dil ji ber çavan şikest
Ger çi xurtin herdû ebrû,lê bi tênin herdû çav

Tim di pirsim ez bi çavan,da/Erê,na/zanibim
Bersiva min lê bi/na/herdem dişênin herdû çav

Perdeya bêhêvîyê,armanc ji ber dil girti ye
Lê tenê vê perdeyê karin hilênin,herdû çav

Ah,ji wan çavên belek ! ko min ciger herdem bi xwîn
Ger çi dimrim,lê di dil da her dimênin,herdû çav

## JI SAZÊ DENGÊ ÎLHAMÊ

Ji çavên mest û xûnrêjî me dil tev bû kul û derde
Ji herdû qoziyên çavan tu bes van awiran berde
Heta kengî li eywanê
Bisojim rengê perwanê
Li ser çavên me bê canê
 Were bê ebrî û perde
Hilîn perdê ji ser çava
Ko tav bavêjî wa nava
Me dil bavêjî pertava
 Bibî pîroz li min Erde
Me dil tev agir û pête
Nikarim ez bijîm bê te
Eger ser bibme ber pê te
 Di ola dilgiran ferde
Di vê rê de evîndarim
Perîşanim,birîndarim
Li fermana te guhdarim
 Li cem te melhema derde
Bi wan destên sipî rengî
Tu cama sor û erjengî
Bide destê me bê dengî
 Dizanim xesriwê Kurde
Ji wê xemrê , ji wê camê
Ji sazê dengê îlhamê
Ji Seyda re bi Peyxamê
Didî zanîn herim berde

## KERÊ REŞ KELBEŞ DIVÊ

Min ji vê jînê tenê daxwaz gula sor û geşe
Lê kerê reş birçîye armanc û daxwaz kelbeşe

Tim ji dêmên sorgulî ez rû geş û dilxweş dibim
Ah û nalîn min ji tîr û awirên çavên reşe

Ger di vê cejnê de carek lebşeker maçek bidî
Tême govend û sema,pir şad û cejna min xweşe

Min dema destê xwe dayê,awirek da dilrevayê
Dil kete nêv lerz û tayê,bade xwar û serxweşe

Awirek da min ji çava agirek berda hinava
Dil kete nêv bend û dava,per şikestî,bê heşe

Şox û şengê por şevînê rû geş û lêv hingivînê
Sorgula baxê evînê şîre da min pir xweşe

Ew li hember min vewesta dame şerbet wê bi desta
Ketme ber pê rengê mesta,min di dil de ateşe

Şekirê sersal û cejnê da me wê şêrîne bejnê
Zû ketim ser çok û ejnê,min serî bir Laleşe

Zanibe ko cejn û eyde ez çi bêjim lê mexeyde
Ka were ser çavê seyda xweşke seyran û meşe

## KEYXESRIWA EVÎNÊ

Porê zer û zêrîne tac wek şah û xesriwa dikî
Çîn,çîn,dikî biskên zerîn,êrîşî ser riwa dikî

Qeytaneke sor û zirav bi destê pir naz û sipî
Bi rist û hûnan û tekûz,têkilî zermiwa dikî

Dema ko heyva yekşevî,ji rojava ve derkevî
Qozî şikestî,malzirav,xwe rengê ebriwa dikî

Zaro ye pir diçî û tê,lê hêj nizanî dil çiye
Dimrim heta maçek didî,xwînа dilim ziwa dikî

Miskê li biskê zer dikî,zulfan bi ser de ker dikî
Gulav û ûd û enberê,bi hev re ew li wa dikî

Her qasekê bedlakî ew,werdigrî rengê çîçekan
Geh zer dibî,geh sor dibî,herçî dikî rewa dikî

Wê can û cergê min disot,tîr dan ji mijgan cote,cot
Ev ah û nalîn tên ji dil,ew ne badîhewa dikî

Dema di ber min ve diçî,pozê xwe pir bilind dikî
Lê kengî wê hembêz dikim,xwe rengê mêkewa dikî.

## KELEŞIM EZ

Te ji bustanê evîna xwe gulek dame diyarî
Hingî ko hebim rû geş û dilşad û xweşim ez
Destê me li gerden,û me lêv danîye ser lêv
Ev şev ji felek min dizîye,xweş keleşim ez
Tîr tên ji kevanan,û ji dêm şûr beriqîn xweş
Bê çare di nêv leşkerê rom û hebeşim ez
Şîra ji peyala lebê lala ku me noşî
Ronahî bi dil da,meke bawer nexweşim ez
Kerwanê/Nemayîn/ji me ra zengilî lê da
Da,badeyê firkin,hêj ko li heşim ez
Bê yar û peyal,jîn çiye,ey rêberê nazan
Ev xoşî û şadî,ne ko bê parû beşim ez
Peydayê hebûnim,ku di jînê de di lîzim
Carek yek û do têm,wekû carek duşeşim ez
Her çende bi ristin,li hebûn hatime hûnan
Rojek heye wê bê,ku seraser vereşim ez
Awazê ji sazê dirijin pir xweş û şêrîn
Ez dengê neyê,me,tu mebîne bi leşim ez
Daxwaz me bi destgîrî çiye,rê bi xwe zanim
Perda şevê goman me çirand,xweş di meşim ez

## LÊV ŞIRÎN

Maçek ji wan lêvên şirîn
Derdê dilê min xweş dikî
Nazdarî, û peyv û kenîn
Riwê nexoşan geş dikî

Seyran û geşt û şahî ye
Bajar hemî ronahî ye
Gulçîçek û şînahî ye
        Gava ji bircê meş dikî
Rengê gulê cênîk û zêr
Benî û gerdenî sitêr
Biskan xwe berdan ber bi jêr
        Perde bi serde reş dikî
Mencûl û bisk û reşgulî
Hawîr xwe berdan ser milî
Çarik li bejnê herbilî
        Wek çar û pênc û şeş dikî
Remzek ji wan biskên xelek
Yan awirek çavên belek
Kuştin evîndar pir, gelek
        Ew dil wekî ateş dikî
Rû roje, ger perde ji ser
Rabî û carek bête der
Her kes serî datênî ber
        Ko ebriwan mehweş dikî

Ji kalê heftêsale re
Carek bi lêvan bê:-were
Nizanî ka çawan here
    Wek lewleb û kerkeş dikî
Bêjî:- melê, gawir bibe
Zû ser bi ber agir bibe
Vîna wî hê bêtir dibe
    Ew ser bi ber laleş dikî
Rû roje, perde wek şeve
Herçî di nêv bendê keve
Jîn û mirin pê wek heve
    Îdî ne doza leş dikî
Sîng bexçe ya min jê dizîn
Sêv û gulên sor û bi bîn
Ciger bi lêvan kirye xwîn
    Wek kawîs û kohreş dikî

## LI BER PÊ TE WEKÎ AXIM

Evîna te biraştim ez ji dil tim gazî û axim
Birîndarê du çavên reş ji lewra pir xeman naxum

Ji bo ko sorgula lêvan bi A rûgeş bikî carek
Wekû bilbil şev û rojan li ser kat û pel û şaxim

Tu A dameyne ber nûna du birhan da ńeçin berjor
Li dil daxan dikêşî Na, bi A tim xweş dikî daxim

Wekî rojê disojî dil dixwazî min bidî kuştin
Mirîme ez bi saxîtî eger bukjî timî saxim

Birîndarim were carek bi lêvan dil bike derman
Ku dest û çav û dêm û ser li ber lingê te ez raxim

Du lêvên te gula geş bin gulî wek nêrgiza reş bin
Dev û lêvên te laleş bin bizane bexçe û baxim

Bi pertava evîna xwe wekî rojê kirim ronî
Çirax û rewşena xort û keçê kurda di her çaxim

Te ez rewşen kirim şaha bixwe rojî di nav maha
Meger şahê evînê bim li ber pête wekî axim

## LÊV HINGIVÊ

Gava bixwazî şer bikî birhan zirav û xwar dikî
Biskan ji hawîr berdidî wek ejder û reşmar dikî
Kengî bixwazî xweş bikî,daxê li dil,rû geş dikî
Lê çawa tê û nakenî,derdên li dil dijwar dikî
Bîna gulan tê hindirû,gava sipîdê tête xwar
Dojeh li min dibî bihişt,dema ko min şiyar dikî
Dema ko lêvan maç dikim,hingiv ji lêvan min dizî
Wê ser li ser sînga mine,dil mest û pir bêzar dikî
Biskan ji ser dêman bidî alî wekî rojê dikî
Lê ba,ko carek lê bidî,rojê li min êvar dikî
Em herdû tevde rûdinin,rûgeş dibin,dilxweş dibin
Pîra diya wê tê ji der,min dil reş û rûsar dikî
Kengî li bal min rûdinî,ji nûve ez ciwan dibim
Lê ko ji cem min radibî,dil gazî û hawar dikî
Çawa bi destên xwey sipî,camê didî min rûperî
Zanim çira serwa ciwan,herdem ji min re kar dikî
Da xweş li bejnê meyzekim,rista me lê hûnayî bê
Bi devken û nazdariya,ew min gelek bin bar dikî.

## MEST Û HEYRANIM

Canê civan dabû ko bê ey canê cananim were
Va şev giha nîvê şevê ez can bi qurbanim were

Carek were şah û keyê firkim ji dev cama meyê
Da ez bi nalim wek neyê ey şahê xobanim were

Îro di nalim wek ribab tenha me bê yar û şerab
Tim çav li rême mal xerab bê sebr û sakanim were

Bê sebr û saman û hişim bê cam û bade serxweşim
Ser ta bi pê tev ateşim ey derd û dermanim were

Min dil bi carek derd û kul birînê vebûne rengê gul
Kuştim bi çavên reş bi kil ey pîrê Luqmanim were

Çavan tu carek reş bike dêman wekû gul geş bike
Lê dil bi maçan xweş bike jar û birîndarim were

Jar û birîndar û reben carek were lê dev biken
Dîsa bide min lêv û çen ey serwê bostanim were

Çil sale seyda dil birîn heta ciger jî bûye xwîn
Carek were rewşem bibîn pir mest û heyranim were

# MIZGÎN

Bi min mizgîn gihiştî ko tu hatî
Li ser çavên me hatî pût û latî

Ji wan lêvên şirîn maçek bidî min
Ser û pa şirînî wek nebatî

Cihê pêde diçî sade dibin gul
Dilim xweşke çikatî bê ? çi katî....

Were canê şirîn bistîn bi qurban
Ne bes canî tû hem roh û heyatî

Lebaleb ez ji lêvan mey bi noşim
Bike şefqet li pîrê ber çema tî

Çi Ferhadim ko qendîlî di kolim
Tu şêrînî di birca rojhilatî

Bi lêvan dil bir û sêv dane seyda
Serî sor û binî gewr û xelatî

Tu ronak û tu pertev û şewatî
Bi wan çavên di reş min dil di patî

Te maçek da min û can û ciger bir
Ji te qatek ji min bo çi duqatî

Cigerxwîn şa bike carek bi hembêz
Li ber destê te rûnim ez bi tatî

## MÛM Û FINDÊ HAT

Ji bo serkî bidî ser min
Divê carek werî ber min
Ji zindanê bixî der min
        Tilî wek mûm û findê hat

Emîr û begler û xanê
Ji bircê hate eywanê
Ji bo min hate zindanê
        Şiringênî ji zendê hat

Ji zindanê birim bircê
Şirîn û nazik û gurcê
Deranîn dir ji nêv dircê
        Belexşanek ji hindê hat

Dilo mizgîn li te rabe
Şeker xend û bilindê hat
Bese îdî gelek şabe
        Sipî zend û lewendê hat

Li ser çavê me xana min
Ciwan û cerg û cana min
Ji bo maçek bidana min
        Sipîdê gewr û rindê hat

## MIN SER LI BER WAN DÊM Û XALA YE

Bi bejn û dêm û bala xweş tu serdara delala ye
Bi wan çavên reş û mêrkuj tu wek xibşa xezala ye
Bi şev pêde dinalim ez dikim qêrîn wekî goyîn
Gelo ma guh li van ah û hewar û qîr û nala ye ?
Eger carek ji te tiştek dixwazim ko bidî destem
Belê daxwaz ji dîna te du çavên mest û bala ye
Li kohê torê seyna ger Nebî Mûsa tu dî carek
Bizane ko ezim Mûsa û tor ew dêmê lala ye
Eger min dil birîndare bi qîr û nal û haware
Ji ber wan awirê çavên reş û wan nûn û dala ye
Di roja cejn û qurbanê dixwazim dil bikim gorî
Tenê zanim nehêjaye,cihê derd û mitala ye
Misilmana serî danîne ber reşber ji rê çûne
Tenê min ser li ber wan dêmê gewr û bisk û xala ye

## MEBÊ NA

Mebê na:ah û nalînim ji nana tên wekû naye
Birîna cerg û can û dil ji wan herdû kevana ye

Mebê na,guh bide nayê
Tu biskan berde ber bayê
Bi min na tal û dijware
        Meger şeker di nêv na ye ?
Mebê na,nazenîna min
Were ey lêv şirîna min
Li min xweş ke birîna min
        Bi goşê herdû çava ye
Tu birhan hilmede jorê
Tu fermo zû were jorê
Perî rengê gulî sorê
        Li tûrê dil tu Mûsa ye
Kevanê reş bike wek mû
Tu biskan berde hawîr rû
Ko jîna min bi carek çû
        Me jîn bê te çi hêja ye ?
Çikim jîna nehêjayî
Rijandî min li ber bayî
Were firke heçî mayî
        Di kopê dil de hê ma ye
Şerab û şerbeta sêva
Vexwarî min ji wan lêva
Me can daye ji ber wê ve
        Ko wan destên sipî daye

## ME DI BÎRA XWE WERÊ

Ey şah û padîşah û Qeyser û Kesra û serê
Nazik û şox û şepal û zerîy û lêv şekerê
Nameya ko me nivîsîbû bi xûna cegerê
Carekê xweş tu bi xwîne, me di bîra xwe werê
        Gerekê,çavbelekê,rûmelekê,rind û delalê
        Zerîyê,dêmperîyê,şêgulîyê,şox û şepalê
Carekê tû me di bîra xwe werîn ko me tu dî
Qedehek, noşîn ji lêvên te me bê şerm û fedî
Ji evîna teye min, dil fer û perwaze, didî
Ji te pêve me nehiştin, ji xwe ra dost û xwedî
        Bese ey hevdem û hevderd û kul û dost û hevalê
        Dikujî min bi nedînê vedijênî bi wîsalê
Sih sal heye ko ez di evîna te di nalim
Meyza meke ko serxwe dijîm, Rustemê zalim
Dergeh li me dîlan veke ey Hêtlerê zalim
Ger find û şemalî, bi xwe perwane mîsalim
        Bedewê zîn û şirîn û xec û rû find û şemalê
        De were guh bide carek seherê gazî û nalê
Tenê riswayê evîna te me, ey tacê serim
Bi xwe bê mezheb û dînim, wekû dînan digerim
Şev û rojan ko dinalim, wekû murxê seherim
Çidibî, ko me vexwewênî, li te carek bi nerim
        Qedeha vîn, û evîn û neynika hisn û cemalê
        Şêrîn dehen, û qende çen û lêv şeker û ebrûhilalê

Bê sûc û guneh, ez ji firqa te biriştim
Borîn di evîna, te de wek arê keniştim
Wek bilbilê şeyda, ku seher qidqid û qiştim
Maçek, ji du lêvên te ye ko her we vekuştim
    Îro ji me ra,hatiye furset ey dil me li balê
    Ferman bike,carek,ku secde bibin ber qed û bal

## NÛROZE

Nûroze, nûroze, sibhînê nûroze
Maçek bide min yar, cejna te pîroze

Nûroz û bihare
Nûroze....
Bel bûn gul û dare
Nûroze....
Bîna gulê hare
Nûroze....
Destim bi dest yar
Nûroze....

Nûroz û sersale
Nûroze....
Lêva gulê Ale
Nûroze....
Wek çîçek û lale
Nûroze....
Sor û zer û kale
Nûroze....

Nûroz û mizgîne
Nûroze....
Bihare bengîne
Nûroze....
Kesk û zer û şîne
Nûroze....
Xalîça rengîne
Nûroze....

Nûroze, xweş ba tê
Nûroze....
Bîna kulîlka tê
Nûroze....
Sinbil bi sema tê
Nûroze....
Xum xum ji çema tê
Nûroze......

# NIVÎSAREK

Ey şehê paye bilind û Erdeşêrim pakîze
Tac û hurmet,bext û dewlet,bot enêrim pakîze
Gawherê lala,û dur,yaqûtê hemra ba edeb
Pêşkeşî destet ekem,men ser li jêrim pakîze
Şerhî xem min natewanim,bot bikem ey payedar
Ba bizanî muxlisim,dil rengê zêrim pakîze
Ahî eyamê wîsalê,ew demên xoş û ciwan
Kûpê xemrê dil şikest,çî veşêrim pakîze
Min li pêş zor û setem,Rustem û Ferhad û Mem
Mil sitûr û deste pola,xurtemêrim pakîze
Tuşneyê avê wîsalim,Xidrê taristanê xem
Roj û şev ah û enînim,guh di dêrim pakîze
Dergehê lutfa te ger li dilxwazan vebî
Ca le bîrit ba neçim,min ehlê xêrim pakîze
Pirsî halê min ji salê carekê xanik bikî
Dewlemend û serbilindim,dil jî têrim pakîze
Min dixwazim şerhî halê xom bi dergah erd bikim
Dil bi xûn û ser nixûnim ca newêrim pakîze

# PIRXWEŞE

Pir xweşe, pir xweşe ev dinya pir xweşe
Yar pal daye ber min rû wek gulê geşe
Destê yar bi destim
Pir serxweş û mestim
Bê fehêt û şermin
Pala xwe da ser min
Pir xweşe, pir xweşe ev dinya pir xweşe
Yar pal daye ber min rû wek gule geşe

Dev li kenin sorgul
Ser di hejin sunbil
Xum-xum, ji avê tê
Hilm û sira bê tê
Pir xweşe....

Dirêjin ser şînî
Tukes me nabînî
Perde pel û darin
Hawîr me zenarin
Pir xweşe....

Şîro ji engore, Qedeh lêva sore
Dema em dighên hev, ronî dibî ew şev
Pir xweşe....
Em gulên evînê, pêlên derya jînê
Lew dilxweş û şadin, serbest û azadin
Pir xweşe....

## PESNÊ YAR

Yar hat civanê min bi şev
Şevnem li nesrînan rijî
Çîçek weşandin wê ji dev
Sinbil ji şerman rahejî

Nêrgiz bi Beybûnan kenî
Sorgul ji lêvan pişkivîn
Ew çol li ber pê bû bihar
Her der ji bînê me tijî

Mirî li pêjnê radibin
Çuqlî û katik tên sema
Bayê nesîm vêra diçî
Jale bi rewş û paqijî

Doza ciwanê cane lê
Cama lebaleb daye min
Ma kî li lêvên erxewan
Cama şerabê namijî ?

Cama şeraba lal û dur
Min lêv bi ser lêvan de bir
Pêsed qedeh min jê vexwar
Tîna dilê min nakujî

Dil xweş dibûn,rû geş dibûn
Bê hiş dibûn,serxweş dibûn
Bê jîn û tîn û leş dibûn
Ê yar bi dest ket ka mijî ?

Piştî giham ava hayat
Bi hiş xwe hatin tev lebat
Mêtin me ev qend û nebat
Bihişte ev şev her bijî

Çiman dibin perda şevê
Bighême vê şêrîn devê
Wê jî wekî min ev divê
Rewşek bi serbest ta dijî

## PADÎŞEHA EVÎNÊ

HEYLÊ ? HEYLÊ
Tu şêrînî pir ciwanî
Lêv ji sorê erxewanî
Kê ev bejna tel hevanî
Ev şîranî jêre danî
Heyle,heyle,heylê,heylê
Şev û rojan ez di meylê
Qelemkêşan xweş nivîsî
Roj û heyvîn lê di îsî
Qelen pire bi sed kîsî
Kes nawêrî te ramîsî
Heylê.....
Bejn ziravê nû zarokê
Fîstan kinê li ser çokê
Por şevînê xefalokê
Birû heyvê te rû rokê
Heylê.....
Mi xwedîkirî bi xêzanî
Bi dilkulî,cangiranî
Mal û canê xwel ser danî
Hêjî li nik min arzanî
Heylê.....
Bijn bilindê serwa sehê
Enî gewrê ebrû mehê
Rûdêm ji heyva çardehê
Negha ye kes sira te hê
Heylê.....

Şêrîn meşê şeker kenê
Hingiv dizê lêv û çenê
Berfa sipî ji gerdenê
Naghê kesî bi xwestinê

Heylê.....

Reş temberî rengê şevê
Ebrû kevan ciwan çivê
Wîn şêrînê wek hingivê
Rengê gulê ji lêv û devê

Heylê.....

Bisk û kezî du mêrkujin
Lêvên di sor çi xwînmijin
Dêm û enî pir paqijin
Pêt û birûsk jê di rijin

Heylê.....

Leb şirînê dêm şerê
Di dil de min xwedî kirê
Carek me dî li ber pirê
Bi serê lêvan min bankirê

Heylê.....

Gotin xweşe dilovanê
Gulê pal da ser rihanê
Go:Meyzêne li vê ciwanê
Kê ev bejn û rindî danê ?

Heylê

Rihan kenî gote gulê
Binêr sêvên di paxilê
Çav û birû reş bê kilê
Lêv dermanê derdê dilê

Heylê.....

Bi qûndera kabik teşî
Bi nazdarî xweş di meşî
Rista mina goşî weşî
Lê tê bi hûnan û xweşî

Heylê.....

Mi ristek çêkir ji gewhera
Di şevreşan wekî çira
Bira nadî destê bira
Min rêkire ji dosta xwe ra

Heylê.....

Bihar xweşe çaxê gula
Deng û newayê bilbila
Av û darin li herdû mila
Cî û warê me dil kula

Heylê.....

Were mala me bi mêvanî
Emê rûnin li ser xanî
Hev baxêvin bi şîranî
Gund mezine kî pê zanî ?

Heylê.....

Rabe ser xwe dil û canê
Em derkevin ji zindanê
Dest bi destê te hozanê
Da em herin Zebedanê

Heylê.....

# RAST Û ÇEP

Cejne her kes tên serayê rast û çep
Guh di dêrin çeng û nayê rast û çep

Dest bi destin,şad û mestin, xort û keç
Dil bi nazî tên semayê rast û çep

Van şepala şev li kala kirne roj
Biskû ala dane bayê rast û çep

Zulf û biskê rû biriskê hilweşîn
Min ji dil awir vedayê rast û çep

Çeng û ney gazî dikin, lê meyvexwer
Tên temaşa padîşahê rast û çep

Serxweşin lew zo,bi zo, hevdî birin
Çûne seyra mêrg û çayê rast û çep

Derketin seyra binefş û nêrgizan
Dest bi destê şahrezayê rast û çep

Min di xwest êrîş bibim,dêmên gulî
Lê kezî bûn ejdehayê rast û çep

Keştîya bayê şikestî,cerg û dil
Ketne derya ergewayê rast û çep

Lêv ji bejna neyşeker doza dile
Dil bo xortî zû gihaye rast û çep

Mezdikane, ser bi ber bejnê ve bir
Hingivîme dest û payê rast û çep

Çûm çiyayê kurdî/cûdî/lê reben
Vajî çûne Kerbelayê rast û çep

Zimzima av û pelan, peyxam di din
Çîçek û sinbil li tayê rast û çep

Misk ji biskê yar bi ser min da weşî
Lê girê bûn ta bi tayê rast û çep

Zend û bazin bûn hemayîl ser bi ser
Ketme tora dilrewayê rast û çep

Gawirî û bawerî tev rewşekin
Tên li bejna keyxwedayê rast û çep

## RONAK Û TARÎ

Heval meyzê, cihan îro, du bend û perçe û doze
Li alîkî şefeq hilda, li alîkî reş û toze
Şehinşahê serî taca zerîn û gewherê lala
Bi kurk û etlesê sore, siwarê çîlekî boze
Li hawîr leşker û tîp û siwar û tox û alane
Ji alî rojhilat derket, cihê pêlêkî pîroze
Ji hawîr tîp û tîrêjên, zer û sor têne meydanê
Şikestî leşkerê tarî, ji hevderdan re pîroze
Çiya bûn kumbedên zêrîn, li bejnê kixmeyê feyrûz
Hemî candar bi hêvîne, ne serma û ne bahoze
Biharê xalîça rengîn, bi ser qadê de berdaye
Gul û sinbil serî hildan, nefel belbû, giya koze
Tilûran qidqid û qişte, bilûra dawer û xoye
Çem û cobar di lorênin, li jorê keskesor qoze
Bi govend û sema tên û diçin tev tirhik û katik
Li tenbûrê dixî bayê biharê jare, dil soze
Li ber min pal vedaye ser biharê dilbera nazik
Perî reng û gulî şeng û şirîn lêv û şeker soze
Meger seyda ji tîr û awirên yarê Ciger xwîne
Belê pir payedarim ez, ku tîreavêje, amoze

## ROJ BER BI AVA DIÇÎ

Ne tenha pîr biwe seyda berê rojê li ava ye
Meger jar û birîndare ji tîrên herdû çavaye

Şev û rojan bi dîdara teve maye girêdayî
Bi dil her ah û nalîne, di benda zulf û xalaye

Eger herdem li ser toze birûsk û ba û bahoze
Bilind xwaz û giran doze serî birca deleva ye

Li ber bahoz û zordestî kelat û senger û late
Li ber pêlê evîna te Delavê ber giravaye

Hezar pêlên setmkarî bi xurtî lê didî dîsa
Kesê ko dil bidî yarek wekî te wek perava ye

Li meydana evîna te siwarê hespekî çalake
Wekû behram şev û rojan li nêçîr û li rava ye

Sipî bûye serê qurban, belê dil xurt û pir hêze
Ji wan lêvên şekeramêz umîdwarê selava ye

Wî dil daye evîna te bi bîr û bawer û hêvî
Meger zor û setem pir dîn ne mêrê gaz û lava ye

Hezar gernas di vê rêde te kuştin herdem û gavan
Belê seyda siwarê van hemî gava û nava ye

Bi pîrî ew di bazî xweş di xwazî bighê daxwazê
Belê daxwaz bi dest Dêwe di pişta hivde ava ye

Gelek naz û şirîn û kenşeker dîne belê tenha
Li cem wî her tu Salarê hemî naz û zirava ye

Ji çavên reşbelek tîr tên wekî tavan û barana
Tenê min dil wekî hîme li ber wan av û tava ye

Eger Mûsa cemala te li kohê tûrêseyna dî
Belê Mûsayê Kurdistan li tor û cûd û mava ye

Ne nûre ko bisojim ez ji ber pêta evîna te
Ko arê dozexa dûrî di nêv cerg û hinava ye

Were carek bi nazdarî birîndarê xwe derman ke
Vejîn û kuştina seyda diwan lêva û lava ye

Bere reyhan û gul pêkve di baxan de bikin şahî
Bere herkes bi ken bêjin: Cigerxwîn pîre zava ye

## ROJPERESTIM

Reşperçem û dêmên te wekû şevreş û tawe
Peqleweyê şeqlawe lebit,ken ji helawe
Min xwest ku lebaleb bi mijim şerbetê lêvit
Çavên reş reş û rimbaz li dilim di kila we
Min destî birî paxilê wê kew şil û şoxê
Sêvek bi minî da,çi xweş û nûber û xawe
Tîpê kezîyan ber bi riwê min ve bezî ne
Wek leşkerê şoriş bezî ya ber bi bexa we
Nêzik bû serî ez bi birim ber pî û lingan
Sarûxê du ebrûyê te ez birme sema we
Bisk û kezî û zulf û girêxuş li me der bûn
Talanî ye,nêçîr û şer û kuştin û rawe
Min ser bire ber tacê serit rojperesim ez
Ev roje li nav hewre we yan tac û kila we ?
Sed maçe li pey hev me ji şêrînê sitandin
Hêj pêtê dilê suhtê evînê ne kuja we
Ey dawerê vê jîn û evîn,hosteyê dîdar
Çon rindî û zîbayî bi vî rengî te da we ?
Ev jîne şirîne wekû deryayê perav dûr
Kî çûye binî careke dî hêç ne gera we.

## REWŞA EVÎNÊ

Ê bixwazî bighê lêvê sor,divê cermanî bit
Lê divê ko can û dil herdem li nik erzanî bit

Ger dixwazî bighê dilber,deyne ber pê cerg û dil
Lê di vê rê de divê ko can û dil talanî bit

Ê bixwazî dest dirêj kî bisk û reşmarên kezî
Dê bi nal û gazî û demsaz û dil evxanî bit

Ê biçî cengê digel Keyxesriwê kohreş bikî
Tim divê ko ser şikestî,çare reş,bê nanî bit

Ê divê bê tirs û pirs talanê Keykawis bi bî ?
Dê bi qeyd û bend û zencîr,girtîyê zindanî bit

Êko dest bavê gulê,pêçî ji xwînê sor dibin
Rûzerî,û dilhejarî,dê timî,nîşanî bit

Ew kesê carek bixwazî dilberê hembêz bikî ?
Dil birîn û dev bi xwîn û ronikê baranî bit

Êko dil deynî li ber,destê şirîna çav belek
Bêguman,dê ew şevek,bê û li nik mêvanî bit

Ê bi noşî şerbeta şêrîn,ji lêvên erxewan
Her çiqas jar û geda bit,Xesriwê eşkanî bit

Ê bixwazî bighê dozê,tim divê dil sade bit

Lê bi sozên dilberê,bê bawer û îmanî bit

Ê bi tîrê reşkevanê ebriwan dil bû birîn
Maçê lêvên erxewanî,dê li wî dermanî bit

Ger divê guh dî li sazê,guh de awazê çeman
Destê yarê bigre carek,ger,li nêv bustanê bit

Min baxê nêrgizan,ev nêrgiza yekta divê
Bejn û bala,pir ciwan û nazik û şahanî bit

Min dıvê ko xweş vexum,camê ji destê dilberê
Lê divê herdem qedeh,ew lêvê erxewanî bit

Padîşahim,dilgiranim,tox û ala rahejîn
Dê Cizîre,rojekê,paytextê Kurdìstanî bit

Ger Cigerxwîn neghê dozê,sozê rû bozê besin
Lê ku carek ez bibênim,mehrê cerg û canî bit.

## SEYRANGEH

Hawîr me çinar û çem û cobar û bihiştin
Sir tê dihejin,pelk û tilûr qidqid û qiştin
Çîmsîm, û zilif-çîm, digerin,seyre,li geştin
Awir li me barîn, ji kevanan, ber û xiştin
        Ey badîseba,hevdemê dil,peykê evînê
        Vê reşbeleka ko me nivîsî bû bi xwîne
        Deyne tu di nêv, pêçîyên lêvxunçe,şirînê
        Bêje:-ku birîn kûr û kule xo bi gihinê
        Maçek ji du lêvên te ye dermanê birînê

...

Herkes digerî,lê tenê ez, serxweş û gêjim
Paldayî,li ser mêrg û,gizîr, mest û dirêjim
Şahnaz û perî,çûne sema, ez çi bibêjim ?
Lêvan dimijênin, tenê ez dest bi nimêjim
Ahan vedirêsim, ji kezeb xwîne di rêjim,
        Ey badîseba....
Gul jêkre, bi yarî û diyarî vedişênin
Lêvan dimijênin, ji gulan bîne dikêşin
Derya şewitî,dar û geya, pel di weşênin
Bilbil digirî, ev çem û co, nal û xuşênin
Ebrû li me sarox û ber û tîr di reşênin
        Ey badiseba....
Ey şahê birû,yawer, û bisk û kezî leşker
Danî, me di vê rê de li ber pê te dil û ser
Dil her kul û coşîne, wekî dist û semawer
Gunhê me çîye, xeşmê li min, bes bike dilber
Wer çende li min kî setemê, kî dikî bawer ?
        Ey badîseba....

## SOZA YAR

Yarê sozek bi min da, mam li bendeyî wê sozê
Amozeyê derew kir, wey li ser bextê amozê
Pîremerdim bi pîrî, me dil girt û neçû ser
Ketim tora wê şeng û şepal û gewr û bozê
Porzerîn û xefalok, hevrîşimê tewrêzê
Memik sêvên xelatê, dêm hirmîyên Îlozê
Rojî, nimêj şikandin, salane rojîgîran
Dema çavên belek dîn, bû cejne ya nûrozê
Şoxa ko dil me dayê, pêre ketim belayê
Pêsed hezar mirandin, liser vê şop û dozê
Bahoz, li çarikê da, perde ji ser ruwan bir
Bisk û kezî hejandin, xwezî bi wê bahozê
Piştî gihame şêstî, ji nû me dil ciwan bû
Rengê kewê sipîdê, qebqeb, dikim di kozê
Min dil kire diyarî, nizanim bidme kê û kê ?
Mamusteya kolxozê, yan ajiwa patozê ?
Berê yek bû dikuştim, îro bûne di xwîn rêj
Kevir li min dibarin, ketme ber terpetozê
Ya ko me dil li bale, pir nazik û delale
Şîrîne, rengê hingiv, rûdêm ji rengê rojê

## SER BI ZÊRÊ

Were ey şox û şeng û ser bi zêrê
Li ser çavên me bê sed car bi xêrê
Biabî çeşm û xuî dil me şîn kir
Gul û reyhan û sosin ber devê rê
Me maçek xwest ji wan lêvên şekerrêz
Te dil da ber xedeng û şûr û kêrê
Heye çil sal birîndarim di nalim
Ji tîrên herdû çavên xumzeşêrê
Berî çil sal te maçek daye seyda
Heta îro li min xeşmê di dêrê
Nizanim çend hezar tîrin li dil dan
Çiman carek birînan najimêrê
Berî hingî misilman bû bi bawer
Te dûr xistim ji mizgeft û ji dêrê
Bi devken bersiva min da bi nazî
Go seyda bes bibêje tiştê bê rê
Me destê xo bilind kir ber bi banî
Ji ber ko ew li jor û ez li jêrê
Me go xanim bi rastî ger di xwazî
Were da dil vekim carek binêrê
Ji van bendan tu kolê ber derê xwe
Bike azad emîr û xurtemêrê
Ji te mîm û elîf û çîm di xwazim
Ji wan çavên reş û mêrkuj newêrê
Cegerxwîn por sipî bû û bêkêr
Bi van ristan di xwazî xo veşêrê

## SEBRA DILÊ

Yek sebr û mala min heye
Dost û hevala min heye
Gula xeyala min heye
          Carek were sebra minê
Sebra minê,mala minê
Nûroz û sersala minê
Herdem di nêv bala minê
          Carek were sebra minê
Dilxwazê dîdara te me
Herdem di gulzara te me
Wek rojî,êvara te me
          Carek were sebra minê
Wan tîpê biskê reşxelek
Wan awirên çavên belek
Êrîş kirin dil yek,bi yek
          Carek were sebra minê
Ez kuştime biskên di reş
Dêmên sipî,pir gewr û geş
Min dil ji ber bûye nexweş
          Carek were sebra minê
Biskan lî dêman girtî rav
Tîr tên ji wan birhên zirav
Kî guh didî ahîn û lav ?
          Carek were sebra minê
Şîrînîya ber vî dilî
Yan melhema derdê kulî
Rûdem ji rengê sorgulî

Carek were sebra minê
Carek were rûne li vir
Ji dev bi barîne şekir
Dilxweş meke bi min Bekir
Carek were sebra minê
Çavên te har û dîn kirim
Birhên te dil birîn kirim
Îro te ez bê dîn kirim
Carek were sebra minê
Maçek ji wan lêvên şirîn
Dêmên ji rengê hingivîn
Ew xoş dikin derd û birîn
Carek were sebra minê
'Wer da te ez himbêz bikim
Şeker ji lêvan rêz bikim
Maçan li dêman xêz bikim
Carek were sebra minê
Maçan ji wan riwan bibim
Ji lêvên erxewan bibim
Pîrim bi wan ciwan bibim
Carek were sebra minê

## SERXWEŞIM

Tu hatî lêv şirîna min
Evîn û dil revîna min
Were xweşke birîna min
Di ser çavên mera hatî
Bi xeml û xêz tu wek Zînî
Şepal û şeng û şêrînî
Ji derdê min re dûrbînî
Bi dîdarî pet û latî
Bi dîdara xwe wer rindî
Birû heyv û şeker xendî
Di vê rê de hinermendî
Bi bejna xwe tu şemşatî
Ji min can û ciger kuştin
Dil û mêlag hemî miştin
Tijî tîr û ber û xiştin
Bese ev malemîratî
Bese ey dilber û gawir
Bi barîne li min awir
Te cerg û dil kirin agir
Bi talan û bi berbatî
Te maçek da bi şîranî
Me can û dil li ser danî
Tu hêjî her dibê:kanî
Te qatek da bi sed qatî
Bese seyda bike gazin
Di dil da tîr û ber,bazin
Me xew nayê,çilo razin ?

Di vê cengê de şahmatî
Bi bejna xwe meya avî
Ji bircê derkevî,tavî
Di her çaxî,di her gavî
Tu naz û tirhik û katî
Bi nazdarî tu wek şengî
Sipî zend û şefeq rengî
Çi padîşah û serhengî ?
Dikî zorê li min tatî
Li ber te tat û cotarim
Mebîne jar û bêzarim
Li bejna te evîndarim
Li te pîroze axatî
Li te pîroze ey dilber
Ku mal û can û dil yek ser
Me dan ber pê evînperwer
Ezim rendê xerebatî
Xerebatim di meyxanê
Me mey da Ehmedê Xanê
Cizîrî,firke fincanê
Ji kûp û kûzikê batî
Ji kûpê destê kolxozê
Perî rengê,şeker sozê
Me mey noşî,giham dozê
Du sêvên sorê Exlatî
Şerab û şerbeta sêva
Vexwarî min ji wan lêva
Gelo kes dî ji min pêva
Giha bejna li hevhatî ?

Hezar û sed evîndarin
Di vê rê de birîndarin
Şev û roja bi hawarin
            Tenê ez xurt û jêhatî
Di vê rê de gelek mêrim
Piling û ejder û şêrim
Bi taca gewher û zêrim
            Bese seyda, ebûqatî ?
Cigerxwîn, bes bike forta
Tu pîrî lê wekî xorta
Te dil da ber şek û rota
            Bi xwe kohê Ereratî

## ŞIVANIM

Şivanim ez bi şev pêde sitêran ez di parêzim
Li benda heyveronê me xeyala yar di hembêzim

Li bêdawî dinêrim ez me dil radar û dûrbîne
Li min dengê te peyda bû li ser textê dilî nêzim

Ji dû dil birîndarim li dengê dil çi guhdarim
Bi baxan re xeberdarim ne rezvanim li ber rêzim

Di dêra xem de rihbanim di jînê de çi pêzanim
Meger hosta û hozanim bi rist û rêzik û xêzim

Were carek bihara dil bike xweş pirsîyara dil
Ji wan çavên te yara dil xem û derdê xwe dughêzim

Were ey nazik û şêrîn berî zengil bikî qêrîn
Vexun kasa meya zêrîn ji lêv xemr û ji dil mêze

Bizane şehsiwarê kurd Cigerxwîn bête meydanê
Çi hacet kurd bi Camî û bi Şîrazî û Tewrêzim

## ŞEH Û RÊZANÊ EVÎNÊ

Wer da me bibênî şeh û rêzanê evînê
Zanî çiye daxwaz me ji vê hatin û dînê ?

Gazinde dikin can û ciger,gazî û qêrîn
Gilyê te dikin ey sebebê nal û girînê

Xencer te li dil xistîye ey xwînxwer û mêrkuj
Maçek ji du lêvên teye dermanê birînê

Îdî çiye nazî û ji sazê çi dixwazî ?
Wer guh bide carek tu li vê nal û enînê

Carek tu bi xwîne şeh û serdarê civana
Nama ji tera ko me nivîsîbû bi xwînê

Cana te divêtin bimirim zû were ba min
Ca ger te nebênim dimirim ez di nivînê

Tênîme dizanim qedehek mey ji lebê sor
Ew dil me di parêzî ji vê sotin û tînê

Mizgîn ji mera hat ku şirîn tête civanim
Min can û ciger dane li ber pê te şirînê

Herçî ko binasî te bi dîdarî û rindî
Guh nadî bi carek li Xec û Zîn û Şirînê

Dest girtîyê dergahê tene sed Mem û Ferhad
Bêzîne ji vê dewlet û vê saxî û jînê

# ŞEV Û RO

Ta bi kengî tu dibê-na-bi delalî şev û ro ?
Dil bi vî rengî ji ber na-te binalî şev û ro ?

Meke bawer ko ji dûrî tu di bîra me nayê
Tu di bîra mede her dem û li balî şev û ro

Ez li kê meyze dikim zanibe ey padîşahim
Tu li ser textê dilî,min tu xeyalî şev û ro

Bi delalî tu dixwazî bikujî dil bi xwedê
Tu dizanî ko di dil de tu delalî şev û ro

Wer guh bide nayê? ca were govend û semayê
Wer guh tu li dil dêre her we di kalî şev û ro

Dinya bibî dijmin tev ji mera mûyekî nakin
Lewra ko di zanim ji mera her tu hevalî Şev û rc

Tu ji lêvên xweyî şêrîn qedehek mey bide min
Ko binoşim ji peyalê bi helalî şev û ro

Wek siya bejna te em herdem cuda nabin ji hev
Ko ji min A bî çira na ji wiyalî şev û ro ?

Tu di dil da û dixwazî bikî yexme ji me dil
Ko me dil da te ji dil,ev çi celalî şev û ro ?

Ji Xwedê pir gunehe,ez nexweş û jar û reben
Dişikênî tu li min çavên xezalî şev û ro
Tu bi zanî çi dixwazî,kî dibê na ji tere ?
Ko ji min abî çira najî wiyalı şev û ro ?

## ŞÊRÎN JI MIN XEYIDYE

Xeyda ji min xeyidye nizanim bo çi hew tê
Zanim ji ber diya wê ne ez diçim, ne ew tê

Şêrîn û pir delalê gewr û rind û şepalê
Me dil her dem li balê kengî bête me xew tê

Piştî li min ceger pat bayê seba ji nû hat
Mizgîn da me rohilat vaye ji bo te kew tê

Lêv sor û bisk bi têle bi rewş û xeml û kêle
Wek mehîna kihêle ez dîme bê celew tê

Serî bi tac û sinbil gulî berdane ser mil
Geş kir bi ken gul û dil li hember min derew tê

Poz bilind û şirînê rû gewr û por zerînê
Rista me ya evînê li wê bejna bedew tê

Ristan jimir dibêjî Şekir ji dev dirêjî
Ciger li min di pêjî jidil me nal û tew tê

Şal û mexmel ji kincê diran libê birincê
Şêrîn û gewr û qencê îdî hero diçew tê

Padîşeha hebûnê carek were tu rûnê
Seyda mekuj bi çûnê soza te bê derew tê

## ŞÊRÎN ŞEKER DIRÊJÎ

Li sazê guh didêrim li gewheran dinêrim
Nikarim ez veşêrim Şêrîn şeker dirêjî
Zirave şox û şenge
Delale pir çelenge
Bi awiran pilinge
Şêrîn şeker dirêjî
Gulçîçeka evînê
Ken şeker û şirînê
Daxwaz ewe ji jînê
Şêrîn şeker dirêjî
Min dî ji wê de hatî
Wek rojê nûhilatî
Lêv şekerê nebatî
Şêrîn şeker dirêjî
Çavên direş te kilda
Ebrû bijor ve hilda
Min kul neman di dil da
Şêrîn şeker dirêjî
Carek ko hate ba min
Nazik destê xwe da min
Hingivîne giha min
Şêrîn şeker dirêjî
Destê xwe danî ser mil
Bilbil gihaye sorgul
Îdî neman di dil kul
Şêrîn şeker dirêjî

## ŞÊRÎNÊ NÛ GIHAYÊ

Dilber çiqas delale
Bê hogir û hevale
Herdem me dil li bale
    Şêrînê nû gihayê
    Li ser min pir bihayê
    Rabe çaxa xewê ye
    Bê te xewa mi nayê
Şêrînê gewr û rindê
Lihev hatîtî,bilindê
Pêçî ji mûm û findê
    Şêrînê nû gihayê.....
Li nav baxan digerin
Li ber avan di herin
Li her tiştî di nerin
    Şêrînê nû gihayê.....
Geh em diçin ser çema
Geh em diçin sînema
Di her kêlîk û dema
    Şêrînê nû gihayê.....
Were şêrîn leba min
Xeman mexwe seba min
Were rûne li ba min
    Şêrînê nû gihayê.....
Ciwane tirh û kate
Lêv şekirê nebate
Dixwazim bême ba te
    Şêrînê nû gihayê.....

Were carek ji rêve
Maçek bide ji lêva
Bide min herdû sêva
Şêrînê nû gihayê.....

Ken şekerê şêrînê
Lêv kanîya evînê
Daxwaz emin di jînê
Şêrînê nû gihayê.....

Giran meke serê xwe
Li kolê ber derê xwe
Bide carek berê xwe
Şêrînê nû gihayê.....

Sîng bexçeyê zenarê
Dev kanîya Hesarê
Şerbet me jê vexwarê
Şêrînê nû gihayê.....

Cigerxwîn wer dibêjî
Van gewheran dirêjî
Hêvî heye wî hêjî
Şêrînê nû gihayê.....

Libê, tu jêre bêje
Şekir ji dev bi rêje
Ev rojî û nimêje
Şêrînê nû gihayê
Li ser min pir bihayê
Rabe dema xewê ye
Bê te xewa mi nayê

## TU ZANÎ MA ÇI DERMANE

Ji dîdara perî rengê
Birû heyvê, gulî şengê
Enî gewrê wekî pengê
　　Dinalim ez wekî çengê
Bi qîr û nal û giryanim
Tu zanî maçe dermanim
Li ser çavên me bê xanim
　　Bibosim ez lebê lala
Ji wan lêvan binoşim ez
Meke bawer li hoşim ez
Birîndar û nexoşim ez
Seranser dil bi coşim ez

Xerabat û perîşanim
Dizanî ma çi dermanim
Li ser çavên me bê xanim
　　Bi bosim ez lebê lala
Perîşanim di vê bendê
Ji derdê vê şekerxendê
Belek çavê, sipî zendê
Disojim ez wekî findê

Li dîdara te perwanim
Tu zanî maçe dermanim
Li ser çavên me bê xanim
　　Bi bosim ez lebê lala
Bi dîdare xwe ez kuştim
Şikandin tev mil û piştim

Ji wan tîran ku dil miştim
Seranser dil nexweş hiştim

Di qeyd û bend û zindanim
Dizanî ma çi dermanim
Li ser çavên me bê xanim
Bi bosim ez lebê lala

## VEXWE DINYA GELEK XWEŞE

Vexwe dinya gelek xweşe
Heyva li hember rû geşe
Peyxam ji dil re xweş didin
Dêm û leb û çavên reşe
        Vexwe vexwe yarê vexwe
        Vexwe dinya gelek xweşe
Vexwe da em ser xweş bibin
Dil her wekû ateş bibin
Devliken û rûgeş bibin
Heta ko em bê hiş bibin
        Vexwe,vexwe yarê vexwe
        Vexwe dinya gelek xweşe
Vexwe dinya lê hêjaye
Gelek xweşe, pir bihaye
Jîna me tiştik tê nema
Guh nadim ez derd û xema
        Vexwe,vexwe yarê vexwe
        Vexwe dinya gelek xweşe
Vexwe yarê îşev şeve
Şûşe danîn tevlî heve
Ez ramîsim çavên belek
Dêmên gulî, lêv û deve
        Vexwe,vexwe yarê vexwe
        Vexwe dinya gelek xweşe
Vexwe dinya tev a mine
Yara miltenişta mine
Gewr û rinde poz bilinde

Zerya gunde, dev li kene
Vexwe,vexwe yarê vexwe
Vexwe dinya gelek xweşe
Vexwe têde xweşî heye
Vexwe ev dem dema me ye
Ev dar û ber, ev av û tav
Hemî rewşa min û te ye
Vexwe,vexwe yarê vexwe
Vexwe dinya gelek xweşe
Vexwe îşev ez û tine
Şev reş bûye kesek tine
Tu a minî, ez ê te me
Dost û yarin, dil girtine
Vexwe,vexwe yarê vexwe
Vexwe dinya gelek xweşe

## XENCER BI DESTE TÊ DIL

Yara ku dêm ji sorgul
Reşmar çivîne ser mil
Xencer bi deste tê dil
        Çibkin:-gilî û gazin ?
Ebrû li min şikandin
Bisk û kezî hejandin
Dema destê xwe hilda
        Xurmîne zêr û bazin
Sîh sale min li ser hev
Vexwarî şerbeta dev
Geh, geh, bi roj, û geh, şev
        Di vê rê serfîrazin
Padîşeha evînê
Ken şeker û şirînê
Xweş kir devê birînê
        Em dilxweş û bi nazin
Perwana agirin em
Dijmin ji hev birin em
Pir ji hev dûr kirin em
        Hêjî em hev dixwazin
Padîşah û emîrê
Raste me tênî bîrê
Dewlemend û bilindin
        Em Mehmûd û Eyazin
Bextê me wek du biskên
Wê pir reş û perîşan
Çawa bi dil xwedî kim
        Dijmin di ber de razin ?

## LEBXUNCE

Lebxunce û dêmsorgul û ebrû te ji nûnê
Ma dê çi bibî ger tu werî qasekê rûnê

Sîng, sîng û lebaleb bi hevaxoşî bibin em
Sêv û gul û maçan bidizin em ji hebûnê

Cana tu bi dînê vedijênî dilê xemnak
Zînhar tu neçî, dê bikujî min tu biçûnê

Dil jar û birîndare meger bê me bibênî
Dawa xwe tu hilde xwe biparêze ji xwînê

Maçek ji du lêvan bide seyda û du sêvan
Piştî ko mir û çû megirî qet meçe şûnê

Ev bûn û nebûn herdû li cem dilberê yek so
Mala me xerabkirye bi vê bûn û nebû nê

Çavên me di rêjin hêstirê xwînîn ko dibênim
Lê ew guliyên reng zer û zêrîn vedihûnê

Seydayê Cigerxwîne di nalî wekû hayê
Sotaye ji dil her wekû êtûn û qelûnê

## XANIM MEKUJ MISILMANIM

Şêrînkenê,şekerçenê,çi pîroze li gerdenê ?
Go:-Xaç
Lêvşîrînê, porzerînê, çi dermane bo birînê ?
Go:-Maç

Me ser bire ber xaç
Me jê sitand sed maç
Ji min vedan awir
Go:-Tu bûye gawir
Ev çi qîr û hew,hew
Bes tu bike lew,lew

Zêr û zeber,bûm,ketme ber, wê dilbera zêrîn kemer
Go:-Wax
Mej baxçeyê pirxunçeyê çinîn du gul, xencer li dil
Da,Ax

Çima me ev zû kuşt ?
Di ber me de rûnişt
Wê ez kirim hembêz
Xwîn ji dilim bû rêz
Zor da girî, go tew
Heyfe ko me kuşt ew

Maçek ji dêv, vêra du sêv, danîn di nêva dest û lêv
Go:-Ha
Ew surperî, da min berî,min go:-zerî ka zû werî
ka,ka

Dema ko da min maç
Enî kete ser xaç
Biken me go:-Xanim
Mekuj misilmanim

Biken me go:-xanim
Mekuj misilmanim
Bi min kenî mêkew
Go:- me tirse, hew, hew ....
Peyman çiye,aman çiye, derman çiye ferman çiye ?
Go:- ez
Rûnin bi hev re em bi şev,maçan ji dev,em bidne hev
Bê gez

Ez rakirim ser xwe
Zû kişandim ber xwe
Me ew xeml û ew xêz
Hemî kirin hembêz
Me ew dêmên qelew
Gez kir, wê go:- tew, tew ...
Destên me girt û rakirin, carek bi nav bexça birin
Şev reş
Çem di xuşîn, em serxweşîn, biskan li rû kir baweşîn
Oxweş

Em hev digerênin, hilma hev dikşênin
Bûne wek Mem û Zîn, gelek xweşe ev jîn
Herdû bi ken, ez, ew
Ox, çend xweşe em şew ?!!!..

# XEYDA

Li seyda ger di pirsî can qelabendê Siweyda ye
Ji min carek mexeyde da nebêjim ko tu xeyda ye

Mebîne serxweş û dînim bi qîr û ah û nalînim
Ji wan lêvê şirîn îro ji seyda re te mey da ye

Ji dil gazin meke qurban ko her dem ah û kovane
Çima gazin bikî cana bi destê xo te key da ye

Di piştî ko te dil kuştî ji nû tê serxweşî xanim
Ji lêva şerbeta sêva didî seyda çi feyda ye ?

Te laş pembû sipî nerme ji lêvên te gulan şerme
Birû xwar û şikestî wek heyîva cejn û eyda ye

Gelo zanî ko ev êş û birîn û malewêranî
Ji herdû çav û herdû dêm û herdû lêvên te peyda ye

Hemîkes dilbijê wê bejn û bala wek neya avî
Tenê ê ko perîşan û Ciger Xwîn maye seyda ye

Ji roja ko me dil dayê me can da destê zîbayê
Cigerxwîn daye nav davan di benda zilf û qeyda ye

## XWEDÊWO WÊ BI PARÊZ

Li min bişkîn du çavên fitneengêz
Bihara dil were em bibne hembêz
Ji wan dêmê gulî maçek bidî min
Binoşim şerbeta lêvên şekerrêz
Were rûne bi şahî,padîşahî
Li bin destê te bin heta bi Tewrêz
Ji bustanî ciwanî ber bidî min
Bere bişkin li min rojî û parêz
Li ser masê were rûnin bi şahî
Li te cam û şerab û her li min mêz
Eger carek li min pirsê bikî,ez
Birîndarim ji çavên mest û pir hêz
Dixwazî min bi parêzî ji derdan ?
Bi qurbana te bim carek were nêz
Bi wan destên sipî mizde birînim
Bere seyda wilo nemrî were têz
Sipîdê ger bixwazî bête ser min
Li ber pête ser û çavan dikim rêz
Çiqa rind û ciwane nazika min !
Ji çavan ey Xwedêwo wê bi parêz
Ji derdê te ciger xwîne dinalî
Li ser bejna te çêkirne wî ev xêz

## XUNCE LEB

Perda xwe tu rake ku qiyamet li me rabî
Tîran bi reşîne,ku ciger lerz û ta bî

Biskan bike dûpişk û kezî her wekû ejder
Zencîrhejarî ji milim bê te venabî

Carek bi kenê xweş,bike dinya bibî gulşen
Cama lebê lala,bide serxweş û şa bî

Ger xuncelebê bade bidî destê minê jar
Çibkim ji şerabê,xem û tabê li gula bî

Sermaye-ê jîna me hemî,çend şev û rojin
Qurbanê te bim,ew jî bera tev ji te ra bî

Her çî ji lebê sor qedehek sade vexwarî
Ew padîşahê jîne meger jar û geda bî

Ê ser ne birî ber derê meyxane,çi zanî ?
Ê destê bi destê te bî ba dijminê xwa bî

Cana,were destê xwe bide destê me carek
Min can bere her girtîyê wan zulfê du ta bî

Ger carekê dilber bi kevî kolegeha min
Hawîr di bî gulşen,û bi xwe birc û sera bî

Ev tac û sera wer ji me ra tev bibe dijmin
Çibkim ji cîhanê,tenê şêrîn ji me ra bî ?

## YAR HOGIRÎ ME BÛ YE

Di xwazim bême ba te,dijmin me xweş di bênî
Di şewitim seba te di agirê nehînî

Hawîr dikin temaşe birhan dibin bi jor de
Bû tiqtiqa kenê wan porsipiyên mehînî

Awir vedan me pîrê ciwanî tête bîrê
Nema karî xwe bigrî lewlew dikî bi dînî

Civat bi hevre tê coş çi asik û çi xergoş
Tev ciwanin di zanin dilgirtin û civînî

Jin tevde dilreva ne pût û lat û Xwedane
Tenê tu dil di sojî bi pêt û ar û tînî

Ji naz û gewr û rinda jì van bejin bilinda
Tu hogirî me bû ye seglawîyek bi zînî

Gazindeya ji min kî bikî nezan û kore
Çendan ko feylesûf bî ew nizanî evînî

Kesê dilber nedîtî nizanî ka çilo ye
Belexşané ji dêman paxil sipî û çînî

Zêr û cewahir û dir bi ser singê de cengin
Memik sêv û du lêvin şêrîn û hinguvînî

Seyda di xwazî bêjî lê pêre bêje amîn
Xwezî carek diyarî dilber ji mir bi şînî

Da ez li ber xwe deynim,ji dûrve lê binêrî
Cama leban bi noşim pê xweş bikim xurînî

# ZÎBAYÊ

Şerab û şerbeta sêva,ji lêvên erxewanî da
Bi wan destê sipî dilber,bi cama zêrveşanî da
Bilind bûme ji ber wê ve,vexwarî şerbeta lêva
Me maçek jê sitandî lê bi naz û dilgiranî da
Me dest avête zîbayê,çivek da xwe wekû bayê
Sivik da bersiva dayê,bi naz û mehresanî da
Bi nazdarî bi şîranî,ji cem min çû giha banî
Ji min re yek qedeh anî,delalê şehrebanî da
Li pêşber min kete kursî,evîna dil ji min pirsî
Go:Seyda qey tu natirsî,me bersiv pehlewanî da
Ji bo vê rewş û dîdarê,ji bo çavên te xûnxwarê
Me jîna pir ciwan û xweş,di hengama ciwanî da
Şevan pêde şivanim ez li ber der dergevanim ez
Bihayê vê,li dil tîrek,ji wan birhê kevanî da
Tu dil hişkî,tu dijwarî,tu guh nadî me xemxwarî
Heta kengî bimênim ez di rewşa dergevanî da ?
Go:Ev raste,tu seyda ye,dilê xemgîn te key da ye
Te mal û can û dil da ne,belê wek Berdeşanî da
Bihayê wan şevên tarî,evîndarî û xemxwarî
Ji seyda re du sêvên sor,dîyarî û nîşanî da
Kirim hembêz şehînşahê,perîrengê birû mahê
Birûska hêvîyan da dil,ji taca Erdewanî da
Ji lew seyda evîndare,di ristê de pesindare
Gelek pesnê xweş û şêrîn,gelo ma kî nizanî,da.

## CIHÊ XWENDINA MIN

Were saqîya mey ji ava tirî
Dilê min bi carek ji heznê derî

Bide min ji cama xweya qurmizî
Şeraba şirîna,ji ava rezî

Keremke werîne,bi Urfa dinê
Binoşim,bibêjim cihê xwendinê

Ji ez şiyar bûme ko nagihan
Ji gundê:Hesarê,ku çûme Sînan

Li wir çend riwên min ku bûne temam
Ji wê ez ku çûm,der:Elîparê mam

Ji wir ez ku rabûm û çûm Dêrikê
Li wir mame heta giha salekê

Ji wê ez ku rabûm nema min sebir
Li hicra:ewêna,cihê xo me kir

Ji wir ez ku rabûm,di nîvê şevê
Qevistim,qelistim,li:Şêxyûsivê

Ji wir ez ku rabûm û çûme Sînan
Ji wê ez veçûm dêrikê bêgoman

Li wir mame heta ku bûye sibat

Ji wir çûme Amûde-bûka welat

Di peyve me Kercewsê xweş kir mekan
Vegêrame Amûde,ez nagihan

Ji wir ez ku çûme Yewancix deha
Vegêra me Dêrik,eve munteha

Vegêra me Amûde-ya nav kebîr
Ji wê min cihê xwe kire:Tilşe-îr

Ji wir çûme Şaxê li ber kohê Cûd
Ji wir hatime Tilşe-îra xwe zûd

Ji wir çûme Bîrêjê,hinda Sefîn
Ji wir çûme Ajgê,me sorgul çinîn

Di peyve li Siktanê,pêlek dimam
Ji wir çûm Qelesincê mahek temam

Ji wir çûme Tutmê,du,sê rojekan
Ji wir çûm Gelale,li nav balekan

Ji wir çûme Îran,û hatim Xelan
Heta ko qeşa û seqem tev helan

Ji wê min dema ko sivik daye rê
Cihê xo me kir Tilşe-îra berê

Ji wir ez ku rabûm û xatir me xwest

Kemer min li Amûde, îdî di best

Li wir xwendîye min heta muxteser
Berê xo me da Senceqê bê mefer

Li wir min dixwendî heta çû bihar
Vegêrame Amûde, ey xwendewar

Li wir mame heta giham intîha
Ku seydayê min çûye mam bêbiha

Me hêvî heye ko Xwedayê mezin
Min û dê û bav û seydayê min

Verêkî bihiştê digel ewlîya
Şefî-ê me bit xatemê Enbîya

## SEBEBÊ ÇÊKIRINA RISTÊ MIN

Dil vegêraye ji nezma xweş luxat
Hate ser nezmaku' sê car faîlat

Wextê min dî qewmê kurdî pir delal
Ew di nêv ehlê cihan de bê heval

Ba sexawet,ba dîyanet,ba hiner
Min li goşê lewhê qelbim kir xeter

Ko beyankim esl û ewsafên di wan
Milk û hikm û padîşah û hem ziman

Der belaxetgahê çûme pêşî ye
Da nebêjin:Qewmê kurdî wehşî ye

Bê cefa û bê tekelif min nezim
Wer di kêşa,hatî qenc û muntezim

Hêvîdarim ez ji ehlê marîfet
Ko bigêrin der cihanê în luxet

Ez dizanim ehlê çend esrên berê
Bê te-esib guh neda ne vê dirê

Lê di îro de li her kes lazime
Ger geda û ger mela û hakime

Ew bi bêjin şi-ir û xweşxwanên şirîn
Da bibin em serbilindê der zemîn

Hêvîdarim zêde ez ehlê kemal
Ko nedin derdê derûn ber ihtîmal

Hem ji bona min di-a,kin her timî
Hem ji bona miletê kurdî hemî

Vê ji yaran hêvî sed carî dikim
Zêde sed şukrî ji heqbarî dikim

Ko hezar û sêsed û hem çil û heşt,koçîye
Bû ji Mûsayê Hesarî ev nivişt.

---

Awirek:

Ev herdû ristên dawî ji Dîwana mina kevnare ne,ko min nedixwest wê çap bikim.Herwekû ev ristên ha,di sala 1348-1925 ê de hatine çêkirin,lê ji ber ko gelek gotinên biyanî têde hebûn,û heta awira min jî hatiye guhertin,min nexwest wê Dîwanê çap bikim ,lê destnivîsî li nik min peyda dibî.

FEHRESTE

Birê I


Kîme ez? .............................. 9
Bête hêçim welat .............................. I7
Banga sibê .............................. I9
Bextreşiya Kurd .............................. 2I
Bere bihar bi xêr bê .............................. 24
Çardehê temûz .............................. 25
Di qeyd û bendan ranazim .............................. 26
Di vê rê de Siyamendim .............................. 27
Direvim .............................. 28
Ev ji me tê hew .............................. 29
Em kurdê çiyane .............................. 32
Em azadîxwazin .............................. 33
Em evin .............................. 34
Here ? here .............................. 35
Xwe kar bikin ji bo şer .............................. 37
Kurdistan .............................. 38
Xortno rabin herin ceng .............................. 40
Naxwazim bindestî .............................. 42
Milet ji dijmin meztire .............................. 43
Rî dibî bost ? dijmin nabî dost .............................. 44
Welatê min .............................. 45
Leşkerim .............................. 46
Mela rabe .............................. 48
Nizanim ez nizanim .............................. 50
Partîme .............................. 54
Peymana Bexda .............................. 56
Partîzanim .............................. 59
Pîra mirov xwer .............................. 6I
Sersala sala I959 .............................. 69
Sala I959 .............................. 72
Şoriş .............................. 75
Şorişim Azadîxwazim .............................. 79
Wekhevî .............................. 82
Zencîr ji gerdenim şikest .............................. 84
Şîna Seîd Elçî .............................. 95

Şîna Bêkes .......................... I00
Xabûrê .......................... I0I
Diya Keyo .......................... I02
Keça Kurd .......................... I03
Bersiva Nayifê Heso .......................... I04
Ez û yarê .......................... I06
Lorî .......................... I07
Gula Rojhilatim .......................... I09
Bi pîrî ez giham ava heyatê .......................... II0
Ciwanî .......................... III
Kurd û Felestîn .......................... II2
Çûna Şam .......................... II4

Birê II

Awirek li jînê .......................... II9
Begim here here .......................... I24
Cejne .......................... I25
Çûna mehrecanê .......................... I26
Em ji rê dernakevin .......................... I27
Destê te maç nakim .......................... I28
Em şer naxwazin .......................... I29
Ey Karker bibin yek .......................... I35
Em ji nû berjor di çin .......................... I37
Ey qata perîşan .......................... I38
Haydê gilî meke .......................... I40
Hey Pale .......................... I42
Ji hevalekê re .......................... I44
Karker .......................... I47
Ka mirovên baş .......................... I49
Lehiya sor .......................... I5I
Layka çûye jor .......................... I56
Mehrecan .......................... I59
Marşa Sewrê .......................... I6I
Marşa Haştî .......................... I62
Marşa Cotkaran .......................... I63
Marşa xortên Dîmuqrat .......................... I65
Perçak tore .......................... I67
Rencberê bi rûmet .......................... I69
Xêr û Şer .......................... I79
Xwendegeh .......................... I85

Birê III

Nivîsarek bo yar ........................ 188
Agirê evîndarî ........................ 196
Bav Ecemê......................... 197
Begler û Mîrê......................... 198
Bê Kesim.......................... 199
Bihara Dil.......................... 200
Bê Malê.......................... 202
Bi ronika rê xweş dikim................. 203
Bihara Dil.......................... 204
Ciwanîyê çi kare ?.................... 205
Cejne............................ 207
Cibrîlê evînê....................... 209
Carek were ba min...................... 210
Çep û Rast.......................... 211
Dinya li hev hatine................... 213
Dêmafîtab.......................... 215
Dinya pêlê evînim..................... 217
Dil xerac.......................... 219
Di xwazî dil bi sojî.................. 220
Dawîya peyalê....................... 221
Dîsa birînê min vebûn................. 226
Dilgîrî.......................... 228
Dil ji min bir...................... 229
Ev çi Dîmuqratî ye ?................. 235
Ez bê te nehînim..................... 236
Ez di cejna dilberim.................. 237
Ez û Yarê.......................... 238
Evînê............................ 239
Evînê............................ 240
Gulperî.......................... 241
Gul li hawîr geşbin.................. 242
Hat û Çû.......................... 243
Heyve Ronê......................... 245
Heyve Ronê......................... 247
Heyve Ronê......................... 248
Herdû Çav.......................... 249
Ji sazê dengê îlhamê.................. 250
Kerê reş kelbeş divê.................. 251
Keyxesriwa Evînê..................... 252
Keleşim Ez......................... 253

Lêv şirîn .................................... 254
Li ber pête wekî axim .................... 256
Lêv hingivê .................................. 257
Mest û heyranim ........................... 258
Mizgîn ........................................ 259
Mûm û findê hat ........................... 260
Min ser li ber wan dêm û xala ye ........ 26I
Mebê na ...................................... 262
Me di bîra xwe werê ....................... 263
Nûrûze ....................................... 265
Nivîsarek .................................... 267
Pir xweşe .................................... 268
Pesnê yar .................................... 269
Padîşeha evînê ............................. 27I
Rast û çep ................................... 274
Ronak û tarî ................................. 276
Roj ber bi ava diçî ......................... 277
Roj perestim ................................. 279
Rewşa evînê ................................. 280
Seyrangeh .................................... 282
Soza yar ...................................... 283
Ser bi zêrê ................................... 284
Sebra dilê .................................... 285
Serxweşim .................................... 287
Şivanim ....................................... 290
Şeh û rêzanê evînê ......................... 29I
Şev û ro ...................................... 292
Şêrîn ji min xeyidye ....................... 293
Şêrîn şeker dirêjî ........................... 294
Şêrînê nû gihayê ............................ 295
Tu zanî ma çi dermane ..................... 297
Vexwe dinya gelek xweşe .................. 299
Xencer bi deste tê dil ...................... 30I
Lebxunce ..................................... 302
Xanim mekuj misilmanim .................. 303
Xeyda ......................................... 305
Xwedêwo wê bi parêze ..................... 306
Xunce leb .................................... 307
Yar hogirî me bûye ......................... 308
Zîbayê ........................................ 309
Cihê xwendina min ......................... 3I0
Sebebê çêkirina ristê min ................. 3I3

BIHA : 10 L. L.